Rewşa azadîya ramanê li Tirkîyeyê: Du rojnamevanên Azadiya Welat di nav salekê de 347 sal cezayê hefsê girtin!


LE MONDE diplomatique

kurdî

Çile 2011 - Hejmar 14 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel


**Prof. Dr. Ahmet Özer**
Da ku mirov Komkujîya Dêrsimê fêm bike, ku di salên 1937-38ê de pêk hatibû, divê mirov li bûyerên sala 1925ê binihêre. Bêyî ku ew serdem were fêm kirin, Dêrsim nikare were fêm kirin…
R. 4

**Rinke van den Brink**
Welatê Erasmus û Spînoza çawa dikarî tev li nîqaşeke siyasî ya li dijî toleransê û rêbiwariyê bibûya, toleransa ku Holandayê demeke dirêj pê pesnê xwe dida?
R. 9

**Alain Gresh**
Rîyadê dixwest bazareke demdirêj ji xwe re misoger bike û Pekînê jî dixwest ewlehîya peydakirina nefta xwe xurt bike. Di nav her du dewletan de tenê pêwendiyên aborî hene yan ên leşkerî jî hene?
R. 16

**Philippe Rivière**
Gelo WikiLeaks bi weşandina telegrafên dîplomatîk ên ku ji aliyê eskerekî amerîkî ve bi dizî hatibûn ragihandin karekî rojnameваniyê dike an jî sîxuriyê?
R. 19

**Vladimir Cagnolari**
Piştî 33 salên desthilatdariya mutleq, Houphouet-Boigny di sala 1993'yê de mir. Gelo sedemê hemû qeyranên salên dawîn yên Peravên Îvorîye pirsgirêka destnîşankirina xelefî ye?
R. 20

# Sir û çizirîn

SERGE HALIMI

Di cotmeha sala 1962ê de, bayê şerekî mezin ê nukleerî rûyê cîhanê difirikîne. Demeke kin berîya hilbijartinên nîvserdemî, serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê John Kennedy bê navber tîne ziman ku tu baregeheke fuzeyên êrîşê yên sovyetî dê li Kubayê bi cih nebe, ew ê neyê qebûlkirin. Moskova wêdetir jî diçe, lê belê bêyî ku karibe tê derxe ka daxuyanîyên amerîkî ji bo nermkirina hilbijêran tên kirin an jî îqazên cidî û jidil in. Ragihandinên veşartî dê niyeta aktoran diyar bikin û weha bikin ku karibin buhranê çareser bikin.

Amerîkî bi awayekî dibêjin ku ew ê bi berdêlên ku Moskova dixwaze, razî bibin, lê belê paşê û bê lezûbez: vekişandina fuzeyên NATOyê yên li Tirkiyeyê bicihkirî. Her çi aliyê sovyetî ye, bi nameyeke pir veşartî, Nikita Kruschev ji Kennedy garantiyê dixwaze ku careke din bi ser Kubayê venegire, da ku Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst jî bêyî ku tiştekî ji ber xwe winda bike, fuzeyên xwe yên li giravê vekişîne. (1)

Gelo wê îfşayên Wikileaksê nerehetiyê bide dîplomasîya ku, mîna di 1962ê de, pêşîyê li şeran digire, an jî ya ku bêhtir şeran amade dike? Ji ber ku çizirînên agahîyan, hemû rastî heman helwêstan nehatin. Gava "Plana Potkova" ya sirbî ji bo rewakirina şerê Kosovoyê ji aliyê eskerên alman ve hat amade kirin, gava *New York Times*ê derewên Pentagonê yên têkildarî hebûna çekên hilweşandina girseyî yên li Îraqê eşkere kirin, Qesra Sipî qet jî doza mueyîdeyên taybet nekir…

Hin kes îdîa dikin ku îfşaya têkildarîya filan an jî bêvan sefareta mezin a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dibe ku jiyana hin kesên çûne serdana wê, bixe xeterê. Lê belê madem eşkerebûna agahîyan pir xeter e, (heta niha jî ji ber vê diyardeyê tu mexdûrek nehatiye destnîşankirin) çima ew belgeyên veşartî ewçend xirab tên parastin? (di *rûpela 18ê de nivîsa Felix Stalder bixwînin)*

Gelo ev rîskên siyasî ne? Rêveberê sosyalîst ê fransî yê ku di 2006ê de bi qasidekî George W. Bush ewle bû û pê da zanîn ku dijberîya Parîsê ya beramberî şerê li Îraqê *"zêde vekirî"* bûye (François Hollande), an jî ewê ku dixwaze wisa nîşan bide ku têkiliyên navbera her du welatan *"hertim baş bûn gava ku çep li ser desthilatê bûn"* (Pierre Moscovici) bi herhalî wê tercîh bikirana ku ew hevaxaftin piştî çend dehsalên din hatibana eşkere kirin.

Li gel vê yekê jî, sefîrekî mezin ne peyamnêrekî jirêzê ye. Ji bo nirxandina bandora xwe, ew dikare hewl bide kesên bi wan re dide û distîne ji bo welatê xwe bike alîgir. Gotinên ku li hevaxivên dîplomatên amerîkî tên bar kirin, nehatibin piştraskirin jî, ji bo weşandina wan, bes bû ku bişibin heqîqetê, ango li tiştê ku jixwe rastbûna wan dihat texmînkirin, biguncin.

Her çi ewlebûna bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye, di vê mijarê de Wezîrê parastinê Robert Gates, xwe aram nîşan dide û weha dibêje: *"Hukûmetên ku bi Dewletên Yekbûyî re didin û distînin vê yekê ji bo berjewendîyên xwe dikin. Ne ji ber ku ji me hez dikin, ne jî ji ber ku bawer dikin, em zanin razekê vedişêrin..."* (2)

1 Binihêrin Graham T. Allison, Essence of Decision. Explaining the Cuban Missile Crisis [Ruhê biryarê. Şiroveya Krîza Mîsîlan a li Kubayê], Little Brown and Company, Boston, 1971

2 Sêşem 30ê mijdarê, dema di civîneke çapemeniyê de li Pentagonê

Wergera ji fransî: Baran Nebar


**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

# Civata tirk kurdan çawa fam dike?

ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ

Heta roja îro, hêza herî mezin ya ku di warê kurd, zimanê kurdî û pirsgirêka kurdî de teşe daye raya giştî, hertim dewlet bûye. Çapemenî, zanîngeh, dezgehên dadgehî, rêxistinên civaka sîvîl, sendîka, odeyên pîşeyî û hwd. di mijarên wekî kurd û pirsgirêka kurdî de li gor daxwazên îdeolojîya fermî tev digerin. Dibe ku fermanên nivîskî jî hebin, ku nîşan bidin ka kesayetî û sazî sebaret bi van mijaran çawa tev bigerin, bi çi têgihan bipeyivin. Lê belê aşkere ye ku ev ferman bi nivîskî û devkî hatine pejirandin. Li ser mijara kurdan, di navbera axaftinên profesorên zanîngehan û hemwelatîyekî asayî yê li qehwexaneyeke gund tu cudahîyeke berbiçav nîne. *"Li Tirkîyeyê herkes dikare bibe her tişt. Dikare bibe serokkomar jî, serokwezîr jî". "Li Tirkîyeyê herkes xwedîyê her mafî ye. Kurd hewcê din doza çi dikin?"* Di warê têgihiştina kurdan de, di navbera piranîya profesorên zanistên civakî û hemwelatîyekî asayî de cudahîyên ciddî nînin.

Di pergala siyasî ya tirkan de îdeolojîya fermî xwedî risteke weha ya yek-tîpkirinê ye. Fermanên nivîskî û devkî yên îdeolojîya fermî hatine pejirandin. Kesayetî û sazî dizanin ka li hember rewşekê, li hember pêşveçûnekê civakî an jî siyasî helwêsteke çawa nîşan bidin. Li ser mijarên din raya giştî ya tirk dikare di çarçoveyeke azadtir de pêk were lê belê di mijarên wekî pirsgirêka kurdî de dîyarker dewlet bi xwe ye û ev yek jî balê dikişîne.

Dewlet jî heta roja me ya îroyîn di warê mijarên kurd, kurdî û Kurdistanê de nebûye xwedî niherîneke erênî, nebûye xwedî peyveke erênî. Dewletê heta îro ji tepisandin, tunekirin, kokqelihandin, poşmankirin û dorpêçkirinê pê ve qala tiştekî din nekirîye. Tê zanîn ku terora dewletê bi awayekî çalak hatîye bi kar anîn û ev fikir û raman hatine pêkanîn. Dema ku zimanê kurdî, çanda kurdî, jîyana kurdî dibin mijar, piçûkxistin, piçûkdîtin, zelîldîtin hertim bûne helwêstên jêneger ên dewletê. Pêvajoya bingehîn ya li ser têgihiştina kurdan yên ku tirkan û civaka tirk pêk tînin, ev in. Aşkere ye ku vê helwêsta dewletê ji hêla dêrûnî û fikirî ve rengê xwe daye tirkan û civaka tirk. Kes û komên din jî hene, bêyî ku bi ya dîtina dewletê bikin, kurdan û civata kurdî têdigihîjin. Lê belê ev gelek hindik in. Gelek aşkere ye ku ev yekemîn a pêvajoya sereke ye.

Ka em li serdema şer a 25-26 salî bifikirin. Dewletê piştî her operasyonê, piştî her pevçûnê daxuyanîyên bi vî rengî dan. Çapemenî, televîzyon, radyo û rojnameyan ev gotin zêde kirin, berbelav kirin. Partîyên sîyasî, sendîka, rêxistinên sîvîl ên civakî bûn hêza ku ev nihêrîn şîrove kirin. Gelê tirk, li ser mijara kurdan hertim ev tişt bihîstin, ev tişt zanîn. Avabûna dêrûnî û fikirî ya gelê tirk jî bi van daxuyanîyan hatin pêk anîn.

Ev gotina dewletê xwedî aliyekî weha ye jî. Bal tê kişandin ser gotina ku herkes tirk e, neteweyek bi navê kurd û zimanekî bi navê kurdî nînin. Her weha tê dîyarkirin ku yên ku ne tirk bûn jixwe bûne tirk, guh nadin nasnameyên xwe yên eslî û pê serbilind in ku tirk in. Lê belê dema ku kurd bi îddîayên xwe yên kurdbûnê derdikevin holê, ev zanîn diheje, derz dikevin vê famkirinê. Ev yek her weha weke nîfaqekê, weke navberxerabkirinê tên şîrove kirin. Tê gotin ku bi tenê hêzên derveyî welêt, neyarên ji derve, yên emperyalîst û hêzên li hember mezinbûn û hê jî mezintirbûna Tirkîyeyê hesûd dikarin vê yekê bikin. Hêzên dereke, emperyalîst jî bi vî awayî dikevin nav van têkilîyan. Anku haydarbûna kurdan ji mafên xwe ên xwezayî, weke gelê kurd daxwazkirina mafên xwe, bi emperyalîstan ve tên girêdan.

Tevî vê helwêsta dijwar a dewletê jî, pirsa kurdan êdî xwe ferz dike. Pirsgirêka kurdî êdî di rojeva sîyasî ya Tirkîyeyê de cihê xwe girtîye. Di rêza yekem de cihê xwe girtîye. Kurd di vê çarçoveyê de çareserîyên xwe yên ji bo pirsgirêkê dîyar dikin û di çapemenîyê de li ser van pêşnîyaran munaqeşe tên kirin. Wekî mînak Kongreya Civaka Demokratîk qala "xweserîya demokratîk",

R. 3

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## Artêşa tirk û niqaşên li ser zimanê kurdî

Rojnameya *Financial Times* di 17ê kanûnê de gotarek li ser nîqaşên sebaret bi zimanê kurdî li Tirkiyeyê û nerazîbûna artêşa tirk weşand. Gotara ku ji aliyê Dephine Strauss ve ji paytextê vî welatî Enqereyê hatiye nivîsandin, dibêje artêşa tirk peywira xwe ya parastina komarê li hember her cure tehdîdên li dij yekitiya neteweyî bi bîr xist û bi zimanekî tûj nerazîbûna xwe ya li dij pêşniyarên siyasetmedarên kurd ên ji bo bikaranîna zimanê kurdî ya di qada giştî de, ragihand. Her weha hat bibîranîn ku ji meha hezîranê ve, ji dema ku serokê nû yê artêşê Işık Koşaner hatiye hilbijartin, ev cara pêşîn e ku mudaxeleyeke bi vî rengî ji artêşê hatiye.

Rojnameyê herweha sebaret bi rewşa zimanê kurdî nivîsiye: *"Herçend li Tirkiyeyê ji bo befirehkirina mafên çandî yên kurdan reform hatine destpêkirin û kanaleke dewletê dest bi weşana kurdî kiriye jî, bikaranîna zimanên hindikahiyên neteweyî li Tirkiyeyê wekî meseleyeke hesas her dimîne ku ev welat ji arî û xweliyên Împaratoriya Osmanî wekî netewe-dewletek hatibû damezirandin. Heta demên nêzîk artêşa tirk hebûna kurdan wekî komeke etnîk înkar dikir, hînkirina zimanê kurdî di dibistanên dewletî de hîn tabûyek e û tîpên X, W, Q ku di kurdî de hene lê di tirkî de nînin, li derveyî alfabeya tirkî tên hiştin."*

## Xweserîya demokratîk, duzimanî û Tirkîye

Piştî ku Kongreya Civaka Demokratîk (KCK) û Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) projeya xwe ya *Xweseriya Demokratîk* û daxwazên xwe yên ji bo bikaranîna kurdî diyar kirin, van mijaran him di nav siyasetmedarên tirk de him jî di çapemeniya tirkî de bi awayekî berfireh deng veda.

Ajansa nûçeyan a DHA û AAyê di 20ê kanûnê de niqaşa di navbera serokê parlamentoya tirk Mehmet Ali Şahin û hevserokê BDPê Selahattin Demirtaş de ragihand. Şahin sebaret bi komxebata DTKyê ku li Diyarbekirê bi rê ve çûbû, got ku TBMM an ku Meclîsa Tirk yekta cih e ku pirsgirêkên welêt dikarin lê bên niqaşkirin û ew kongre yan jî meclîseke din nas nakin û yên ku dikevin nav hewldaneke weha dê paşê berdêla wê jî bidin. Sebaret bi parlementerên BDPyî ku di meclîsa Tirkiyeyê de bi kurdî axivîn, Şahin got di sala 1876ê û vir ve zimanê fermî tirkî ye û gengeşeyên li ser zimanê fermî niqaşên pûç in.

Hevserokê BDP Selahattin Demirtaş jî bi rêya rojnamegeran bersiva Şahin da û got zimanê dayikê nabe ku ji aliyê qanûnan ve bê diyarkirin û divê ev yek nebe karê serokê parlementoyê ku bibêje kî dê bi kîjan zimanî bipeyive. Demirtaş li ser gotinên Şahin "ev gotin dikarin bibin sedem ku partiyek bê girtin" got ne yek, 100 partî jî bên girtin zimanê dayikê nikare bê guhertin û ew dê wekî partî berevaniya mafê zimanê dayikê bikin.

Di 21ê kanûnê de rojnameya Hürriyetê nivîsa Nuray Mert a bi sernavê *Ji kurdan re Xweseriya Demokratîk* weşand ku Xanima Nuray di komxebata DTKê de beşdar bûbû. Mert niqaşên xweseriya demokratîk wek derfeteke cidî bi nav dike û dibêje ku ew xwedî fikaran e ku ev derfet di nav vê çarçoveyê de bê asêkirin û ji dest biçe. Nivîs herweha dibêje heger aliyê tirk xwedî niyeteke cidî be, wê demê divê ji kurdan tarîfa xweseriya demokratîk nexwaze, lê belê bila bi hev re rûnin û tarîfa xweseriyê bi hev re diyar bikin.

## Kifşa êgir û çareserîya pirsgirêka kurdî

Di 22ê kanûnê de heman rojnameyê gotara M. Ali Birand weşand. Birand di nivîsa xwe de cih dida rapora Prof. Dr. Vamik Volkan ku pêşkêşî serokwezîr Abdullah Gül kiribû. Prof. Volkan di warê bihevrejiyana wan gelan yên ku şerê hev dikin de lêkolînê dike.

Prof. Volkan hin pêşniyaran pêşkêşî serokwezîr Gül dike û di nav wan de pêşniyara ji bo domdariya agirbesta ku PKKê ragihandiye û daketina çekdarên PKKê ji çiya, divê artêşa tirk dev ji operasyonan berde û dewlet jî hin gavan biavêje, heye. Herweha ji hukûmetê tê xwestin ku 'vekirina kurdî berdewam bike û bi wêrekî tev bigere. Di raporê de, wekî daxwazên DTKyê, tê pêşniyarkirin ku birêvebiriyên herêmî bêhtir bi hêz bikevin û perwerdehiya bi zimanê dayîkê bê niqaşkirin û zimanê kurdî ne li seranserî Tirkiyeyê jî be li hin herêman di dibistanan de bibe zimanê hilbijarbar. Weha tê lê zêdekirin ku pirsgirêka kurdî nabe ku bi înkarê bê çareserkirin.

Birand di dawiya nivîsê de dibêje *"Mamoste Volkan, bi awayekî eşkere pêşniyar dike ku dewleta tirk bi xwe biryarê bide ka çi dixwaze û paşê bikeve rê"*.

Birand di beşa duyem a nivîsa xwe de herweha balê dikşîne ser helwêsta Bülent Arınç û dibêje her ku diçe siyaseteke nermtir dimeşîne û serokwezîr Erdoğan jî li hember wî tiştên tund nabêje.

## Tirkiye û Kurdistana Iraqê: ji dijminatiyê ber bi hevpariyê ve

Gotareke ji aliyê rojnamevanê bi navê Xorşîd Delli li ser Tirkiye û Kurdistana Başûr di Al-Jazeerê de (El Cezîre) derketiye û ev gotar ji aliyê nivîskarê Kurd Jan Dost bi zimanê kurdî hatiye wergerandin. Di vê gotarê de qala metirsiyên veşartî ji Tirkiyeyê tê kirin ku kurdên Iraqê ne neheq in ji Tirkiyeyê bitirsin. Tirkiye hertim hewl daye ku bi dijminên Kurd re bibe yek û li dijî kurdan çi ji dest tê dike.

Birêz Delli dinivîsîne:

"*Di hafizeya kurd de metirsiyên veşartî ji Tirkiyeyê hene, ev yek dibe ku vedigere wê tecrubeya dîrokî ya ku bi avakirina komara Tirkiyeyê re li ser destê Mistefa Kemal Ataturk sala 1923'ê dest pê kir û heta dawiya serdema wî dom kir. Di wan salan de gelek serhildan û tevgerên kurdan têk çûn; artêşa tirk bi tundî şoreşa Şêx Seîdê Pîran ya sala 1925'ê şikand, ew şoreşa ku di eslê xwe de ji ber ilana Ataturk a bidawîanîna sîstema xelîfetiya islamî û inkara mafên netewî yên kurdan, ku wî bixwe sozê pêkanîna wan dabû, rû da. Di demeke kurt de piraniya serok û serkêşên wê şoreşê, Şêx Seîd bi xwe jî di nav de, hatin bidarvekirin.*"

Tirkiye ji aliyekî tiliya xwe dixe nav aramiya herêmê û naxwaze kurd li wê derê bi hêz bin, bajarên mîna Musil û Kerkukê bigirin dest û alîkariya Turkmenan dikin ku ew bajar nekeve destê kurdan, herçend hejmara kurdan li van bajaran gelek zêdetir e jî. Tirsa Tirkiyeyê ew e ku îlana dewleteke kurdî dikare jibo kurdên Tirkiyeyê jî bibe mînak û ber bi dewlekê ve biherike. Lê DYA li hember planên dewletên herêmî yên mîna Tirkiyeyê asteng e ji ber ku ew vekirî eşkere kirine ku tu hêz nikare destê têxe nav kar û barên hundirê Iraqê. Ji aliyê din bazirganiya Tirkiyeyê bi Kurdistanê re ji ya navbera Tirkiye û Îranê ne kêmtir e. Herêma Kurdistan jî zimanê aştiyê û lihevhatinê bi gelek awayan, bi taybetî jî bi rêya bazirganiyê bi kar tîne, ev yek dihêle ku polîtîkaya navbera kurdan û deletên cîran rewşeke pozîtîv biafirîne.

Di dawiya nivîsa xwe de birêz Delli îşaret pê dike ku mecbûriyeta têkiliya aram ya herêmê dike û behsa xurtbûna têkiliya hikumeta Erdogan bi herêma Kurdistanê re dike û bal dikşîne ser wê yekê ku ev ji tirsa Tirkiyeyê tê; bi van têkiliyan daxwaza Tirkiyeyê ew e ku pirsgirêkên xwe bê ku pirsa kurdên cem xwe tam çareser bike, di çarçoveyeke kêmtesîr de bihêle.

Aramî û normalîzekirina rewşê daxwaza kurdan e jî, bi vî awayî têkilî li ser xwesteka her du aliyan her diçe xurt dibe.

# Ji Ewropaya kevnar

**BERNARD CASSEN**

Kevnebirêveberê giştî (1962-1982 û 2000-2003) yê kovara New Left Review (Çepa Nû) li Londrayê û profesorê dîrok û civaknasîyê yê Zanîngeha Kalîforniyayê li Los Angelesê, Perry Anderson yek ji sîmayên herî naskirî yên marksîzma brîtanyayî ye. Ew di heman demê de yek ji kesayetîyên herî kone û zana yê qada siyasî û çandî ya piranîya welatên Ewropayê ye, ku wekî gerokên îngilîzî yên sedsala XVIII ê li van welatan jî digere.

Berhema ku ew pêşkêşî me dike gelek bi îddia ye. (1) Ew li ser rewşa heyî û siberoja Yekîtiya Ewropayê û pirsa nû ya Rojhilatê ku di riya Qibris û Tirkiyeyê re nas kiriye, radiweste û vê xebata xwe bi berhemên li ser sê welatan (Fransa, Almanya û Îtalya, lê Birîtanya ne tê de...) temam dike. Ew li ser hev jî deh tekstên ku çi bigire versîyonên wan ên yekem di navbera salên 1996 û 2009ê de di NLR û London Review of Books (Kovara Pirtûkan a Londrayê) de, carna berî ku temam bibin, hatine çap kirin.

Anderson pir hindik wan cûre tekstên zanyarîyê ku ji alî her cûre pispor û akademîsyenên -yên di nav Yekîtîyê de û yên derveyî wan- di bin bandora Komîsyona Ewropayî de ne û ji berfirehbûna wê îstifade dikin, tên nivîsîn û mirov ji wan zû aciz dibe dinivîse. Li gor wî, mekteba zanîngehî ya brîtanî-amerîkî (2) û bi taybetî jî ya Dewletên Yekbûyî -ku bêtir bi çavekî rexnegirîyê li Yekîtîyê dinêre - rexneyên xwe teorîze dike û dibêje, ew "nesneya siyasî ya nenas" (Jacques Delors) avayiya Ewrûpayê ye. Lê ew vê yekê berî hertiştî bi navgînên zanyarîya siyasî, bi disiplîna xwe ji rastîyên civatî dûr dikin, ku di encamê de ev yek zêde tiştekî îfade nake. Bi vî awayî, Anderson ji jêgirtineke ji dîroknasê brîtanî Alfred Cobbanê ku ji bo wî ev beşê zanînê hîn pêvajoyek e, "ji bo xwe ji vê mijara xeternak a ku jê re dibêjin siyaset, berî ku bigihê mistewayê zanyarîyê, biparêze" zewqeke şeytanî digire.

Piranîya wan lêkolînerên ku tezên xwe ji nû ve xwendine (Ernst Haas Alan Milward, Andrew Moravcsik, Robert Keohane, Craig Parsons, John Gillingham, Barry Eichengreen, Neil Fligstein, Giandomenico Majone yê îtalî-amerîkî, Jan Zielonka yê polonî, Larry Siedentop, Joseph Weiler, Philip Schmitter) bi temamî lîteratura mijarên nivîskî, ji bilî îngilîzî bi zimanekî din nizanin. Ev yek ji bo lêkolînerên zimanên din jî, bi kêmanî ji bo yên fransî jî weha ye. Berevajîya hevkarên xwe yên ji Atlantîkê wê de (heta ji Manşê wê de) ku ji bo wan Yekîtîyê serveyeke zanyarîyê ya egzotîk e, akademîsyenên fransî di qadeke siyasî û civatî ya bi tevayî jihevbela de rola xwe dilîzin, weke ku serketina "na" ya di referandûma li ser Peymana Destûrî ya Ewropî, ku di 29-05-2005ê de pêk hat jî nîşan dide. Ew dizanin ku berhemên wan bi çi awayî dibe bila bibe tesîrê li minaqeşeyên di raya giştî de dikin. Gelo ev yek bi qasî ku mirov derbarê karaktera rastîn a projeyeke ewropî ku hertim diguhere pirsê ji xwe bike ne giring e, ma ew jî wê gavê nabe ku mirov xwe ji biryarên bêtîraz re amade bike?

Gava em van peymanên ku her roj diguherin bidin ber çavan, dê ji bo mirov ne surpriz be, ji ber ku Anderson dîtineke pir krîtîk ya yekîtiyeke ku bi awayekî xwekuj hatiye guhertin û bûye makîneya şer ya neolîberalîzm û atlantîzmê daye ber xwe. Lê nivîskar nakeve tu qaliban û tevî îradeya wan jî dev ji girtina hin xwendevanên xwe berdide, nostaljîya xwe ya ji bo Ewropayeke ku heta niha tu carî pêk nehatiye, bi têgehên Gaulleyî ifade dike: "Rêza min a li hemberî van mîmarên orîjînal qet nehatiye guhertin. Heta niha kesî berî wan projeyeke weha pêk neanîye û mezinahîya wê jî her bûye bela serê berdewamîya wê ya wê dawîyê." Ger em bên ser kesê yekem ê ji "mîmarên" wê jî, Jean Monnet e, ku weke maceraperestekî hatîye nasîn, nivîskar jê re dinivîse ku "Ew ji ekola Georges Duhamel bêtir ser bi ya André Malraux e." Ev yek ne helwêsteke di bin bandora demanê de ye, berevajîya wê nîşana cesaret û peyva xwe danequrtandinê, azadîya ramanî û eklektîzmeke ronakbîrîyê ye ku êdî pir kêm bûye.

1 Perry Anderson, The New Old World *[Dunyaya Kevin a Nû]*, Verso Books, Londra, 2010, 561 rûpel, 24,99 lîra. Ev berhem hîn bo zimanê fransî nehatiye wergerandin. Pirtûka dawîn a Perry Anderson ku li Fransayê çap bûye Les Origines de la postmodernité *[Orîjîna Postmodernîteyê]* ye, Les Prairies ordinaires, Parîs, 2010

2 Berhem pêşkêşî dîroknasê binavûdeng ê brîtanî, Alan Milward hatiye kirin ku di îlona bihorî de çû ser dilovanîya xwe

Wergera ji fransî: Yakûp Karademîr

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Celîl Kaya
Semra Polat
Jan Dost

**Revîzyona Wergeran**
Simko Destan
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Webdeveloper**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# Civata tirk kurdan çawa fam dike? (Dewama rûpela 1.)

qala "Kurdistana xweser" dike. Di gotûbêjên çapemenîyê de tê angaştin ku divê ev pêşnîyar ji alîyê gelê tirk ve werin qebûl kirin, divê tirk di warê pêşnîyarên kurdan de werin îkna kirin. Ji xwe pirsgirêk jî li vê derê xwe nîşan dide. Di rewşeke weha de, ku dewlet di warê kurdan û zimanê kurdî tu gotineke baş yan erênî nake û hest û fikrên gelê tirk ji alîyê dewletê ve tên dîyar kirin, ew dê çawa sebaret bi pêşnîyarên kurdan werin îkna kirin? Ma hêsan e ku mirov ji têgihiştinekê, ku hişê mirovan bi gotinên wekî "kurd tunene, herkes tirk e, zimanekî bi navê kurdî jixwe ne tu ziman e, tiştekî prîmîtîv e." tije dike were ser mijara xweserîyê, Kurdistana xweser?

Pirsgirêka bingehîn di vir de ne destûrî yan qanûnîbûn, lê zêdetir hişmendî ye. Alozîya ku di pirsgirêka kurdî de tê jîyin, ji ber neqanûnîbûnê, ji ber nebûna destûreke rêkûpêk rû nade. Ji ber ku hişmendî ne rêkûpêk e, hişmendî nayê guhertin, di warê têgihiştin û çareserkirina pirsgirêkê de atmosfereke rêkûpêk nayê afirandin, pêk tê . Di çend salên dawîn de, di serdema desthilatdarîya hukûmeta Partîya Edalet û Pêşveçûnê (AKP) de hin guhertinên qanûnî pêk hatin. Lê belê ev guhertin ji ber ku Ewropayê ew dixwestin pêk hatin. Nîvçe û pînekirî pêk hatin. Ji xwe ev guhertin bi awayekî ciddî nehatin birêvebirin jî. Lê belê li hember van hemûyan, di du-sê salên dawîyê de di gotinên dewletê û yên hukûmetê de nermbûnek xwe nîşan dide. Karmendên çapemenîyê, televîzyon, radyo û rojname hewlê didin ku pirsgirêkê bi awayekî rêkûpêk fêm bikin û li ser gotûbêjê bikin.

Ev têkilî, ev rewş bi awayekî aşkere tê dîtin. Aşkere ye, bêyî ku li cem dewlet û hukûmetê guherîneke tendurust a hişmendîyê pêk neyê, pirsgirêk nikare were çareser kirin, qanûn û destûrên demokratîk nikarin werin çêkirin. Guhertina hişmendîyê jî bi tenê bi rexnegirtina li sîyasetên li dijî kurdan, ku ji damezirandina komarê û vir ve hatine çêkirin û birêvebirin, bi cih dibe. Domdarîya vê rexne li xwe girtinê bivê nevêyî ye. Bêyî hebûna vê rexnelixwegirtinê, bêyî rûbûrûbûna bi rabirdûyê re bêyî aşkerekirina rastîyan, guherîneke tendurist a hişmendîyê ne mumkin e. Bêyî bicihanîna van, pêşkêşkirina modelên çareserîyê û bicihanîna wan nagihe encamên tendurust.

### "Kurdistana xweser a demokratîk"

Gotûbêjên li ser pirsgirêkê di çarçoveya reşnivîsan de dest pê kirin ku van rojên dawîyê di civîna giştî ya Civaka Demokratîk de hatin dîyarkirin. Gotarên ku di civînên 18-19ê kanûna 2010î de hatin pêşkeş kirin di çapemenîyê de jî belav bûn. Mijarên wekî "Xweserîya Demokratîk", "Kurdistana Xweser", Modela Baskê, Modela IRAyê tên rojevê.

Di pirsgirêka kurdî de, gelek girîngtir e ku mirov ji rêyên çareserîyê zêdetir li ser taybetmendîya bingehîn ya pirsgirêkê raweste. Ev jî di salên 1920î de, di serdema *Cemîyet-î Aqwam* (Cemîyeta Miletan) de parçekirin û parvekirina Kurdistan û gelê kurd e. Ev yek alîyekî girîng a taybetmendîya bingehîn a pirsgirêkê ye. Divê ev faktum bi hûrgilî bê aşkere kirin. Sedemên van operasyonan, ku li naverasta Rojhilata Navîn pêk hatine, çawa pêk hatine û encamên wan çi bûne divê mirov li ser hûr be. Bi tenê civakên, ku zaafeke berfireh û kûr dijîn, dikarin bibin hedefa sîyaseteke weha. Zaafên ku kurd dijîn helbet nabin ku li dûrî bala mirov werin hiştin. Dewletên ku kurdan û Kurdistanê bi awayekî hevpar li jêr kontrola xwe digirin, hewlê didin ku rewş her weha bimîne. Ev dewlet bi tundî hewlê didin ku sîyasetên ku di salên 1920ê de li dij kurdan hatine meşandin, pêvajoyên ku di fiîlîyatê de hatine jîyîn neyên nîqaş kirin, neyên qal kirin û neyên aşkere kirin.

### Di pisgirêka kurdî de prensîpên bingehîn

Divê Kurd bikaribin xwe bi xwe bi rê ve bibin. Kurd divê xwedî mafê dîyarkirina dahatûya xwe bin. Bêguman gelek girîng e ku nasnameya kurdbûnê bêkêmasî were jîyîn. Divê kes ji perwerdehîya bi zimanê dayîkê, an ku ji perwedehîya bi kurdî û ji perwerdehîya mecbûrî ya bi kurdî danekeve. Dersên hilbijartî dikare ji bo tirkan, ji bo kesên ku ne kurd in dikare were meşandin. Heger çareserî van prensîpên bingehîn bi cih bîne, dikare bibe çareserî, dikare bibe domdar.

### Dewlet çima gavan navêje?

Li vê derê tespîtkirina nîyet û bendewarîyên dewlet û hukûmetê dê bi kêrhatî be. Ez bawer dikim dewlet û hukûmet xwedî wê nîyet û bendewarîyê ne ku kurd dê werin bişavtin, dê asîmîle bibin. Dewlet û hukûmet li ber xwe didin da ku di pirsgirêka kurdî de gavan neavêjin. Dibe ku weha difikirin: Dem li gor berjewendîya dewletê ye. Bi demê re bişavtin bihêztir û berfirehtir dibe. Lewma ne rast e ku gav werin avêtin, li cem kurdan hêvî werin afirandin. Baştir e ku bi gotinên 'dikim, encam didim, dê bikim, dê were kirin kurd werin aliqandin lê belê tu tişt neyê kirin.

TRT-6 helbet gaveke girîng e. Her çend piçûk be jî gavek e ku girtî dikarin di girtîgehan de digel xizmên xwe yên ku diçin seredana wan bi kurdî bipeyivin. Lê ji van hemûyan mezintir bêguman gelek girîng e ku pirsgirêka kurdî di çapemenîyê de, di nav rêxistên sîvîl ên civakî de tê axaftin, tê gotûbêj kirin. Reaksîyona hişk a li hember perwerdehîya bi zimanê dayîkê bi nîyeta bişavtinê re ji nêz ve têkildar e. Ji ber van hemû sedeman, pêşveçûneke girîng e ku Partîya Aştî û Demokrasîyê û bi gelemperî kurd binê perwerdehîya bi zimanê dayikê û perwerdehîya bi kurdî xêz dikin. Ev yek nîşan e ku dê hêvîyên bişavtinê yên hukûmet û dewletê bi ser nekevin.

Divê helwêsta BDPyê ku dibêje "em li benda hukûmetê namînin" ciddî were dîtin. Ev helwêst dikare weha were nirxandin: Dewlet di van rojan de tu gavan navêje. Lê belê dewlet, hukûmet digel tiştên ku dibêje, dike heger li cem me bawerîyeke hêzdar peyda bike ku di nav du-sê salan de wê gavên girîng biavêje hingê em dikarin li bendê bisekinin. Lê belê dewlet, hukûmet tu tiştî nake da ku li cem me bawerîyeke weha peyda bibe, her tim tê gotin ku nabe. Ji ber vê yekê divê em karê xwe bixwe bikin. Ev yek herweha li hember xwe tevnedana dewletê, hukûmetê helwêsteke rewa ye.

### Bihêzxistina birêveberîyên herêmî- Kurdistana xweser

Lê belê projeya xweserîya demokratîk, ku ji alîyê BDPyê ve tê bi lêv kirin, ne projeyeke tendurist e. Tê pêşnîyar kirin ku Tirkîye bibe 25 herêm, û di warên perwerdehî, tenduristî, îskan û pêşveçûna ekolojîk de birêvebirîyên herêmî bên bi hêz xistin. Tê xwestin ku hin selahîyetên îdareya navendî dewrî birêvebirîyên herêmî bibin. Lê belê bingeha wê ya dîrokî gelek qels e. Têgihiştineke rast e ku dibêjin *"Destûra 1921ê xweserî dida birêveberîyê herêmî, Destûra 1921ê dewleteke unîter nedianî"* lê belê hukmên vê destûrê nehatin birêvebirin. Xalên 11 û 12 ên 1921ê ku bi xweserîya birêveberîyên herêmî re têkildar bûn di 1923ê de roja ku komar hat ragihandin, hatin betal kirin. Hêja ye ku mirov vê betalkirinê ya berîya destûra 1924ê li ber çavan ragire. Bi guhertina 1923ê weha nayê gotin: *"xalên 11 û 12, ku xweserî dianî, hatine betal kirin."* Bi guhertina 1923ê di xalên 11 û 12 de hilbijartin û selahîyetên serokkomar tên dîyarkirin**.** (1)

"Xweserîya Demokratîk" ku wekî bihêzxistina birêvebirîyên herêmî tê îfade kirin, têra bicihkirina daxwazên bingehîn ên kurdan nake. Ji bo ve divê herî kêm federasyon were fikirîn. PKK û BDP jî tê de, piranîya kurdan li dij fikira federasyonê derdikevin. Argumanên bi vî rengî tên pêşnîyar kirin: Hejmareke gelek zêde ya kurdan li Rojavayê dijîn. Beşekî mezin a kurdan li Rojavayê dijîn, lewma nabe ku federasyon were fikirîn. Ev fikireke çewt e. Balıkçı yê ku di 8-10/11/2010ê de roportaj daye Neşe Düzel ji bo rojnameya Tarafê pê re roportaj kirîye, weha dîyar dike: "Stratejîst û profesorên li ser televîzyonan tika ye nexşeyekê hildin û eger hûn bikarin, xweserîya erdnîgarîyê xêz bikin. Gelo mumkin e? Ji neteweperestên tirk û kurd re silametî be. Sosyolojî derstûrê nade Kurdistanê..." Ev dîtinên ku ji alîyê Balıkçı ve hatine gotin, ne dîtinên tendurist in. Balıkçı li ser navê dewletê dipeyive, dîtina dewletê tîne ziman. Federasyon, ji bo wan kesan e yên ku ji dirêjîya dîrokê de, ka embêjin ev 4 hezar 5 hezar sal in ku li Kurdistanê dijîn. Bêguman li vê derê kurd piranî ne. Balıkçı dibêje ji kurdên ku li Kurdistanê dijîn pirtir kurd li Edene, Mêrsîn, İzmîr, Stenbolê û hwd.dijîn. Heger birêvebirineke wekî federasyon nebe tu kes nikare li mafên kurdên wan deran xwedî derkeve. "Gava bê gotin ku piranîya kurdan li Rojavayê dijî lewma federasyon nabe" hingê koçberî û mişextî jî tên teşwîq kirin.

Polîtîkaya bingehîn a dewletê ji bo kurdan bişavtin e. Rewşa ku ji bo bişavtinê guncan e rakirina kurdan ji war û welatê wan û sirgunkirina wan a bo Rojavayê ye. Paşdehiştina herêmî, dibe sedem ku mobîlîteya horîzontal a nifusa kurd zêde bibe. Ev yek jî ji bo bişavtinê rewşeke guncaw peyda dike. Ev yek polîtîkayek e ku dewlet ji komarê ve bi awayekî sîstematîk bi rê ve dibe. Dema ku fikrên wekî federasyon tên bi lêv kirin dewlet dest bi gotinên weha dike. "Li Tirkîyeyê 50 komên cuda yên etnîk dijîn." Çapemenî, zanîngeh û nivîskar jî vê gotinê rasterast dubare dikin. Ev yek jî ji dijwartirkirina çareserîyê pê ve ne tiştek e. Ji ber ku hin ji wan komên etnîk guh nadin eslên xwe. Ew pê kefxweş in ku tirk in, bûne tirk û di nav lêgerînekê de jî nînin. Helwêsta wan bi gelemperî ev e: "Kurd bila diya xwe nebîne." Heger mirov kurdan bi wan koman re bide ber hev, navê kurdan bi navê wan koman re bîne ziman hingê ev yek ve projeyê şêlo dike, bêtesîr dihêle. Lê belê têkoşîna azadîyê ya kurdan ji sedsala 19ê û vir ve didome.

Dewlet, hukûmet kurdan wekî "Kurd û Zaza" ji hev cihê dike. Ev yek ne rast e. Ji ber ku zaza, kurdên kirmackîaxêv in. Gotina kurmanc û zaza rast e lê belê kurd û zaza ne rast e. (2)

### Modelên çareserîyê

Dema ku çareserî tên rojevê modelên wekî modela Baskê, modela IRAyê jî tên nîqaş kirin. Lê belê hin model hene ku divê berîya Bask û IRAyê werin gotûbêj kirin. Li Kurdistana Başûr çareserîyeke çawa pêk hatîye? Pêşmerge çawa karibûye ku bibe hêza herêmî ya Birêvebirîya Herêmî ya Kurdistanê? Dê bikêrhatî be heger mirov li ser detayên vê mijarê hûr bibe.

A duyem, Tirkîye ji bo tirkên li Qibrisê çi dixwaze? Berîya "Hereketa Aştîyê" ya 1974ê li Qibrisê dora 150 hezar tirk dijîyan. Piştî herekatê ji Tirkîyeyê gelek kes şandin giravê. Niha dora 200 hezar tirk li wê derê dijîn. Komara Tirk a Bakurê Qibrisê di destpêka salên 1980yî de, di 15/11/1980yî de hat damezirandin. Tirkîye li cem Neteweyên Yekgirtî, Konseya Ewropî, Yekitîya Ewropî, Rêxistina Ewlekarî û Hevkarîyê ya Ewropî, Konferansa Îslamê, Rêxistina Pêşketinê ya Îslamî ji bo Komara Tirk a Bakurê Qibrisê doza çi dike, çi diparêze? Dema ku mafên 20 mîlyon kurdan dibe mijar, çima parçeyekî piçûk a tiştên ku ji bo Qibrisê tên xwestin, ji bo kurdan re nayên xwestin? Heger meriv li ser palpiştên zengîn ên faktumî ên vê mijarê hûr bibe, dê gelek mijaran ron bike.

A sêyem girîng e ku mirov li ser sîyaseta Filîstîn a Tirkîyeyê hûr bibe. Tirkîye li cem Konferansa Îslamê, Yekitîya ´Ereban, Neteweyên Yekgirtî û platformên din ên navneteweyî ji bo filistînîyan doza çi dike? Çima dema ku kurd dibin mijar her tim qedexe, xetên sor tên zimên? Hûrbûna li ser van her sê modelan dê zanîna me ya li ser pirsgirêka kurdî jî zêde bike.

Di vê navê re, serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan li Almanyayê got "bişavtin sûcekî li dij mirovahîyê ye" lê belê li Tirkîyeyê got "Bila tu kes ji me doza perwerdehîya zimanê dayîkê neke". Divê ev nakokî her tim were zimên. Li vê derê him di warê şêwaz, him di warê naverok û him jî di warê nihêrîna însanî de nakokî hene. Jê wêdetir, Almanya ne welatê tirkan e. Lê belê kurd ji mêj ve li ser xaka xwe dijîn.

Di 18-19/12/2010ê de di Kongreya Civaka Demokratîk de reşnivîsek hat aşkere kirin. Ev "Projeya Kurdistana Xweser a Demokratîk" e. A ku di çapemenîyê tê niqaş kirin jî ev proje ye. Di vê projeyê di heşt mijarên wekî aborî, sîyasî, civakî, çandî, huqûqî, xwe-parastin, ekolojî û dîplomasîya xweserî tên rêz kirin. Lê belê di vê projeyê de bêyî ku navê federasyonê were bi lêv kirin federasyon tê tarîf kirin. Xweserîya Demokratîk têgiheke nedîyar e. Projeya Kurdistana Xweser, li gor xweserîya demokratîk dîyartir e, aşkeretir e.

1 Metnên Destûra Tirk, "Ji Sened-I Ittifak heta roja îro" Amadekar: Suna Kili- Şeref Gözübüyük, Weşanên Iş Bankası, Ankara 1985, r. 91 û dumahîk. r. 103

2 Binihêrin. www.zazaki.net, Em gotina kurd û zaza protesto dikin, Ev daxuyanî ku di 20ê kanûna 2010ê de di zazaki.net de hatîye weşandin û ji alîyê 20 rewşenbîrên kurd ve hatîye îmze kirin. Herweha binihêrin: Seyîdxan Kurij, Dîroka Edebîyata Zazakî I, II, III, kurdistanaktuel, 20ê kanûn 2010an

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

# Rista agahdarbûna ji rastîyên dîrokî yên Dêrsimê li ser çareserkirina pirsgirêkên îro

PROF. DR. AHMET ÖZER *

Da ku mirov Komkujîya Dêrsimê fêm bike, ku di salên 1937-38ê de pêk hatibû, divê mirov li bûyerên sala 1925ê binihêre. Bêyî ku ew serdem were fêm kirin, Dêrsim nikare were fêm kirin. Operasyona Dêrsimê, wekî parçeyeke pirsgirêka kurdî, bûyerek e ku ji wê demê de hatibû plan kirin.

Wekî tê zanîn sozên ku di dawîya Têkoşîna Neteweyî [Milli Mücadele] de hatibûn dayîn, piştî avabûna Komarê nehatin bicihanîn, û lewra jî di sala 1925ê de serhildana Şêx Seîd dest pê kir.

Gelo ev soz çi bûn, kengî û ji alîyê kê ve çawa hatibûn dayîn? Pêşîyê em li van binihêrin û paşê jî li Şêx Seîd û li wan bûyerên ku piştî wî pêk hatibûn û li damezirênerên wan siyasetan binihêrin, yên ku di dawîya sedsala 20ê de li ser pirsgirêka kurdî, îdeolojîya fermî dîyar kiribûn.

Wekî ku tê zanîn, di 19ê gulana 1919ê de Mustafa Kemal bi haydarîya Îngîlîzan, bi peywirdarkirina padîşah çû Samsûnê. M. Kemalê ku di wê demê de nexweşîya gurçikan pê re hebû, ji wê derê pêşî derbasî Havzayê û paşê jî derbasî Amasyayê dibe û li wê derê bîna xwe vedide. Ji wir jî diçe Rojhilatê. Ji bo M. Kemal her ku diçe pêvajoyeke nû dest pê dike û ew ji hukûmeta Stenbolê dûr dikeve.

M. Kemal di navbera 23ê tîrmeh û 7ê tebaxa 1919ê de Kongreya Erziromê li dar dixe. Di vê kongreyê de, ji ber ku M. Kemal ne nûner (delege) bû, nûnerekî kurd ê Bazîdî tê vekişandin da ku M. Kemal bikaribe di şûna wî de bibe nûner. Her çend nûnerên Îttîhadî û Laz li dij derdikevin jî bi piştgirîya nûnerên kurd M. Kemal wekî serokê kongreyê tê hilbijartin. Hilbijartina wî wekî serokê vê kongreyê ji bo M. Kemal fetiloka pêşîn a riya serokatîya Têkoşîna Neteweyî ye.

Di navbera 4-12 îlonê 1919ê de Kongreya Sêwazê bi rê ve diçe: Mebesta vê kongreyê ew e ku du komeleyên Anatolya û Rûmelîyê (ku berê ji alîyê Komeleya Îttîhad Teraqqîyê ve hatibûn bi rê xistin) di bin navê Komeleya Berevanîya Huqûqê ya Anatolya û Rûmelîyê [Anadolu ve Rumeli Müdafa-i Hukuk Cemîyeti] de werin yekkirin û hilbijartina desteya nûneran e. Ev yek pêk tên. M. Kemal paşê diçe Amasyayê da ku digel delegasyona Osmanî, ku ji Stenbolê tê, hevdîtinê pêk bîne.

Di 18/10/1919ê de diçin Amasyayê û dawîyê ew pêvajoya ku tê zanîn bi rê ve diçe û Têkoşîna Neteweyî bi alîkarîya kurdan bi ser dikeve.
M. Kemal, ku serokekî gelek pragmatîst (berjewendîperest) bû, ji ber peywirên xwe yên berê yên li Rojhilatê, kurd nemaze jî axa û mîrên wan gelek baş nas dikirin. Wî bi gotinên "Ol ji destê me diçe, Xelîfe efendî di tengasîyê de ye, heger em tênekoşin dê him ol ji dest here û him jî Ermenî dê paş de werin" hewlê dide ku kurdan tev li têkoşînê bike û di vî warî de bi ser jî dikeve.

Ji vê demê heta 29/10/1923an M. Kemalekî weha li ser dika dîrokê ye ku mafê kurdan nas dike, soza xweserîyê dide wan, digel navê tirkan navê kurdan jî bi lêv dike, peyvên *Kurd û Kurdistanê* jî gelek caran bi kar tîne.

Pêşveçûn û sozên vê serdemê yên sebaret bi kurdan weha ne:

1) Di 20-22/10/1919ê de Protokolên Amasyayê tên îmzekirin: Di madeyên têkildar ên van protokolan de, ku di navbera heyeta Osmanî ya ji Stenbolê û heyeta li jêr serokatîya M. Kemal a ji Enqereyê, hatibûn îmzekirin, meseleya xweserîya kurdan tê naskirin. Ev protokol di demên dahatû de tên sansur kirin.

2) Destûra 1921ê bi awayekî gelek demokratîk xweserîya birêvebirîyên herêmî nas dike da ku xwe wekî şûrayan bên bi rê ve birin.

3) Di 22/07/1922ê de M. Kemal di nameya xwe de, ku ji fermandarê El Cezîreyê re nivîsîye, dibêje ku 'lîva û her weha kurd dikarin xwe bi awayekî xweser bi rê ve bibin.

4) Di 16-17/12/1923ê de M. Kemal axaftina xwe ya navdar a Îzmîtê dike. Li vê derê li ser pirsa Ahmet Emin Yalaman ku dipirse "Paşayê min, pirsgirêka kurdî dê çawa were çareserkirin" M. Kemal dîyar dike ku pirsgirêk dê bi cureyekî xweserîyê were çareser kirin.

5) Ev pêşveçûn û gotin hemû dikarin ji wan axaftin û mulahezeyan werin dîtin, ku ji Kursîya Yekemîn a Meclîsê hatine kirin.

Dawîya dawî di 24/07/1923ê de Peymana Lozanê tê mohr kirin. Îsmet Înönü li Lozanê îddîa dike ku ew ne tenê nûnerê tirkan her weha yê kurdan e jî û wekî ispata vê yekê telgrafên eşraf, axa û şêxên kurd yên ku ji Lozanê re hatibûn şandin, nîşan dide.

Sê bûyer, ku paşê rû dan, nîşan didin ku sozên ku ji kurdan re hatine dayîn nayên/dê neyên bi cih anîn. Nemaze ev sê bûyer, ku li dû hev pêk tên, li cem kurdan wê hestê peyda dike ku ew hatine xapandin û ev yek jî dibe sedema serhildanên kurdan. Ev bûyer;

a) Ragihandina Komarê, 23/10/1923: Kurd di damezirandina Komarê de tu tiştî ji bo xwe nabînin.

b) Rakirina Xîlafetê, 03/03/1924: Her çend xîlafet di navbera tirkan û kurdan de (Sunnî) yekta pevgirêdan e, ev têkilî jî ji holê radibe.

c) Madeya 88an a Destûra 1924ê: Di destpêka Destûra 1924ê de, ku li ber Peymana Lozanê hatibû amadekirin, ne ku tu mafên kurdan cih nagirin lê her weha kurd wekî tirk tên hesibandin û hebûna wan tê înkar û redkirin. (Madeya 88an a Destûra 1924ê: "Hemû ehlên Tirkîyeyê, di warê hevwelatîyê de bêyî ku cudahîya ol û nîjadê hebe wekî tirk tên itlakkirin")

Wekî encama van bûyeran di 13ê gulana 1925ê de Serhildana Şêx Seîd dest pê kir. Serhildan wekî hincet hat nîşandan û sê biryar hatin birêvebirin ku bandor li ser paşeroja kurdan kir.

1) Qanûna Taqrîrî Sukûn hat derxistin.

2) Li Rojhilat (Dîyarbekir) û Rojavayê Dadgehên Azadîyê [Mahkemeyên Îstîqlalê] yên Şerq/Xerb hatin damezirandin.

3) Plana Islahatê ya Şerqê hat çêkirin.

Digel vê sêpêyê di heman demê de tevgereke xwîndar a tepisandinê jî pêk hat, gelek kes hatin darvekirin, mişextkirin û rû bi rûyî îskanên mecbûrî man.

*Bi **Qanûna Taqrîrî Sukûn:*** Herkes hat huşkirin û çewisandin, ji bo çapemenîyê nivîsandina li ser bûyeran hat qedexe kirin, an jî di esasê de wekî daxwaza rayedaran nivîsandin. Bi Mahkemeyên Îstîqlalê yên Şerqê di encama darizandineke mostere (rîyalî) ya li Dîyarbekirê de li Şêx Seîd û 46 şeş hevalên wî cezayê îdamê hat birîn û di 29ê hezîrana 1925ê de hukum bêyî ku here îstînafê hate înfazkirin.

***Bi Plana Islahatê ya Şerqê:*** Rayedaran dixwest ku sê armancan bi cih bînin. Ev armanc paşê bûn armancên Komarê ku dixwest ji împaratorîya pir-zimanî, pir-çandî, pir-olî û pir-etnîsiteyî, netewe-dewleteke monîst û homojen ava bike: Ew armancên ku rayedaran dixwest ku di çarçoveya projeyeke endezyarîya civakî de pêk bînin, ev bûn.

1) Tirkkirina kurdan
2) Sunnîkirina elewîyan
3) Terbîyekirina sunnîyan bi darê sekularîzmê.

Rejîmê da ku van sê armancan pêk bîne digel hemû retorîkên nîjadperest navgînên îdeolojîk jî (Teorîya Zimanî ya Rojê, Teza Dîrokê ya Tirk û hwd.) bi kar anîn; di wan rewşan de ku ev navgîn têrê nekirin, navgînên leşkerî (artêş û operasyonên leşkerî) hatin bi kar anîn.

Di mehên hezîran, tîrmeh û tebaxê yên 1930î de sê bûyerên ku li dû hev pêk hatin di warê nîşandana liv û bizavên erkanê mulkî û leşkerî yên ji bo pêkanîna van mebestan balkêş in.
- Bi Qanûna hejmar 1850 ya 20ê hezîrana 1930î sûcdarên li herêma Rojhilatê ji hemû cezayan muaf hatin hiştin. Bi vê qanûnê mirov digot qey "ji artêşê re agir serbest, kuştin mubah e" dihat gotin û serbestîya kuştin û sûckirinê dihat anîn.

- Di 6ê tîrmeha 1930î de Rojnameya Cumhurîyetê qetilkirina 15 hezar kesan wekî mizgînîyekê radigihand "Gelîyê Zîlan tije term e".

- Di 31ê tebaxa 1930î de Wezîrê Dadê Mahmut Esat Bozkurt li Ödemîşê weha diqêrîya: "Li vî welatî efendîyên yekta Tirk in, mafê kurdan bi tenê xulambûn e, divê hemû cîhan bi vê yekê weha zanibe."

Dema ev tişt pêk dihatin, Atatürk di sala 1935ê de Îsmet Înönü şand Rojhilatê da ku encamên Plana Islahatê ya 1925ê di cih de bibîne. Piştî ku Înönü li tevahîya herêmê gerîya rapora xwe ya navdar "Rapora Şerqê" di meha tebaxê ya 1935ê de pêşkeşî Atatürk kir. Ev rapor di heman demê de raporeke giring bû ku çarenûsa Dêrsimê jî dîyar dikir. Raporê bi gelemperî bi du rêyan xerabkirina avabûna demografîk a kurdan ji xwe re dikir armanc. Him bi koçkirinên ji derveyî herêmê û him jî bi koçkirina kurdan ber bi Rojavayê dê demografîya herêmê bihata xerab kirin. Her weha azîne û rêbazên bicihanîna sîyaseta tirkkirinê dihat tarîf kirin, ku wê jî xwe dispart asîmîlasyonê. Di beşê encamê ya raporê de jî dihat nivîsandin ka meseleya Dêrsimê dê çawa bihataya çareser kirin.

Hin pêşnîyarên gelemperî yên vê raporê yên li ser herêmê weha bûn: Da ku bandora kurdan were kêm kirin, divê ji herêma Deryaya Reş muhacir bînin herêmê... Bajarên tirkan û kurdan divê bi awayên cuda xizmetê werbigirin... Divê pêşî li kurdan were girtin ku li gundên valakirî yên ermenîyan bi cih nebin...Kurd divê werin bişaftin... û hwd.

Meseleya Dêrsimê ku di dawîya raporê de wekî beşekî serbixwe cih digirt, çareserîya bi darê zorê weha pêşnîyar dikir (tiştên ku paşê hatin kirin nîşan dide ku rapora Înönü ji bo operasyona Dêrsimê bûye bingeh): Em ê di çarçoveya bernameyekê de dest bi islahkirina Dêrsimê bikin. Ev yek dê weha bibe:

1) Amadeyî,
2) Bêçekkirin,
3) Îskan.

Fermandarê muwazzaf ê Kolorduyê dê bibe Walîyê bajêr... Zabitên muwazzaf dê bibin qeymaqamên navçeyan... Înfazên heta îdamê dê li wîlayetê pêk werin... Di sala 1936ê de dê (rê û) qereqol werin avakirin... Di sala 1937ê de hêzên çekdar dê bibin fermandarên wîlayetan... Dêrsim dê bi lezgînî were bêçekkirin...
Paşê, ji bilî rapora Celal Bayarê wekîlê aborîyê, du raporên din jî dê bihatana pêşkeş kirin. Yek ji wan, rapora mufettîşê mulkîyeyê Hamdî Beg e. Ev rapor di esasa xwe de weha dibêje: *"Dêrsim serê kûnêrê ye, divê bi giştî were paqij kirin."* A din jî rapora Sererkanîya Giştî ye (Genel Kurmay). Di vê raporê de weha dihat gotin: *"Dêrsim nikare bi firikandinê were bi dest xistin. Têkoşîna hêza çekan dikare bêhtir bandorê li ser Dêrsimê bike. Divê kurdîtî di nav ehlê tirk de were helandin, paşê bigihîje huqûqa bingehîn a tirk."*

Di encama van raporan de;

Di meha 12 a 1935ê de *Qanûna Tunceli*yê hat derxistin, navê Dêrsimê wekî "Tunç-eli" [Devera Tûncê] hat guhertin.

Di çileya 1936ê de 4emîn Walîtîya Giştî hat damezirandin ku navenda wê Elazîz bû û Tunceli jî bi ser vê walîtîyê ve bû. (Bajarên din ên bi ser vê walîtîya giştî: Bingol, Erzincan, Sêwaz, Meletî, Erzirom û Gümüşhane)

Zavayê Sakallı Nurettin Paşa, Korgeneral Abdullah Alpdoğan wekî walîyê herêmê hat tayîn kirin, ku ji ber tevkujîyên ku encam dabûn navê fatîhê Koçgirîyê lê hatibû danîn. Dû re Tuncelî wekî herêma qedexe hat ragihandin.

Di 18ê hezîrana 1937ê de Desteya Wezîran, Duyemîn Plana Islahatê ya Dêrsimê amade kir.

Di 20ê îlona 1937ê de Înönü ji kar hat girtin û di şûna wî de Celal Bayar wekî serokwezîr hat tayîn kirin. Ji bo budçeyê 1 mîlyon lîra hat terxan kirin. Ji bo "islahkirina" Dêrsimê artêşek hat wezîfedar kirin ku ji 50 hezar leşkeran û ji fîloyeke 40 firokeyê şerî pêk dihat.

Fîloya firokeyên şerî ku ji baregeha Dîyarbekirê rabûn, dest bi bombebarana Dêrsimê kir, ku di nav wan de zirkeça Atatürk, Sabiha Gökçen jî hebû. Artêş jî rabû û qetilkirin û komkujîyan dest pê kir. Her çend peymana Lahey a 1889ê qedexe dikir ku artêş gazên jehrî bi kar bînin, Çağlayangil di bîrhatinên xwe de weha digot: *"Artêşê gaza jehrî bi kar anî. Ev kes di şikeftan de wekî mişkan hatin jehrî kirin."* Bi vî awayî Dêrsim bû şahida wê komkujîyê ku bi hejmar û awayê pêkhatina xwe komkujîya herî mezin a dîroka Tirkîyeyê ye.

Ev komkujî xwedî du hêlan e:

***Komkujîya Sor:*** Li gor daneyên fermî 13 hezar û 160 kes, li gor daneyên nefermî jî 40-60 hezar kes hatin qetilkirin. Li gor Dêrsimîyan jî 70 hezar kes hatin qetilkirin.

***Komkujîya Sipî:*** Ev yek jî xwedîyê sê alîyan e:

a) 7-12 hezar kes (li gor hinekan 10-12 hezar) ber bi Rojavayê hatin mişextkirin û tûşî îskana mecbûrî bûn.

b) Ên ku hatibûn mişextkirin bi sîyaseta "serê gundekî malbatek" bi lezgînî tûşî bişavtinê bûn.

c) Keçikên ciwan û yên din ji hawîrdora xwe hatin veqetandin û wekî "nifşên dildarên celadên xwe" hatin mezin kirin.

d) Erdê vê cografyayê wekî "herêma qedexe" hat ragihandin. Ev qedexekirin her çend di sala 1947ê de bi awayekî qismî hatibe rakirin jî wê heta 1950ê dom kir.

e) Piştî rabûna qedexeyê ji ber tirsê tu kesî nexwest vegere, ên ku vegerîyan jî ji ber dîmen û reftara ku pê re rû

bi rû mabûn, nikaribûn bidebirin, vegerîyan cihên berê.

Bi Qanûna Îskanê ji parêzgehên wekî Dersim, Erzirom, Bedlîs, Sêrd, Wan, Bingol, Dîyarbekir, Agirî, Mûş, Erzirom, Elezîz, Qers, Meletî û Mêrdînê ji 5 hezar û 74 malan 25 hezar û 831 kes (ku nîvê wan ji Dêrsimê bûn) ber bi Rojavayê ve hatin mişext kirin. Piştî qirkirina herî mezin a dîroka Tirkîyeyê ya 1937/38ê, Desteya Wezîran di 6ê tebaxa 1938ê de bi biryarekê ji Dêrsimê ji 1246 malan 5 hezar kes li gor "serê gundekî malbatek" bi darê zorê li 922 gundên 15 nahîyeyên 15 parêzgehan bi cih kirin.

Wekî mînak, 158 malbat li 161 gundên Denîzlîyê, 100 mal li 100 gundên Aydinê, 100 mal li 50 gundên Bîlecîkê, 200 mal li 100 gundên Bursayê, 104 mal li 77 gundên Balikesîrê, 20 mal li 20 gundên Ispartayê, 24 malbat li 23 gundên Kutahyayê, 62 kes li navend û du navçeyên Burdurê, 28 mal li 28 gundên Muglayê, 50 mal li 50 gundên Eskîşehîrê, 150 mal li 150 gundên Çanakkaleyê, 50 mal li 50 gundên Edîrneyê, 75 mal li 75 gundên Tekîrdagê û 300 mal li Zonguldakê hatin bi cih kirin. (Aygün, 2010) Di sala 1947ê de bi qanûna hejmar 5098 îskana mecbûrî hat rakirin, lê belê qedexeyan heta sala 1950yî berdewam kir. Weha hatibû xwestin ku Dêrsimê bin ax bikin, da ku careke din veneje. Ji xwe Înönü piştî vê bûyerê weha gotibû: *"Me xwe ji pirsgirêka Dêrsimê bi giştî pak kir."*

**Encam:** Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê, dema ku bi armanca ji holêrakirina komên cuda polîtîkaya yek netewe, yek ziman, yek mezhep hat bi rê ve birin, ên ku di vê polîtîkayê bi cih nedibûn kurd bûn. Di wan salan de desthilatdarîya navendî pêşî li Koçgirîyê, paşê jî li Pîran û Gelîyê Zîlan kurd qetilkirin.

Dêrsimê, xweserîya xwe ya herêmî ya kurd û qizilbaşî, ku Osmanîyan bi çendîn seferan nikaribûn têk bibin, heta dawîya salên 1930î berdewam kir. Lê belê desteya wezîran roja 4ê gulana 1937ê li Enqereyê civîya û li dij Dêrsimê, ku navê wê bi qanûnê guhertibû û kiribû 'Tunceli û ew wekî 'serê kunêrê bi nav dikir, artêş xist nav tevgerê. Bi vî awayî bi fermana qirkirinê, ku mohra 'gelek nepenî ye lê bû, kurdên Dêrsimê tûşî tenkîl, tehcîr û tedîpê bûn. Di serî de Seyîd Riza û kurê wî bi dehan serokên tevgerê hatin darvekirin. Şûna gora Seyîd Riza û yên ku pê re hatibûn darvekirin, nehat gotin.

Kurdên Dêrsimê ji ber nasname, ziman, çand û bawerîyên xwe tûşî komkujîyeke sîstemtîk a plankirî û bişavtineke bêrehim bûn, herweha navên erdnîgarî jî hatin guhertin. Lê belê digel van hemûyan, her çend zext û çewsandinên demkî wekî serkeftî xuya bikin jî aşkere ye ku di dema dûr û dirêj de ev azîne bi fîyaskoyê bi encam bûne. Dijberî vê yekê, ev azîn û rêbaz pirsgirêk çareser nekirine lê belê bûne sedem ku pirsgirêk her ku biçe mezintir bibe û bigihîje roja îro.

Nexwe divê îro çi bê kirin:

1. Divê bi dîrokê re rû bi rû bibin, tabû werin rakirin û rastî werin aşkere kirin. (Arşîvên Dêrsimê divê bi temamî ji lêkolîneran re were vekirin.)

2. Divê êdî were dîtin ku azîneyên leşkerî nikarin encamê bistînin û divê dev ji vê azîneyê were berdan.

3. Her çend ji ser komkujîyên Dêrsimê yên 1937-38ê 72 sal derbas bûne, dewlet hîna jî bi awayekî fermî berpirsîyartîyê hilnagire ser xwe, wekî hemû komkujîyên din bi vê komkujîyê re jî rû bi rû nabe. Divê ev rûbirûhatin were pêk anîn, dewlet lêborîna xwe ji Dêrsimê bixwaze û cihê gora Seyîd Riza xuya bike.

4. Komara Tirkîyeyê divê dev ji polîtikaya xwe ya 'yek ziman, yek netewe û yek mezheb berde.

5. Dema ku Tirkîye planê dike ku li ser çemekî piçûk ê wekî Mûnzûrê 20 bendavan ava bike, dixwaze kurdên Dêrsimê ji kokên wan ên civakî veqetîne û wan di nav polîtîkaya 'yekê de bihelîne. Divê dev ji vê yekê were berdan.

6. Pirsgirêka kurdî di vê merheleya gihaştî de bêyî ku bibe derengî di nav demokrasîyê de li ser bingehên yeksanî, azadî û dadperwerîyê were çareser kirin.

7. Da ku ev yek pêk were divê bi "formulasyona 4+4 (nîyet, empatî, zimanê aştîyê, xwe rizgarkirina ji paranoya parçebûnê) bingehê psîkolojîk a meseleyê were ava kirin, paşê jî gavên mayînde yên berbiçav (destûreke nû, perwerdehîya bi zimanê dayîkê, efûya giştî, berfirehkirina destûrnameyên rêvebirîyên herêmî-adem-î temerkkuz) werin avêtin.

* Sosyolog, li zanîngeha S.Demirel

## Çavkanî:


Aker, Tamer; Ayata, Bilgin; Özeren, Melih; Buran, Behice ve Bay, Ayşenur. (2002). "Zorunlu İç Göç: Ruhsal ve Toplumsal Sonuçları"[Koçberîya bi dare zorê û encamên wê yên dêrûnî û civakî], **Anadolu Psikîyatri Dergisi [Kovara Dêrûnîyê ya Anadolu]**, Hejmar: 3, r. 97-103

Akpınar, Alişan; Bilir, Sezer; Bozkurt, Serhat ve Dinç. N. Kemal. (2010). II. Abdülhamit Dönemi Raporlarında 'Dersim Sorunuve Zihinsel Devamlılık [Di raporên serdema Abdu´lhemîdê Duyemîn de 'Pirsgirêka Dersimê û domdarîya zihnî], **Herkesin Bildiği Sır: Dersim** (iç.), Berhevkar: Şükrü Aslan, İletişim Yayınları, İstanbul, r. 311-334

Aslan, Şükrü. (2010). "Genel Nüfus Sayımlarına Göre Dersimde 'Kayıp Nüfus: 1927-1955", **Herkesin Bildiği Sır: Dersim [Sira ku herkes pê dizane: Dêrsim]** (iç.), Berhevkar: Şükrü Aslan, Weşanên İletişim, İstanbul, r. 397-412

Aygün, Hüseyin. (2010). **Dersim 1938 ve Zorunlu İskan[Dêrsim 1938 û Îskana bi zorê]**, Weşanên Dipnot, Ankara

Bal, Hüseyin. (2008). **Kent Sosyolojisi [Psîkolojîya Bajêr]**, Pirtûkxaneya Fakülte, Isparta

Çalışlar, İzzeddin. 2010. **Dersim Raporu [Rapora Dêrsimê]**, Weşanên İletişim, İstanbul, Güler, Müzeyyen. (2007). "Kulu Ovasından İskandinav Fîyordlarına Göç" **[Koça ji deşta Kuluyê ber bi Delavên Îskandinavyayê ]**, Sosyoloji Araştırmaları Dergisi **[Kovara Lêkolînên Civaknasîyê]**, r. 118-143

Hepkon, Zeliha. 2010. "İktidarın Gör Dediği: 1935 yılı Türk Basınında Tunceli Kanunu", **[Tiştê ku desthilatdarî dibêje bibîne: Di çapemenîya Tirk a 1935ê de Qanûna Tuncelîyê] [Sira ku herkes pê dizane: Dêrsim]** (iç.), Berhevkar: Şükrü Aslan, Weşanên İletişim, İstanbul, r. 373-396

Saltık, Hasan. **Sabah Gazetesi [Rojnameya Sabahê]**, 19ê Sermawezê 2009an

Sır, Aytekin; Bayram, Yener ve Özkan, Mustafa. (1998). "Zoraki İç Göçün Ruh Sağlığına Etkileri Üzerine Bir Ön Çalışma" **[Pêşxebatek sebaret bi bandorên koçberîya navxweyî ya bi zorê li ser tendurustîya dêrûnî], Klinik Psikîyatri**, Hejmar: 2, r. 83-88

Uluğ, Naşit Hakkı. (2009). **Derebeyi ve Dersim [Mîrîtî û Dêrsim]**, Weşanên Kaynak, İstanbul

Yalçın, Cemal. (2002). "Çokkültürcülük Bağlamında Türkîyeden Batı Avrupa Ülkelerine Göç" **[Di warê pirçandî de koçberîya ji Tirkîyeyê ber bi Welatên Ewropî ve], C.Ü. Sosyal Bilimler Dergisi [Kovara Zanistên Civakî ya C.Ü]**, Cîld: 26, No: 1, r. 45-60

Yüksel, Murat. (2010). "Ulus-Devletin Dersimle Teması" **[Temasa Netewe-dewletê bi Dêrsimê re], Herkesin Bildiği Sır: Dersim** (iç.) **[Sira ku herkes pê dizane: Dêrsim]** (iç.), Berhevkar: Şükrü Aslan, Weşanên İletişim, İstanbul, r. 357-371


Wergera ji tirkî: Celîl Kaya



RODI KHALIL: **Reng û buhuşt II**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 60 x 60 cm

## Dosya: Rastgirên radîkal yên Ewropayê

Di du salên dawiyê de, rasta radîkal li ser hev yan hindik mabû ji pîvana % 10'an bibihure yan jî jê bihurt, heta li gelek welatên ewrûpî di hilbijartineke neteweyî de ji % 15'ê dengan bêhtir stend, mîna li Belçkayê (%17.1), Bulgarîstanê (% 12), Franse (% 10), Macarîstan (% 14.8), Holanda (% 17) yan jî Norwêc (% 22.9). Li Îtalyayê, li cihê ku Hevgirtina Neteweyî navika xwe birî da ku di nav rasta klasîk de bi cih bibe, Lîga Bakur a cudaxwaz li Lombardî, wilayeta Venedîkê û Piyêmonte desthilatdar in (Raffaele Laudani û Laurent Bonelli bixwîne, rûpel 8). Li Swîsreyê Yekîtiya Demokratîk a navendê, salek piştî qedexekirina mînareyan, ji % 53'yê hilbijêran razî kir daku tevahiya ew koçberên ku "alîkariya civakî" xirab bikaranîne û ji ber "gunehekî" hukim li wan hatîye birîn, werin dersînorkirin... Di her hal û karî de ti bloka homojen nîn e. Li Rojhilat, rasta radîkal mîratxwirê dîrokeke dirêj û taybet e (Michael Minkenberg bixwîne, rûpel 7). Li Rojava, neofaşîstên ji rêûresmê li getoyên xwe bûne pepûk û gevizîne. Li hemberî vê, partiyên dij-sîstemê yên ku dixwazin rêz ji wan re were girtin, û herweha yên nûpeydabûyî yên ku em dikarin navê UFO li wan bikin – yên mîna Partiya Azadiyê ya holandî (Rinke Van den Brink bixwîne, rûpel 9)-, rewşa wan baş e, felekê ji wan re li hev aniye. Hîmê karûbarê wan xwe nû dike, hemin bi nakokiyan, belê du xalên hevbeş jî hene: bikaranîna krîza civakî û redkirina misilmanan (nivîsa li jêr bixwîne). Marine Le Pen a hêvî dike destpêka çile, li şûna bavê xwe bibe seroka Bereya Neteweyî, têra xwe ev herdu mijar bi pêş xistin.

### Rastên radîkal êrîş dikin

# Li Ewropayê, lîstika sê malbatan

Dominique Vidal *

Hemin rasta tundrew êdî ya berê nîne. Kulta şovenîst a "zilamê xurt"? Bêguman wê rojekê jinek bibe seroka Bereya Neteweyî (FN), rast e ku ew keça damezrênerê wê ye jî... Papa Benedict ê XVI. dêr û tundrewên dînî li hev tîne? Sazîyên ku demeke dirêj xwe dispartin exlaqê xrîstîyanîyê mafên homoseksuelan diparêzin û li ser serê wan birêvebirên ku xwe weke nêremo nîşan didin, hene... Çi bi rêbiwarîya li gorî rêûresmê ya li beramberî dij-semîtîzmê û înkarkerîyê hat? Piranîya tevgerên rasta tundrew êdî destekeke hemin didin hikûmeta heyî ya Îsraîlê, pêşengîya Rojavayê.

Sedema wê jî dîyar e: aşkerekirina "dagirkerîya misilman" vediguhere çîmentoya sereke ya yekkirina sazîyên ku wekî din li ser mijarên globalbûn, dewlet-netewe, Ewropa, proteksîyonîzm (nota wergêr: sîyaseta parastina bazirganîyê), *Welfare State* (nota wergêr: dewleta civakî), xizmetên gelemperîyê, têkilîyên bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re ... li hev nakin. Ji hingê ve gelo em dikarin behsa "*rasta tundrew a nû ya ewropî*" bikin? Çavdêrên herî baş – çawa ku dibêjin, cezwît jî dikin– bi pirsekê bersivê didin: gelo her yek bi şertên xwe ne xefkek in?

Gelo ev bizav "nû" ne? Profesorê zanista siyasetê li Zanîngeha Bolonyayê Piero Ignazi (1) bawerîyê dide û dibêje "*Ji bilî Partîya (holandî) ji bo Azadîyê (PVV) ya Geert Wilders, yên din hemû pêkhatinên kevin ên rasta tundrew in. Tevgera siyasî ya wan partîyan ku hewl didin bi rêzdarbûyînê bikevin nav pergalê, li rêûresma nûfaşîst dikeve ku ya wan bixwe ye. (2)*" Orjînalîteya bi rastî ji paradîgmayên serdemê tê: jiholêrabûna dijminê komunîst, yê ku ji 11ê îlonê ve dijminê îslamî –heta bi serê xwe misilman– ketîye şûna wî.

Weke vegereke ber bi filozofê alman Oswald Spengler ve, ku pirtûka wî *Jihevketina Rojavayê* (3) salên 1918ê û 1922ê hate weşandin, çekên entelektuel dide dest şagirtên dîktator ên li dijî Komara Weimar. Bi tenê hêza rêjeya dengan a van mîratgirên ji dûr ve yên hêzên tarî ber bi rasta qada sîyasî ya ewropî ve dişemite, tu hêza din a alternatîf ji krîza hegemonîya kapîtalîzma fînansê sûdê wernagire.

Heta bi binavkirina "rasta tundrew" jî lêkolînerê Înstîtûta Têkilîyên Navneteweyî û Stratejîk (IRIS) sîyasetnasê Jean-Yves Camus (4) aciz dike. Ew tercîh dike van pêkhatinan weha bi nav bike "*tundrew, dijminê bîyanîyan û gelperest*". Gelo ev rengdêra dawîyê bi her fersendê bi kar neyînin? Camus weha dewam dike "*Ez jî pê xweş nînim, bi tenê heke em wê weke meyla li şûna demokrasîya bi nûnerîyê, bicihkirina demokrasîya yekser tarîf bikin, 'hîsa rast a gel wê timî li hemberî elîtên hemin jirêderketî mafdar be*". Li hemberî vê, Eric Woerthê dîyar ê ku qanûna teqawitbûnê reforme kir, ji xwe razî dibêje "*rojek wê bê ku hûn ê malavahîya me bikin* (5)": gelo %70yê fransîyan yên li ber vê reformê rabûn tev de wê ehmeq bin? Sîyazetnasê Camus digihîje vê encamê "*Elîtperestî û gelperestî birayên hev ên cêwî ne*".

Camus van birêveberên bi carekê mirov nizane ji ku peyda bûn, li ber "UFO"yan digire: Wilhelmus Simon Petrus Fortuijn ê holandî, kevnesosyalîst û homoseksuelê li xwe aşkerekirî û veguherî dijminê îslamê –wî xwe dispart tepisandina hemin rastîn a nêremoyên li Rojhilata Nêzîk û herweha weke yên din binpêkirina mafên jinan-, 6ê gulana 2002ê hat kuştin, ango sêzdeh rojan berîya ku lîsteya wî dengekî zêde (% 17) bistîne; Christoph Blocher ê swîsrî û partîya wî Yekîtîya Demokratîk a Navendê (UDC), partîya kevin a cotkarîyê, bi rengê tundrewbûyî sala 2009ê %29ê dengan bi dest xist; partîya ecêb û xerîb a Fînlandîyên bi Rastî, ecêbeke mutasyonê ya anti-establishment (nota wergêr: dijbera prensîpên li gor rêûresmên serdest yên civakê) û dijberî koçberan a pêkhatineke kevin e ku serokê wê Tîmo Soini niha li Parlemana Ewropayê canbazîya peyvan dike...

Gelo ji bo tarîfkirina rasta radîkal a parzemîna pîr (Ewropa), bikaranîna yekhejmar yan jî pirhejmar baştir e? Ignazi û Camus her du jî behsa "*tevgereke têkilhev*" dikin, ya ku li gor partî, taybetmendîyên dewletan, rêûresmên wan û qada wan a sîyasî, xetên wê diguherin. Ji hingê ve, binavkirina neteweperestîya rast a tundrew weke "ewropî" wê nakokane be, lewma ew li dijî avahîya Robert Schuman û Jean Monnet berîya şêst salan dest pê kirî, timî pir alerjîk bûn.
Bi vê tabloya xwendinê ya weke xercerê, rojnamevan-lêkolîner dikare ya jê re pêwîst ji Rojhilat heta Rojavayê bixwîne û kom bike, da ku tîpolojîyeke ewropî, pragmatîk bi ser hev de bîne, û dema vê dike, sê hêmanên mezin ên wê pêk tînin ji hev derdixe:

- Komên nûfaşîst ên marjînal ên ku zehmetîyê dikişînin xwe ji nostaljîya rîyên reş yan jî qehweyî qut bikin û heta ji yekîneyên SSyê yên ku bavkalên wan di nav wan de şerê "*bolşevîzma cihû*" kiribû jî. Yên herî tîpîk soza "tunekirineke bîyolojîk" didin: republikaner ên alman, Phalange ya spanî, Tevgera Civakî ya Îtalî Agirê Sêreng (MSIFT) yan jî Hişyarkirina Gel a Ortodoks (çawa ku % 98ê yewnanan jî ortodoks in) û hwd;
- Partîyên dijpergalê yên ku ji salên 1990ê û vir ve her yekî bi awayê xwe hewl dide siyaseta lidervehiştinê ya ku pê rasta jê re komarxwaz tê gotin wan tecrîd dike, bişkînin da ku cihekî girîng ji xwe re peyda bikin, bi ser kevin;
- Herî dawîyê, li ser vî erdê "ji mirovên hêjayî rêzdarîyê xalî" derketina holê – sîyaseta di cewherê wê de tirsnakîya valahîyê heye – ya UFOyên li jor behsa wan hate kirin.

Bandora pêkhatinên hêmana pêkhêner a pêşî sînordar bimîne jî (di navbera %0.1 û %7ê de diguhere), partîyên ku bêhtir dikevin nav her du hêmanên pêkhêner ên din, di hilbijartinên ewropî yên 2009ê de yan jî di hilbijartinên din ên berîya demeke kurt de li yanzdeh welatan bi giştî bêhtirî %10ê dengan bi dest xistin: Awûstûrya (%12.7), Belçîka (%10.9), Bulgarîstan (% 12), Danîmarka (%14.8), Fransa (%10), Macarîstan (%16.7), Îtalya (%10.2), Lîtwanya (%12.2), Norwêc (%22.9), Holanda (%17) û Swîsre (%29). Ev lîste pêkhatineke din a mezin li derve dihêle – sedem ev e: Hevgirtina Neteweyî ya Îtalî yekane partî ye ku bi rengekî tundrew navika xwe birî (*li jêr li gotara Laurent Bonelli û Raffaele Laudani binihêre*).

Ji bo Ignazi "*pîvana sereke ew e mirov pê zanibe ka gelo partî dixwaze li derveyî pergalê bimîne – bi hêvîya ku wê birûxîne – yan jî gelo ew dixwaze kursîyan bi dest bixe da ku wê ji hundir ve biguherîne*". Bi şertê ku karibin ango heke "*rasta nerm wan li derve nehêle*". Profesor bi bîr dixe çawa Kombûna Ji bo Komarê (RPR) û Yekîtîya ji bo Demokrasîya Fransî (UDF) di dawîyê de, hemin ne bê êş û jan – ji bilî çend îstîsnayên dengdayî (6) - dev ji hevgirtina bi FNyê re berda. Li gorî Ignazi "*tundrewbûn para bêhtir bi tenê nerazîbûneke ji vê lidervehiştinê ye. Berevajî vê, yên ku dengê xwe nakin û pir tiştan dadiqurtînin jî wisa dikin ji ber pê dizanin ku rast wê wan qebûl bike.*"

Nêzî 770 kîlometroyan li bakur Jorg Haider bawer kiribû ku weke hevpîşeyê xwe yê îtalî, ew ê bikaribe lîstika xwe bi ser bixe, lê belê bêyî ku li nasnameya xwe binihe û tawîzan jê bide. Haider ji 1986ê û vir ve serokê Partîya Awistûryayî ya Azadîyê (FPÖ) bû. Wî helwêsta partîya xwe li dijî hikûmeta Vîyanayê hişktir kir, wî hukûmet gunehbar kir ku di mijara sîyaseta kar û îstîhdamê de sîyaseta wê ji ya Împaretorîya Sêyem (nota wergêr: Almanyaya Nazî) bêkêrtir e! Bi rêjeya dengan a % 27ê nêzî sosyalîstan bû û da pêşîya muhafezekaran – muhafezekarên ku serokê wan Wolfgang Schlüssel mewkî û erk pêşnîyarî hin endamên FPÖyê kiribû. Haider bixwe vekişîya keleha xwe ya lê xurt, eyaleta Kerntenê. Û "serîhildana li bêv" a ku tu çare tê de nîne, sala 2005ê kir ku ew partîya pir nûfaşîst Yekîtîya ji bo Siberoja Awûstûryayê (BZÖ) damezirîne û bi vî rengî rasta tundrew jî kir du parçe – ji sê paran pareke piçûk li wî vegerîya, du parên mezin bi pergalê re bûn yek. Haider 2008ê piştî ku ji klûbeke şevê ya nêremoyan derket û bi serxweşî BMWya xwe ajot, di encama qezayekê de mir.

Saeta ku hewl bide bikeve şûna bavê xwe, weke Haider bi dilê Marine Le Penê ye jî ku weke Fini parkûrekê bi ser bixe, lê belê her weha dilsozê nirxên xwe bimîne – divê mirov ferazî bifikire ku "ji sûretê şeytên rizgarkirina" FNyê wê mumkin be, bêyî ku partîya pîr ji binî ve heta bi navê were guherandin. Lê belê mirov çawa xwe jê vede ku mertalên nostaljîk ên Vichy (nota wergêr: hevgirê nazîyan ê hukûmeta fransî ya demê) û împaratorîya dagirker a "nazdar" hilnede? Talibên din yên di kemînê de ne, bi hêsanî îşaret bi nakokîyên dijberê wê dikin: ji bo Bruno Gollnisch polemîka bi rengekî lihevçêkirî tê mezin kirin ya li ser "dagirkirina" misilman "*heke pêdivî pê hebe, îşaret bi sînorên stratejîya 'ji sûretê şeytên rizgarkirinê" dike. Pergala sîyasî-medyatîk wê nizanibe bi wa'edên em didinê, razî bibe. Ew timî bêhtir dixwazin* (...), *ew ferz dikin ku mirov serê xwe bitewîne, pişt re pişta xwe, paşê jî çok ji wan re deyne erdê* (7)".

Weke yê awistûryayî, ji bo ku dersekê bigire, zêde jîr e: dûrî ku weke wî Waffen SSê weke "*partîya artêşa alman a ku divê mirov rêzê jê re bigire*" bi nav bike (8), ew dixwaze bi temamî rûpelê Şerê Cîhanê yê Duyemîn û provokasyonên li ber dilê bavê wê yên weke binavkirina odeyên gazê mîna "*kitekitên dîrokê*" biqulibîne û bigire.

Ya ji vê jî girîngtir: ew qet dudilî nîne ku bi rengekî civakî ji karkeran re bipeyive. FNyê têra xwe dengên karkeran girtin, lewra bi dorê çepê û paşê sarkozîsmê hêvîyên wan li ber avê berdan. Weke Le Penê ku 1ê gulana 2010ê ji bîr kir ku berê ew ultralîberal bû û berdevkê fikrên Ronald Reagan bû, bi carekê hêza kiryarîyê, parastina civakî û teqawitbûyîyan parastin – da ku "*berxwarinê ji nû ve bide dest pê kirin û bi ser rîya mezinbûna aborî ve bibin*", bi tenê ev mezinbûna aborî dikare mumkin bike ku "*ji herkesî re û ji her tiştî re karek were peydakirin* (9)". Û wî doza parastina sînorên aborî, reformeke adil a bacê, piştgirîya cotkarîyê û herweha ya şîrket an pîşesazîyên piçûk û navîn (PME-PMI), û hwd. kir. Encama bêv bi rengê bernameyê ji bo keça wî: "*ji deh salan û vir ve, parvekirin bi awayekî ku bi kêrî sermayeya fînansî were, diberide.* […] *Mirov li vê tedbîrên betalkirina vegerandina pereyan ji alîyê sîgortayan ve, bi tedbîrên pergala franşîzan di mijara tenduristîyê de û daxwaza guherandina pergala teqawitbûnê zêde bike, hingê ev tercîhkirina rîyeke ultralîberal e ku bi awayekî hişk bi doz û rêûresmên welatê me re li hev nake û nakok e.*"

Piero Ignazi bi israr dibêje, avantaja partîyên neberpirsîyar ew e ku bi hev re sozên "*em ê riha xwe sibe belaş kur bikin* (10) *û êdî bacê nedin*" didin. Bi şertê ku "*dewleta civakî bi tercîhên neteweyî re li hev bike*" – hem li başûr û rojhilatê Ewropayê ku xizanîyê ew pûç kirî, hem jî li bakurê Ewropayê ku xwe li ber xizanîyê girtî. Heta ku gêjîyeke giştî ser pirsgirêkên bi rastî bigire. Mînakeke din: rasta tundrew xwe weha nîşan dide weke ku alîyê dewletan digire da ku li dijî fînansa transneteweyî li ber xwe bidin, lê belê va ye Liga Bakur û Vlaams Belang doza qutbûna Padanyayê ji Îtalyayê û welatê flamanan ji Belçîkayê dikin. Gelo kulta nasnameya herêmî wê bikeve şûna nasnameya neteweyî?

Ji bilî ya Fransayê, xaleke hevpar derdikeve pêş: piştgirîya Îsraîlê. Destpêka meha kanûnê nêzî sîh birêveberên rasta tundrew – di nav wan de Geert Wilders (11) ê holandî, Filip De Winter ê Belçîkî û xelîfê Jörg Haider Heinz-Christian Strache yê awûstûryayî jî – li Îsraîlê man, bi rûmeta hêjayî mêvanên nirxbilind hatin pêşwazî kirin. Yên ku dişibin hev tên cem hev: cîgirê serokwezîr û wezîrê karê derve yê Îsraîlê Avigdor Lieberman – biryardar e ku ji dewleta ew dixwaze cihû be, Filistînîyan bike der – bi dilgermî bi Gert Wilders ê holandî re peyivî, ku ew bixwe xeyal dike Qur´anê qedexe bike.

Vê şandeyê navê Hevgirtina Azadîya Ewropî (EFA) li xwe kir û baskê ewropî yê komeleya amerîkî ya bi heman navî ye. Çil û duyemîn dewlemendê Los Anglesê (xwedîyê nêzî 750 milyon dolaran e) Aubrey Chernick li dijî vê "*tehlûkeya nû ya dunyayî û totalîter: îslamperest*" pesnê "Danezana Qudsê" weke hevgirtineke demokratîk, dide. Li hemberî vê li Ewropayê gelek ji van tûrîstên cinsê nû, li Parîsê tev li Komcivînên Îslamkirinê bûn ku ji alîyê komikên Bersiva Laîk (Riposte Laïque) û Bloka Nasnameyî (Bloc Identitaire) – yên ku "*apéros saucisson pinard* (şeraba berî xwarina sosîsan)" û germîyên gel ên bi goştê berêz li hev çêkirin – ve bi desteka malpera ultrasîyonîst û ultra-atlantîst Drzz. frê tên organîzekirin. Ango mijar êdî tolhildanên ebedî yên şerê dagirker nîne – sala 1967ê sedema kombûna beşek ji rastên tundrew ji bo tev li şerê Îsraîlê bibin –, lê belê destekkirina kesên li bereya pêşî li dijî "*îslamkirina Rojavayê*" şer dikin e.

Mirov wê bêje çi sosret û sosirmet e: bîst û pênc milyon misilman wê çawa şerîetê li ser pênc sed milyon welatîyên Yekîtîya Ewropayê ferz bikin? Heke wisa be, hingê em bikêrîya manîpulasyoneke nedîtî a fikran a piçûk dibînin, bi taybetî jî dema ku xeyala "şoka şaristanîyan" li ber çavên me bi gewde dibe. Wextê ku îslamperest piçûkxistin û dilêşîyên dunyaya ereb-misilman bi kar tînin, nûmuhafezekar tirsa ji Îslamê bi kar tînin û dema vê dikin tilîya xwe bi antîsemîtîzmeke carinan xedar lê belê di warê îdeolojîk de marjînal ve dikin (12).

Marine Le Pen 10ê kanûnê li Lyonê "ji bîr kir" ku mizgeft li ewqas bajaran kêm in, nimêjên li kolanan ên misilmanan weke "*dagirkerîya*" bê "*tank*" û "*eskeran*" bi nav kir. Gelo hema ji xwe re welê li hev hat? Heke ev kokteyla nû ya tal û tûj – îsraîlhezîyeke di dawîya dawî de dij-semîtî, kîna ji koçberan veguherî nefreteke ji Îslamê – delîla herî baş a vê êrîşa ji vê nebûlaya li rasta rastê bi cîh bûyî pêk anîbe?

Hemin, tu xalên wekhev ên piştî

1939-1945ê bi piştî 1914-1918ê re nînin. Lê belê tehlûke xwe bi rengekî din nîşan bide, dîsa jî bi qasî wan tatêl û mitaleyan bi mirovan re çêdike: mîrasgirên faşîzmê ji nişka ve dethilatdarî negirtine destê xwe, lê belê hêdî hêdî bidestxistina hegemonîyê di nav civaka me ya sîvîl de dimeşînin. Weke Gramsciyê berevajîkirî.

Di nivîsên xwe yên girtîgehê (13) de, bîrdozvanê marksîst ê sardî dinivîsî ku dewlet xwe diparêze bi "*pergaleke beregehan (dezgehên dewletê yên kontrol, çand, agahdarî, dibistan, awayên rêûresmê) yên ku derfeta stratejîyeke êrîşa topyekun li derve dihêlin, lewra divê hemû bi carekê werin bi dest xistin. Lewma şerekî pozîsyonan pêwîst e, ango stratejîyeke ku armanca wê bidestxistina qonaxên cihê û li pey hev ên civaka sivîl pêwîst e*"...

1 Nivîskarê gelek pirtûkan, di nav van de La Fattoria degli Italiani. I rischi della seduzione populista [Kargeha Îtaliyan. Rîskên heyraniya gelperest], Rizzoli, Mîlan, 2009, Partiti politici in Italia [Partiyên siyasî li Îtalyayê], Il Mulino, Bolonya, 2008, û L´estrema destra in Europa [Rasta tundrew li Ewropayê], Il Mulino, Bolonya, 2000 hene

2 Heke wekî din nehatibin dest nîşan kirin, jibergirtinên di gotarê de ji hevpeyvînên nivîskarî pêkanîne, hatine girtin

3 Weşanên Gallimard ev pirtûk ji nû ve sererast kir û bi navê fransî Déclin de l'Occident [Tekçûna Rojavayê] weşand, Parîs, 1948

4 Hevnivîskarê Dictionnaire de l'extrême droite [Ferhenga rasta tundrew], Larousse, Parîs, 2007

5 Li Senatoyê, 23'ê çiriya pêşî ya 2010'ê

6 16'ê adara 1986'ê RPR û UDF ketin hilbijartinên giştî û yên herêmî, ji bîst û didu herêmên Fransaya metropolîtanî serokatiya bîstan bi dest xist – pênc ji wan bi desteka FN'yê ya ku di encamê de li şeş herêman kursiyên birêvebiriyê kirin destê xwe

7 Danezana ji raya giştî re ya 12'ê kanûna 2010'ê

8 Le Point, 11'ê tebaxa 2008'ê

9 Ew beşeke mezin a axaftina xwe ji Jeanne d'Arcê re vediqetîne, li www.frontnational.com binihêrin

10 Jêrenota wergêr: Ev biwêjek e ku ji bo sozên îro tên dayîn û sibe wê neyên girtin, tê bi kar anîn. Di sedsala 18'êde berberekî li Parîsê ev peyv li ser dikana xwe nivîsiye û ji bo mişteriyên ku xwestine belaş riha xwe kur bikin yan jî pora xwe biqusînin gotiye, em ê sibe rihê belaş kur bikin

11 Li gora AFP'yê "Wilders anî zimên ku ew naxwaze ku di berdêla aştiya bi filistîniyan re erd paş ve werin dayîn û pêşniyar kir ku filistînî 'bi dilê xwe' li Urdinê werin b icîh kirin (…)". "Pirsgirêka li vir, li Rojhilata Navîn, ne li ser erd û sînoran e, li ser dijberiya cîhadîzma îslamî û azadiya rojavayî ye." Mirov "şaş in dema difikirin ku dev ji Yehuda-Samariyê (nota redaksiyonê: Şerîa Rojava), û rojhilatê Qudsê berdin û bidin Filistîniyan, ev yek wê dawiyê li pirsgirêka di navbera Îsraîl û ´Ereban de bîne" (…). Wî wargehên cihûyan ên li Şerîaya Rojava weke "kelehên piçûk ên azadiyê, yên ku li dijî hêzên îdeolojîk in yên ku ne bi tenê li Îsraîlê belê li tevahiya Rojavayê mafê jiyana aştiyane, birûmet û azad ´heram dikin" parastin

12 Rapora Komîsyona Neteweyî ya Şêwrê di mijara mafê mirovan de (CNDH, www.cncdh.fr) sal bi sal îşaret bi vê yekê dike

13 Bi fransî bi navê Carnets de prison [Rojnivîsên ji zîndanê] hatin weşandin, Gallimard, Parîs, 1996

* Dîroknas û rojnamevan, bi Bertrand Badie re nivîsîna pirtûka *L'Etat du monde 2011: la fin du monde unique [Rewşa Dunyaya 2011an: Dawîya Dunyaya Tekane]* bi rê ve bir (La Découverte, Parîs, 2010).

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Împaratorîyên Komunîzmê

# Li rojhilatê giraniya rabirdûyê

Michael Minkenberg *

Li Ewropaya Rojhilat, partîyên rastgirên radîkal bi qasî ku li dijî nîzama nû ya lîberal ewqas jî li dijî sosyalîzma dewletî ya hema hema berîya wê hatîye, bi gewde dibin û tev digerin. Û ji xwe di vê dîyardeyê de rewşeke ecêb jî tune: hin bispor ji bo hemû civakên di nav nûjenbûneke bilez de hatine girêdan, vê rewşê herweha weke "patolojîyeke asayî" dinirxînin. Balkêşîya vê dîyardeyê bêhtir taybetmendîyên wê yên herêmî ye.

Rastgira radîkal li Rojhilatê, bi rastî jî bi gelek alîyên xwe ji hemdozên xwe yên li Rojavayê vediqete. Ji dema guherîna rejîmê û vir ve, ew di hilbijartinan de gelek caran encamên pir giring bi dest dixe, lê belê ev encam li gorî cih û deman pir zêde bilind an jî nizm dibin *(çarçoveya li jêr bixwînin)*.

**Rasta radîkal li welatên Rojhilat dikeve nava xwenûbûneke têkûz, lê belê vegotina wê ji ya hemdozên wê yên li Rojava vediqete, lewra kokê wê di dîrokeke xweser a vî beşê parzemînê de ye.**

Taybetmendîyeke din a girêdayî îdeolojîyê di warê demokratîk de bi awayekî vekirî xeşim an jî dij-demokratîkîya van tevgeran e: berevajîya hemdozên xwe yên xerbî, bi têgihîştineke qewmî û erdnîgarî ya "nasnameya" neteweyî ya ku berê serdest bû, ew di asteke bilind û xurt de hesreta xwe ya ji bo rejîmên zordar ên berê tînin ziman. Ev netewegirîya hêç li gel vê yekê jî hembêza xwe ji hin guhertoyan re vedike: li alîyekî, rastgireke faşîst û otokratîk a ku îlhama xwe ji zordestîyên serdema navbera her du şerên cîhanê distîne, bi taybetî li Rûsya, Romanya û heta berî demeke nêz jî li Bulgaristanê pir zexm bû, û ji "netewegir-komunîstên" li nav kavilên Împeratorîya Sovyetê bi gewde bûn, ne serbixwe ye; li alîyê din, rastgireke zêdetir etnosantrîk û nijadperest ku ew jî alîgira revîzyoneke erdnîgarî ye, bi taybetî li Macaristan û Komara Çek konê xwe vegirtîye û bi cih bûye.

Herçendî li Rûsyayê netewegir ji sedsala XIXan ve xeyal dikin ku xwe bigihînin benderên deryayên germ ên Okyanûsa Hindî, dilbijîna ji nû ve destnîşankirina sînoran ne xusûsîyeteke vî welatî tenê ye. "Komargirên" çekî, bo nimûne, dil dibijin ku welatê wan vegere sînorên xwe yên Çekoslovakyaya berê, ku di navê de tenê şênîyekî "homojen" karibe bibe xwedî mafên welatîbûnê. Li Romanyayê, Partîya Romanyaya Mezin (PRM) doza bi destxistina sînorên dema navbera du şerên cîhanê dike, daku bikaribe Moldavyayê jî tev li nav axa welêt bike. Lê belê dilbijokîyên ji bo feth û vegirtinê herî zêde li Macarîstanê har dibin. Partîya ji bo Dad û Jîyanê (MIÉP) û Tevgera ji bo Macarîstaneke Baştir (Jobbik) her du jî doza revîzyona peymana Trianonê (1) dikin û dixwazin sînorên monarşîya Habsbourgê werin fireh kirin *(çarçoveya li jêr bixwînin)*. Ev partî giş ji remzên tevger û rejîmên faşîst ên salên 1930î sûdê werdigrin û bi kar tînin. Bo nimûne, Xaçên sertîr ên Macarîstanê û Parêzvanên hesinî yên Romanyayê.

Li Polonyayê, fundamentalîzma olî mohra xwe li rastgira radîkal daye. Li destpêka sedsala XXemîn, teorîsyenê "nasyonal-demokrasîyê" Roman Dmowskî, digot tenê katolîk dikarin bibin polonîyên qenc. Bi heman bîrbirinê, Yekîtîya Neteweyî ya Xiristîyan (ZChN), di salên 1990î de destnîşan dikir ku ji bo parastina berjewendîyên hemû polonîyên "etnîk" ên li Ewropaya Rojhilat belav bûne, divê dogmaya katolîk li welêt weke baregehekê were bi kar anîn. Niha jî Lîga Malbatan a Polonî (LPR) vê rolê dide ser milên xwe. Li gorî berjewendîya xwe bi zindîkirina tevna tevgerên vemirî yên berî xwe (ZChN, Tevgera Jinûvesazkirina Polonyayê [ROP], Platforma Medenî [SO]), wê piştgirîya Radio Maryjayê bi dest xist. Bi milyonan guhdarên vê radyoyê bi rêkûpêk li gotarên kevneşop, dijbîyanî û dijcihû guhdarî dikin.

Hevnegirîya navbera Rojava û Rojhilatê herweha di qada rêxistinî de jî xwe nîşan dide. Ev rêxistinên ku pir caran alîgirên tundrewî û dijwarîyê ne, ji serekî parzemînê ta serê wê yê din, li her derê wê, kêm an jî zêde xwedî heman helwêstê ne. Ew hilbijartinan û siyaseta sazîyî piçûk dibînin, bi hemûyan re meyleke nijadperest heye û mirovê bihêz û xurt ji xwe re dikin pût û senem. Li Polonyayê bi sedan çalakger her carê li bajarekî cuda birêkûpêk li hev kom dibin û dîwaran bi grafîtîyên faşîst û dijcihû dilewitînin. Ciwanên polonî yên heta 2006ê di nav Lîga Malbatan a Polonî (LPR) de bûn, bi şidetkarîya xwe navdar bûn. Li Komara Çek "şanoyeke" radîkal a li gorî kêfa xwe êriş dibe ser romanîyan heye û sirf ji ber vê yekê, dikare xwe bi beşekî ahalîyê bide hezkirin. Li Macarîstanê, di salên 1990î de dihat texmînkirin ku 4 000 endamên tevgera serzelûtan hebûn. Li Rûsyayê, hejmara wan digihîje herî kêm 50 hezar kesan û komên din ên tundrew ên weke endamên Ultra-Ortodoks ên Alexandre Douguine an jî mîlîtanên dijbîyanî yên Tevgera li Dijî Penaberîya Qaçax (MCII), li wan zêde dibin.

Rastgira tundrew li gel vê yekê jî li van welatan nispet bi cîranên wan ên Rojavayê, kêmtir xwedî demûdezgeh e, lê belê mirov dikare bibêje ku ji bo piranîya partîyên siyasî heman rewş mijara gotinê ye. Ji ber hilkişîn û daketinên wan ên mîna devê birekê di hilbijartinan de û ji ber bêîstiqrarîya wan a di berdewamîyê de, rastgirên radîkal ên Rojhilatê nikarin bibin xwedî liv û tevgereke rewan û ev rewş xeta veqetînê ya navbera partîyan û tevgerên rastgira radîkal û her weha ya navbera van ên dawî û rastgira kevneparêz jî şîlo dike. Ev damarê cihêreng ê endamên nû yên Yekîtîya Ewropayê hem bi guherîna rejîmên wan, hem jî bi dîroka xweser a herêmê ve tê ravekirin. Xwedîyên van mîrateyan di qadeke demokratîk de bi awayekî wisa xwe dane ser hev ku, eger em bixwazin diyardeyê bi nimûneyeke berbiçav bi nav bikin, dişibin qaşilên pîvazekê ku divê tew bi tew bên rakirin.

Tewa pêşî ji ber encamên jinişkave yên pêvajoya parçebûna Yekîtîya Komarên Sovyeta Sosyalîst (YKSS) a 1989ê pêk hatîye. Ji vê dîrokê û vir ve bi awayekî xweber pêvajoyek ber bi demokrasî û aborîya bazarê ve dest pê kir û di heman demê de jî, hewldanên mezin ên adaptasyona ku endamên berê yên Pakta Varşovayê tev li Yekîtîya Ewropayî bên kirin, hatin bi lez kirin. Van hejîn û guherînên kokdar û mezin ên bendeke heta hingê nenas, xist navbera dewlemend û xizanan û dengeya navbera pêdivîyên gel û kêmasîya sermayeya liberdest - her weha sermayeya ewlehîyê xira kir, tevna civakê yekcar serûbin kir. Tundrewên rastgir jî ji vê rewşê û tevlîhevîyê sûd wergirt û ew kêfnexweşîya civakê ya ji ber guherîna kokdar derket holê, baş bikar anî.

Dû re tewa duyemîn a pîvazê, ku ew jî mîrateya rejîmên berê yên komunîst e, derdikeve pêşîya me: burokrasîyeke sergêjker, çandeke siyasî ya dûrî xweşbînîyê, bijarteyên ji pergala nû re pir biyanî, partîyên ku rehên wan zêde li nav civakê negerîyane, aborîyeke ji berî 50 salan a serdema otorîteya navendî maye. Ev encama dijwar, dibe sedemê mezinbûna hêrseke ku li qadeke sîyasî ya xwedî demûdezgehên qels, bi kêrî rastgirên tundrew tê. Penaberên biyanî yên bê guneh ên li Ewropaya Rojava weke serkanîya gunehan tên dîtin, zêde naçin li Ewropaya Rojhilat û xwe lê nagrin. Ev rola gunehkar a penaberên biyanî ji ber vê yekê li Rojhilatê dikeve ser milê hindikahîyên xwecîhî û welatên hevsînor -ku ev yek di demeke dirêj de dikare têkilîyên navbera dewletan jî xira bike.

Tewa sêyemîn a pîvazê ji yên din jî stûrtir e: ev jî ji nebûna tecrubeya demokratîk pêk tê. Hemû welatên vê herêmê (ji bilî Çekoslovakyayê) ji dema serxwebûna xwe ya neteweyî ve vê êşê dikşînin. Ji ber vê yekê bijarteyên van welatan, berevajîya yên ku piştî 1945ê Almanya û Avustûrya bi rê ve birine, pir zehmetî dîtine, dema ku xwestine bikevin nav kirasên nû yên nûjenîyê pêrgî gelek dijwarîyan bûne –bi rastî jî karûbarekî pir dijwar e ji bo wan, ji ber ku nikarin xwe bispêrin tu kevneşopîyeke demokratîk a berê, bi taybetî jî kevneşopîya pêvajoya di navbera her du şerên mezin ên cîhanê de.

Li Rojhilatê rehên geşedana bilez a rastgira radîkal digihîjin dîrokeke kûrtir: dîroka neteweyên ku vî beşê parzemînê pêk tînin. Bigewdebûna wan, ku di sedsala XIXê de dest pê dike û di pêvajoya sedsala XXê de pir caran dest lê tê werdan, îro hê jî bi temamî bi dawî nehatîye. Berevajîya Ewropaya Rojava, hema bêje hemû welatên ku di dema *Hilweşîna Dîwar* de gihîştibûn serbixwebûna xwe, heta şerê yekemîn ê cîhanê jî di destê împeratorîyên pirnetewe de bûn -rûs, avusturya-macar, osmanî-. Ji ber nebûna dewleteke şertên wê musait, li van welatan di sedsala XIXê de hişmendîya neteweyî ya çêkirî xwe dispart têgeheke netewî ya qewmî. Ji ber vê yekê berdewamîya dewletê û ya sînorên wê îro hê jî di xetereyê de ye. Ji sala 1918ê ve bigewdebûna sêgoşe ya van welatan hema bêje qet neguherîye: dewlet–neteweyek, li gel hindikahîyên "biyanî" yên di nav sînorên wê de û li gel şênîya wê ya xwecîhî ya berbelavî derve bûye û kêm an jî zêde dixwaze xwe careke din bigihîne "dayika niştiman". Pêvajoya serdema sosyalîzma sovyetî, enternasyonalîzmeke nepixandî karî van tansîyon û tengezarîyan binixumîne ku ji 1989ê û vir ve jî ultranasyonalîst dikarin xirab bikar bînin û har bikin. (2)

Zexta dij-komunîst a ku ji serhildana 1989ê derket holê, dawîya dawî li welatên Rojhilatê veguherî rehabîlîtasyona têgeha *dewlet-neteweyê*. Ji ber vê yekê vegotina netewegir û etnosantrîk li vir qet ne dîyardeyeke marjînal e, lê nemaze li nav şertên postkomunîst ên ku cihê piçûktirîn didin civaka sîvîl dingilê sazkar ê jîyana gelemperî û sîyasî ye. Dema reda bijarteyan û hêvîşikestina di warê siyasî de jî bi ser van şertan ve zêde dibin, bi her halî êdî ne pir ecêb e ku civak gav bi gav ber bi rasgirîyê ve xwar bibe.

* Profesorê Unîversîteya Viadrinayê (Frankfurt an der Oder)

1 Peymana aştîyê ya Trianonê, ku bi zexta Dewletên Hevpeyman di 4ê Hezîrana 1920î de pêk hat, parçekirina Macaristanê dide ber xwe û wê neçar dike ku Slovakya û Ruthenîyayê bide Çekoslovakyayê, Xirwatistanê bide Yugoslavyayê û Transîlvanyayê jî bide Romanyayê

2 Binihêrin, Yves Plasseraud: "Jibîrbûna dîroka otonomîya çandî"

Wergera ji fransî: Baran Nebar

### Rewşa sindoqên hilbijartinan

Rastgira radîkal a ku hema bêje li welatên baltik ên ku berî her tiştî şert û mercên maqûl pêşkêşî wê dikirin, tunebû, demeke dirêj li Bulgaristanê nekarî bi firê bikeve - ew ancax di 2005ê de, dema ku Partîya Ataka ket parlamanê, peyda bû. Berevajîya rewşa li Bulgaristanê, li Komara Çek, "komargir", piştî li dû tevgereke bi xirûcir û heytehol, ji dawîya salên 1990î û vir ve hema hema bi temamî ji holê rabûn. Li Macaristanê, Partîya ji bo Dad û Jîyanê (MIÉP), berî ku ji pîyaseyê rabe, di 1998ê de çend kursîyên parlamanê bi dest xistin: wê di şûna xwe da Tevgera ji bo Macaristaneke Baştir (Jobbik), ku eva dawî ji wê kêm radîkaltir nebû. Jobbikê di hilbijartinên giştî yên nîsana 2010ê de %17ê dengan bi dest xist. Partîya Nasyonal a Slovak (SNS) a Jan Slota bi îstîkrartir e. Rêjeya dengê vê partîyê heta sala 2006ê li derdora %10 bû, berî ku çar sal şûnde dakeve %5ê.

Ev tevgera ku bi dorê ji alîyê Partîya "lîberal-demokrat" a Vladîmîr Jîrînovskî û Partîya Romanyaya Mezin (PRM) a Vadîm Tudor ve tê temsîlkirin, bêhtir li Rûsya û Romanyayê bi cih bûye û heta salên piştî 2000î jî, tevî kêmbûneke hindik a di van salên dawî de, gelek caran xwe gihandîye rêjeyeke du reqemî ya dengan.

Rewşa Polonyayê ji ber dudilî û zûguherîna tercîhên dengdarên wê, pir xweser e. Lîga Malbatên Polonî ya Ultra-Katolîk (LPR) ji ber vê yekê di 2001 û 2005ê de %8ê dengan kom kir û heta, ji bo demeke kin, li tenişt kevneşopên partîya gundîyan Samoobrona (%11ê dengan di 2005ê de), bû şirîka hukûmetê jî. Di 2007ê de (%1,3yê dengan) ji taqetê ket, dû re jî mîna Samoobronayê pîyaseya sîyasî yekcar winda bû. Bi rastî jî, li vî welatî, rastgira radîkal a polonî di nav bihuşta partîyên dijber ên kiras û navên wan pir zû tên guhertin, berdewam hildiweşe û ji nû ve tê avakirin.

## JI MADRÎDÊ HETA BI ROMAYÊ

# Li rastê, jihevdeketin û ji nû ve pêkanîna nîzamê

LAURENT BONELLI Û RAFFAELE LAUDANI *

Mirov çawa pêkhatinên rastgira radîkal ji yên rastgir derbixe? Dîroknas Rene Remond ev pirsgirêk çareser kir, wî "*alerjîyeke*" civaka fransî li faşîzmê da zanîn û rasta siyasî bi ser beşên rewabûnparêz, orleanîst û bonapartîst (1) dabeş kirin. Heke mirov bêje rasta fransî li dijî faşîzmê dikarîbû kelehekê pêk bîne, hingê mirov encameke dîrokî weke xisleteke giştî dibîne. Ya rastî, ne bi tenê cudahîyên îdeolojîk nahêlin birêvebirên Kombûna Ji bo Komarê (RPR) û Bereya Neteweyî (FN) hev bigirin, belê birînên pevçûnên –di nav de yên fizîkî jî– şerê Cezayîrê di nav mîlîtanên her du alîyan de dayî der (2) jî nahêlin ku ew hev bigirin.

Dema mirov dîroka rastgira radîkal dinivîse, ev ne lêkolîna xisletên partîyekê, tevgerekê ye, lê belê herweha afirandina derfetan e da ku li hevgirtinên kêm û zêde bi mentiqî li domdarîyên kêm û zêde mumkin bifikirin, yên ku di qada neteweyî û herêmî de mirov dikare çavdêrîya wan bike.

Ev pirs nexasim ji bo Spanya û Îtalyayê derdikeve pêş, du dewletên ku rastgira radîkal demeke dirêj dîktatorîya general Francisco Franco (1939-1975) û ya Benîto Mussolînî (1922-1943 (3)) li wan desthilatdar bû.

Li Spanyayê, hatina demokrasîyê hindik cih ji wan partîyan re hişt ku îdîa dikin alîgirên Franco ne. Hemin di nav hêzên ewlekarîyê de bandoreke diyar parastin, heta 23ê sibata 1981ê dest bi hewldaneke darbeyeke eskerî jî kirin. Lê belê di hilbijartinan de wê tu carî nebûyana xwedî giranî, sedema vê jî ew e ku partîya sereke ya rastgir Hevgirtina Gel (AP – *Alianza Popular*) gelek mîlîtanên wan – mijarên wan jî – hewandin. APya spartî kevnewezîrê tûrîzmê û agahdarîyê yê Franco, Manuel Fraga, wê bibûya hêza sereke ya muxalefeta li dijî Partîya Sosyalîst a Karker a Spanyayê (PSOE) ya ku ji 1982ê heta 1996ê desthilatdar bû.

Sala 1989ê ji nû ve navê Partîya Gel (PP – *Partido Popular*) li xwe kir û José Maria Aznar ew bi rê ve bir. Ji rastgira xirîstîyan demokrat heta bi beşên herî dilê xwe dibijandin serdema Franco, vê pêkhatina siyasî dengên rastgiran komî ser hev kirin. Hukûmeta wê jî li gor hevgirtinên neçar bû pêk bîne, guherî. Di koalîsyona hukûmetê de ya ku wê di navbera 1996ê û 2000î de bi rê ve bir, PP bêhtir lîberal bû (privatîzekirin û li qada civakî kêmkirina lêçûnên dewletê). Piştî sala 2000î ji nû ve û vê carê bi piranîyeke mutleq hat hilbijartin, PP da ser rêyeke bêhtir konservatîv.

Ew bi awayekî biryardar di "şerê cihanî yê li dijî terorîzmê" de cihê xwe digire, li Afxanîstanê û piştre li Iraqê; qanûneke ku ketina welêt û mana biyanîyan zehmet dike, da qebûlkirin; û kir ku Batasuna, partîyeke çepgira neteweparêz a baskî, were qedexe kirin. Ew herweha reformeke pergala perwerdeyê ferz dike ya ku perwerdeya dînî û exlaqî ya katolîk ji nû ve di perwerdeya dibistana destpêkê û ya navîn de bi cih dike.

> Li Spanyayê, rasteke pir kevneparêz e ya ku nostaljîkên frankîzmê li hev kom kirin, li Îtalyayê jî beşekî rasta tundrew xwe bi îtîbar kir, lê yê din veqetînxwaziyê diparêze.

PP di adara 2004ê de dîsa bû opozîsyon. Vê yekê di navbera yên dixwestin ji PPyê partîyeke lîberal a li gorî rêûresmê biafirînin (weke şaredarê Madrîdê Alberto Ruiz Gallardón) û partîzanên xeteke hişktir de, rê li ber alozîyan vekir. Weke sekreterê giştî yê partîyê destnîşankirina Mariano Rajoy îşaret bi hin lêgerînên tewazûnê kir, lê belê PPyê wê li nav hilbijêrên xwe yên herî tundrew li piştgirîyê bigerîya. Divê mirov bi vî rengî dijberîya wê ya tund ya li hemberî niqaşên li ser şerê navxweyî şirove bike (alîkarê serokê civaka xweser a Madrîdê, Ignacio González weha gunehbar dike "*hin civak dixwazin siyên kevin ên rabirdûyeke ku mirov ji heq derketine, dîsa bînin*"), heta bi rakirina peykerên faşîst jî (rakirina peykerê siwarî yê Franco de Nuevos Ministerios li Madrîdê, ji bo birêveberên herêmî "*kirina herî tundrew a dîroka demokratîk*" e).

PPyê wê her weha destek bidaya êrîşên li hemberî hîyerarşîya katolîk a li dijî zewaca homoseksuelan (ya ku li gorî Rajoy "*hîmê sazîya zewacê xira dike*"); a li dijî pêkanîna perwerdeyeke sivîl li dibistanê (li gorî cihgira şêwirmendê perwerdê yê şaredarîya Madrîdê Alicia Delibesê "*çep bi vê dixwaze rê bide ber daxwaza zarokan û reng bide têgihiştina wan*") yan jî ya li dijî dirêjkirina dema fermî ya jiberxwebirina zarokê (berdevkê koma PPyê di Meclîsa Madrîdê de David Pérez ev yek weha bi nav dikir: "*gava berepaş a demokratîk a herî xirab a di sîh salên demokrasîyê de ye, ji ber ku ji bo cara pêşî fermî dibe ku komek mirovên hê ji dayik nebûne, dikarin bi awayekî hovane û bêyî ku ti mafê wan ê xwe parastin hebe, ji holê werin rakirin*").

PPyê wê herweha îdeolojîya frankîst ya yekîtîya neteweyî jî ji nû ve zindî bikira, ango gumana li hemberî xweserîyên herêmî. Di 2006ê de berdevkê PPyê Eduardo Zaplana da zanîn ku di nav hukûmeta José Luis Zapatero de "*yên ku dixwazin Spanyayê xira bikin, bi ser dikevin*". Li ser heman xetê, li ser pirsa koçberîyê wî dê dest bi fikaran bikira; di 2010ê de hin şaredarîyan red kir ku koçberên qaçax ji xizmetên tenduristîyê û perwerdeyê sûdê wergirin, wî jî destek da van şaredarîyan.

RODI KHALIL: **Xewn III**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 90 x 60 cm

Ev hişkbûna muhafezakar a PPya spanî bi beridîn û veguherînê re ya li Îtalyayê tê dîtin têra xwe nakok e. Yek ji encamên herî darîçav a "neasayîya" Berlusconi, ya rastî, girêdayî îdîaya hebûna du ruhên weha xuya ye, baş ji hev cuda yên rastê ye: ruhê postfaşîst ku serokê parlemana heyî Gianfranco Fini wî bi gewde dike, û ruhê "cudaxwaz" yê Lîga Bakur a Umberto Bossî.

Gelo hema weha li hev hat? Hemin na: çawa Silvio Berlusconî dakete ser dikê, partîya ku ji arîya faşîzmê, piştî şer peyda bû –Tevgera Civakî ya Îtalî (MSI)– ji getoya ku Komara Pêşî ew lê heps kiribû, xilas bû. Lidorhevgerîyana van herdu zilaman û partîyên wan, bi damezirandina Gelê Azadîyê (PDL) ango yekane partîya navend-rastê, gihişte asta xwe ya herî jor. Êdî vê jî, perîyeke ewqasî baş, Hevgirtina Neteweyî ya ciwan sala 1994ê bire ser hewtikê tehfîlê , di bin vî navî de partîya Gîorgîo Almîrante kiras guherî, dev ji fêrbûnên xwe yên kevin û îdeolojîk berda (4), bi taybetî jî dev ji pêşhukmên dij-cihû û alîgirîya ´ereban ên rasta nîvgiravê berda.

Ev bû destpêka avakirina partîyeke rastgir ya "bi awayê ewropî" ya di dîroka Îtalyayê de nedîtî, him bandora rêûresmên gel ên alman û him jî ji yên gaullîst lê bûye, heta bi awayekî nakokane di mijarên mafên sivîl de carinan pozîsyonên ji Partîya Demokrat "pêşverûtir" parastin (ji bergirtina bi alîkarîyê heta bi qebûlkirina zewaca homoseksuelan û mafê hilbijartinê ji bo koçberên qanûnî)...

Gava dawîyê ya vê guherînê ji çend mehan û vir ve bi dijberbûneke yekser a bi Cavaliere (nota wergêr: navê ku li Silvio Berlusconi tê kirin) re xwe dide der. Weha xuya ye ku Fini veguherî hevrikê sereke yê Cavaliere. Ya rastî, heke Fini demeke dirêj sûd ji têkilîya xwe ya li pêş girtî ya bi serokê Konseyê re girt, neçar bû xwedî li beşek ji jirêderketinên wî yên şexsî derkeve jî, derketina holê ya partîyeke bi tenê ya navend-rastê – paşê ji alîyê serokê ANyê ve weke "*şaşî* (5)" hat bi nav kirin – ji kesên vê partîyê alî guhertin tevahîya derfetên manovrayên xweser stendin.

Ha ji ber vê yekê di dawîyê de Fini yê ku di nav skandalên seksê û dadgerîyê, yên hêjayî serdema dawî ya Împaratorîya Romayê de gevizî, li fîgurê pêşîlêgir ê Berlusconî ket. Qutbûna Yekîtîya Navendê (UDC) ku yek ji encamên jihevketina "balînayê spî" demokratên xirîstîyan bû û neçalakbûna PDLyê ya ku bi tenê astengan ji bo "hêrs û çavsorîya" dadgerî li dijî serokê Konseyê vedibîne, kirin ku navenda giranîya ´hukûmetê ber bi Lîga Bakur ve bişemite. Lîga Bakur berevajî ANyê tercîh kir ku bi Cavaliere re hevgirtinê pêk bîne, bêyî ku zêde di nav PDLyê de bihele – "wezîrê super" ê aborîyê Guîdo Tremontî yê bi hêz, bi rengekî fermî nûnerîya PDLyê dike, weke *spin doctor* (şêwirmend) bi kêrî Lîgê tê.

Ji ber vê jî ji hingê ve Fini daxwaza sala 2013ê li şûna xelîfe bibe xelîfe, tîne zimên û herweha "guhertîbûna xwe" bi awayekî zêde nîşan dide. Dema ev kir, wî ji nû ve ruh bi du prensîpên karakterîstîk ên rastê ve anî, yên ku hê doh di nav salên canêcanêbûna bi berluskonîzmê de hatin bi gorî kirin: rewabûn û kulta dewletê, stûnên partîya ciwan, Siberoj û Azadîyê (FLI), ku weke reaksîyoneke li dijî ji PDLyê dûrxistina serokê ANyê çirîya paşî ya 2010an hat damezrandin. Ev partî weke alternatîveke "nerm", "li gorî destûra bingehîn" û "civakî" a berlusconîzmê derdikeve pêş.

Riya wê hindiktir li hev fitilî xuya bike jî Lîga Bakur jî gelek girêdayî serhatîyên Berlusconî ye. Ji bo ku ´hukûmeta pêşî ya Berlusconi ava bike bi Forza Italia´yê re hevgirtinek pêk anîbû. Ev tevgera "dij-sîstem" pesnê "parçebûnê" û paşê yê "federasyonê" dide, berdevkê mercîyên herî êrîşkar ê derdorên karsazan e û van salên dawîyê ew bixwe jî gelek guherî.

Weke partî ji hukûmetê vekişîya. Ew hêz û erkên xwe yên herêmî bi beşdarbûna dezgehên neteweyî xurt dike. Di hilbijartinên herêmî yên sala 2010ê de, Lîgê li heşt herêmên "xwe" yên li pêş % 19.77ê dengan bi dest xist, ji xwe li Venedîkê % 35.15ê dengan bi dest xist. Hin şiroveker û herweha sempatîzan ji xwe dipirsin "*gelo Lîg hê federalîst e*" û gelo wê di berdêla hebûna xwe ya di "hola biryardayînê" de xiyanet bi fikrên xwe re nekirîye (6).

Pratîka wê dibe sedema derzeke mezin a di navbera "pragmatîzm" û zimanê "mîtolojîk" ê Padanîyayê de, Padanîya navlêkirineke cografî ye ku guman di derbarê koka wê de hene, armanca wê yekkirina çand û rêûresmên tevahîya gelên bakurê Îtalyayê ye, ji şaristanîya keltan tên û wan kokên xirîstiyanîyê dane Ewropayê. Ji gilîkirina "Romaya diz" a ku bi tenê bi kêrî seferberkirina girseyê tê, bêhtir, beşdarbûna wê ya di dezgehan de bi kêr tê ku îro wesayeta berjewendîyên ezezî yên bakurê Îtalyayê bigire dest; Lîg doza berdevkîya bakurê Îtalyayê dike.

Heke berlusconîzm siyaseteke serpêneêşandinê ya bêlîberalîzm be (7), hingê Lîg berevajî vê, lîberalîzmeke bêyî siyaseteke serpêneêşandinê tîne zimên: ew bi tenê alîyên dij-civakî û dijminatîya biyanîyan diparêze – mîna bi vedîtina mixabin a "*welatîyên gilover*" a xweparastina li dijî "*sûcdarîya ji derveyî civakê*". Lê belê polemîka li ser koçberîya qaçax ji bo êrîşeke berfirehtir a li dijî rêzikên bazara kar weke ezmûnekê ye da ku di çarçoveya wesayeteke xizm û nasparêz a li ser erdên xwe bi xwe de, bazara kar ji "mecbûrîyetên" civakî û berîya hertiştî yên sendîkayî "azad bikin": Partîya Bossî bi vî rengî dibe hêza sereke ya ku ji agir Demokrasîya Xirîstîyan "parêzvanîya dewleta civakî" digire.

Her du rastên îtalî cudayîyên xwe derdixin pêş, lê belê tu tiştê wan ê ku li hev neke nîne. Ma di bin pîvana sereke ya siyasî de ku ji alîyê navend-rastê ve van salên dawîyê hat qebûlkirin mohra her du lîderan nîne? Ev pîvan qanûna mixabin ku bi navê Bossî-Fini navdar a li ser koçberîyê (2002), yek ji yên herî hişk ên parzemîna pîr Ewropayê ye.

Hin çavdêr bi israr bi "jidilbûna" veguherîna demokratîk ya Fini bawer dikin, dema vê dikin jî behsa hevduberdana têrêş a ji jina ew heyranî wê bû, dikin; ew jina ku wî di dema mîlîtantîya xwe ya faşîst de nas kiribû (8). Profîla wî ya "siyasetvanê nerm" berîya her tiştî pir weke veguherîneke qelp a taktîkî xuya dike ku li vîzyona karsazên mezin bîne; karsazên mezin ên ku dixwazin navberê bixin navbeyna xwe û dewra dawî ya Berlusconîyekî de ku ew – belkî bi awayê zêde xweşbîn – weke ku wê dawîya wî (xirab) be, dinirxînin.

Di nav bîst salan de sazîya karsazên îtalî Confindustria´yê bi awayekî oportunîst desteka xwe ya dida Romano Prodi´yê nerm (ku ew tercîh dike) û Berlusconiyê "tundrew" (ku her diçe hindiktir .... destekê didîyê) guherî. Lê belê heke mirov qeyrana heyî ya hegemonyaya Berlusconi ya li rastê û di derxistina holê ya alternatîvekê de bêkêriya çepê li ber çavan bigire, weha xuya ye ku –di çarçoveyeke neolîberal de- alternatîv wê hê jî ji nava rastê derkeve holê.

* Lêkolînerên li beşên dîrok, antropolojî û cografyayê yên zanîngeha Bolonyayê.

1 René Rémond, Les droites en France [Rastên li Fransayê], Aubier, Parîs 1982

2 Berevajî vê, komarparêzên serbixwe wê di mijara yekbûna bi FN'yê re dudilî nebûyana (çawa ku Charles Millon yan jî Jacques Blanc di hilbijartinên herêmî yên sala 1998'an de kir)

3 Mussolînî 25ê tîrmeha 1943an hat xistin û hat girtin, komek komandoyên SS'yê ew azad kir û wî ji îlona 1943an heta bi nîsana 1945an serokatiya Komara Saloyê kir

4 Di dema serdaneke fermî ya Îsraîlê de, li pêşiya Dîwarê Girînê, bi kîpa li ser serê xwe, Fini faşîzm weke "xirabiya mutleq a sedsala 20ê" bi nav kir. Wisa jî bi rengekî sembolîk "dawî li vê pêvajoyê anî". Binêre li Piero Ignazi, Postfascisti? La trasformazione del Movimento Sociale in Alleanza Nazionale [Piştfaşîst? Guherîna tevgera civakî di Hevpeymaniya Neteweyî de], Il Mulino, Bolonya, 1998

5 Die Welt am Sonntag, Berlîn, 7ê çiriya paşî ya 2010ê

6 Luca Ricolfi, "Ma la Lega è ancora federalista?" ["Gelo Lîga hê jî federalîst e?"], La Stampa, Torîno, 10ê îlona 2010an

7 Carlo Galli, "M. Berlusconi, théoricien de la débrouille" ["Berlusconî, teorîsyenê derketina ji heqê pirsgirêkan"], Le Monde diplomatique, îlona 2009ê

8 Ya ku divê were ronî kirin êdî bi tenê rolê Fini yê "nerm" e, dema ew cihgirê serokê Konseyê bû, di bûyerên trajîk ên civîna G-8'an a li Cenovayê de (2001), dema ku polês zor li xwepêşandêran dikir, di heman demê de tadarî dida xwe ji bo biqîre: "Viva il Duce!" [nota wergêr: slogana serdema faşîst a Îtalyayê ji bo silavkirina Mussolînî] (Nick Davies, "The Bloody Battle of Genoa" ["Şerê xwînrêj ê Cenova´yê"], The Guardian, 17ê tîrmeha 2008ê)

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Xatirxwestina dawî ji xweşbînîya holandî

Peyvbêjên êrîşbaz yên weke Geert Wilders, bi axaftinên xwe yên tûj destek dan berbelavbûna rasteke radîkal a ku heta berî pazdeh salan jî li Holandayê hema hema qet tinebû.

RINKE VAN DEN BRINK *

Li parlemanterê rastgira radîkal Hans Janmaat 29ê kanûna 1997ê, du hefte cezayê girtîgehê û 3 400 euro cezayê pereyan hat birîn, ji ber ku nav di kîna nijadî da: 27ê çirîya pêşî ya 1994ê, di dawîya xwepêşandaneke li Zwollê, wî got, kengî ew bikaribe, ew ê di cih de dawîyê li civaka pirçandî bîne. Û dîsa jî, tu kesî gilîyê bernameya hilbijartinê ya ku îlham daye wî nekir – slogana vê bernameyê "Oost west thuis best" (bi her çivîkî hêlîna wî xweş e) û di nav wan tiştan de ku vê bernameyê pesnê wan dida, çêkirina wargehên kar ji bo mirovên serî li mafê penaberîyê didin û vegerandina koçberên bêkarmayî jî hebû... Ya darîçav ew bû, heke mirov li ber sozên kampanyayên hilbijartinan bigire, dadgerî li hemberî daxuyanîyên li raya giştî aşkere hestyartir bû.

12 salan paşê, ev cudatî ji holê rabû. Parlemanterê rastgira radîkal Geert Wilders di hevpeyvînekê de -14ê hezîrana 2009ê- da zanîn ku divê mirov "*piştî ku pasaportên wan ji wan bistîne bi milyonan heta bi dehan milyon misilmanan ji Ewropayê bike der*" (1), "*gunehkarên*" ku bernameya wan avakirina şerîetê li Ewropayê dixwaze yan jî ew bi xwe dixwazin vê dozê bikin. Dadgerîyê xwe qet tev neda.

Welatê Erasmus û Spînoza çawa dikarî bi niqaşeke siyasî ya li dijî toleransê û rêbiwarîyê bibane, toleransa ku Holandayê demeke dirêj pê pesnê xwe dida? Doh, hejmara rastgira radîkal bê qîmet bû, tevî ku sîstema hilbijartinan a li gorî nûnerîya %100 ku bi kêrî partîyên marjînal tê jî: di hilbijartinên 1994ê de, partîyên cihê yên rasta radîkal % 2.4ê dengan bi dest xistin û sê parlemanter dan hilbijartin. Îroj, pêşnîyarên herî zêde hêrsker jî bûne asayî.

Di vê navberê de, 11ê îlonê qewimî. Hê sê hefteyan berîya vê, Pim Fortuyn, yê ku ji çepê veqetîyabû, nêremoyekî narîn û dijminekî Îslamê yê êrîşkar, kete nava sîyasetê û berê tîrên xwe jî da "tabûya" pirçandîtîyê. Dema mirovî hin pêşnîyarên wî didan ber yên lîderê *Vlams Belangê* Filip Dewinter, pêşnîyarên Dewinter nerm xuya dikirin. Di gulana 2002yê de, kuştina Fortuyn, paşê di çirîya paşî ya 2004ê de ya sînemevanê Theo van Gogh, karê mayî temam kir. Ji hingê ve, kîn di nîqaşên entelektuel de serdest e û radîkalbûneke giştî teşwîq dike. Parlemanterê lîberal Geert Wilders jî vê fenomenê xilas nebû, bi taybetî jî di bin bandora hempîşeya xwe de, sembola navdar Ayaan Hirsi Alî. Her du jî tamijîbûna provokasyonê par ve dikin û mirov nikare jêhatîbûna wan di vê mijarê de înkar bike.

Wilders 2ê îlona 2004ê ji partîya xwe veqetîya û tevgereke ku îroj weke Partîya ji bo Azadîyê (PVV) tê nasîn, damezirand. Vî kesê alî guhertî kursîyê xwe yê parlemanterîyê parast, di keleha dawî ya şaristanîya rojava ya li dijî dagirkerîya misilmanên hov de cîhê xwe girt: fikra wî ya sabit misilmanbûna Rojavayê ye. Ji ber vê jî, bê lam û cîm ew dostê Îsraîlê ye û destekê dide sîyaseta wê ya dij-filistînê.

Mijar temam bû: ew li dijî Îslamê pêşnîyar dike ku azadîyên misilmanan werin sînor kirin; her weha li dijî Îslamê ew bû qasidê homoseksuelan. Mafên mirovan ji bîr kirin, bijîn mafên ... mêrî.

Dijminê aşkerekirî yê çep, elît, çapemenî û Ewropayê, Wilders êrîşê dibe ser her kesê ku li dijî neteweya holandî "kompleyê digerîne". Bêyî ku tirsa wî ji nakokîyan hebe, ev kesê ji 1990ê ve alîkarê parlemanter ê koma lîberal, bi xwe jî ji sala 1998ê û vir ve parlemanter e, weke ku ne ji elîtan be xwe nîşan dide; heta xwe weke ku ne ji yê çîna sîyasî be ya ku ew weke "rizî" bi nav dike jî, nîşan dide. Jehra dijminatîya wî ya ku mezin dibe, her weha rave dike ku ew di parastina misêwaya parêzvanan de dijî û li navnîşanên nepenî dimîne. Di hilbijartinên giştî yên çirîya paşî ya sala 2006ê de, PVVyê %5.9ê dengan û 9 kursî bi dest xistin. Wilders bi xwe bi alîkarîya zilamê doza xwe, kevnerojnamevan Martin Bosma namzetan dineqîne. Lewra partîya wî tu tiştî ji demokrasîyê fêm nedikir: xebitîna partîyê xwe disipêre "*Führerprinzip*" – prensîpa lîder. Ew ne bi tenê lîderê bê nîqaş ê partîyê ye: ew her weha yekane endam e jî. Tevî ku ew pir caran gilî û gazinan ji helwêsta partîyên din a hemberî partîya xwe dike, yên ku PVVyê li derveyî koalîsyonan dihêlin, rastî berevajî vê ye.

Piştî ku zilamên wî ketin parlemanê, şêwazê xebatê û atmosfer guherî. Parlemanterên wî henekên xwe bi ferheng û adetên parlemanterîyê dikin û heqaretên şexsî dixin nav nîqaşa sîyasî; heta heqaret vediguhere sîleha wan a li pêş. Li hemberî vê, kî biwêre bi awayê Wilders bersivê bide, ew bi "*weke şeytan nîşandan*" û amadekirina kuştina sîyasî ya bê, tê gunehbarkirin: ango bi kuştina Wilders bi xwe. Dema vê dike tu tiştekî nû nake: Pim Fortuynî dijminên xwe gunehbar dikirin ku bi liberhevgirtina li ber Jörg Haider yan jî Philip Dewinter û Jean-Marie Le Pen, wî "*deq dikin*". Wî digot "*heke tiştek were serê min, hûn ê jê berpirsîyar bin.*"

Jêhatîbûna wî ya di warê retorîkê de alîkarîya wî kir, Wilders bû hostayê peyvên baş û sloganên ku cihê xwe digirin û di anketan de rêjeya dengên xwe her zêde dike. Û her weha di hilbijartinan de jî. Sîyasetnasên ku ji xisleta demdirêj a serkeftina wî ya di hilbijartinên ewropî yên 2009ê de -%17– guman dikirin, di hilbijartinên giştî yên 2010ê de dengê xwe û îdîayên xwe kêm kirin: PVVyê %15ê dengan stend û ji 150 parlemanterên meclisa Staten-Generaal 24 bi dest xistin.

Wildersê ku bi serkeftinê xurt bûyî, maskeyê wî ji ber rûyê wî ket: wî dev ji doza dewamkirina teqawîtbûna di 65 salîyê de berda, ev doz yek ji mijarên li pêş ên bernameya wî ya hilbijartinê bû. Ev guherîna fikirê ya ku armanca wê, nêzîkbûna "modela danîmarkî" bû, têra xwe bi kêr hat: PVVyê di demeke kurt de bi hikûmeta hindikahîyê ya lîberal û xiristîyanên demokrat re peymanek mohr kir.

Weke birayê xwe yê mezin ê li Kopenhagê, Partîya Gel (DF), ev ji parlemanê piranîyê dide hikûmetê da ku hikûmet bikaribe piranîya pêşnîyarên xwe li parlemanê bide qebûlkirin. Di berdêla vê de, Wilders hişkbûneke girîng di sîyaseta koçberî, entegrasyon û ewlekarîyê de bi dest xist. Bêhtir ne hewce ye: parlemanterên wî li pêş rêza tedbîrên neolîberal ên mijara civakî, ji bo "parastina" tenduristîya gelemperîyê, bûn asteng.

Wilders bi zarê rastgira radîkal a bakurî (welatên Skandînavyayê) dike û bi awayekî berfireh kîna li dijî Îslam û misilmanan bi hev re dimeşîne û her weha li dijî çepgira di nav profîleke civakî ya ku wê dike hevgira armancên sendîkayan û ... çepgiran, mafên civakî diparêze jî. Ev kombînasyon bi awayekî têra xwe aşkere salên 20î û 30î yên sedsala bihurî tînin bîra mirov.

Kiryarên mirovên nêzî wî jî dike ku mirov wisa bifikire. Bi tenê di çirîya paşî ya bihurî de, ji 24 parlemanterên PVVyê herî kêm heft, pirsgirêkên wan ên girîng bi polîs yan jî bi dadgerîyê re çêbûn. Ji ber bûyerên mirov dikare nû bihesibîne, kesî ji wan jî bawer nekir ku baş e ku lîderê xwe agahdar bike: çavtirsandina cîranan, şiddet, destdirêjîya cinsî, sextekarîya belgeyan, bi serxweşî ajotina maşînê, deynên zêde... Ev ne agahîyên kite bi kite ne, nexasim di partîyeke ku pesnê xwe bi gewdekirina prensîpa "*law and order*" (qanûn û nîzam) dide – û ku bi giştî doza du qatan zêdekirina cezayan dike.

Yekane kesê vê elîta neteweyê neqandî Geert Wilders, di destpêkê de bi dilnizmî reaksîyon nîşanî vê kombûna "gotegotan" da. Lê belê, gelek bi lez, ew dîsa hate ser xwe û banga nêçîra pîresêhran (çalakîya tepisandinê) kir. Ev refleks bi xwe jî dike ku rastgira radîkal a berê were bîra mirovan. Bê guman, ya "nû" bi rastî ji ya rabirdûyê qut nebûye...

* Nivîskarê gelek pirtûkên li ser rastgira radîkal a li Ewropayê û rojnamevanê kanala dewletê ya nûçeyan a holandî NOS.

1 Hevpeyvîna bi kanala televizyonê ya danîmakî DR2'yê re

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Li Belçîkayê nesîmetrîbûnên rasta nasnameyî

SERGE GOVAERT *

Li Belçîkayê rastgira radîkal -nexasim rastgira radîkal a nasnameyî- li gorî herêmên meliktîyê, rûyên ji hev cuda nîşan dide: Bakur, navend yan jî başûr.

Li welatê Flamanan daxwaza wê otonomîya miletekî flaman e yê ku li gor wê dewleta Belçîkayê ji nêzî du sed salan û vir ve taybetbûna wê û heta hebûna wê înkar dike. Li herêmên hilbijartinan ên flaman, serketineke nisbî bi dest xist: di hezîrana 2010ê de partîya herî mezin a rastgira radîkal Vlaams Belangê li vir hinekî bêhtirî %12ê dengan bi dest xist û ji 150 kursîyên Parlemana Federal jî 12 bi dest xistin. Berîya vê, heman partîyê di bin navê Vlaams Blokê de di hilbijartinên herêmî yên flaman ên sala 2004ê de gihiştibû rêjeya xwe ya dengan a herî bilind û zêdetirî % 24ê dengan bi dest xistibû. Serketina wê para bêhtir dikare bi bicihbûna wê ya di nav tevgereke azadîya siyasî de were ravekirin, tevgereke ku bi qasî Belçîkayê kevin e: tevgera flaman.

Li Brukselê –paytextê ku şênîyên wê para bêhtir fransîaxêv in yan jî qet nebe zimanê fransî weke zimanê danûstandinê bi kar tînin– û li Walonyayê rastgira radîkal ne xwedîya heman doza nasnameyî ye. Fransî demeke dirêj zimanê serdest ê meliktîyê bû û her du herêm jî –nisbî be jî– stareke dewlemendîya aborî bûn: ji destpêkê ve tu sedem nîne ku doza otonomîya siyasî bikin. Ji pêncî salan û vir ve rewş guherî, lê belê hisa girêdana bi Belçîkayeke yekbûyî re dewam dike. Ji xwe bi tenê beşeke marjînal a tevgera *walon* kete ser rêya sîyaseta rastgir. Lê belê li gorî xisletên hilbijartinê, li du (yan jî sê) beşan dabeşkirina welêt bi xwe, di pêşketina rastgira radîkal û ya rastgira populîst a belçîkî de xwedî roleke dîyarker e.

Li alîyê fransîaxêv (Bruksel jî di nav de), di hilbijartinên dawî yên federal ên hezîrana 2010ê de, piştî ku di dengdayînên herêmî yên hezîrana 2009ê de ji Parlemana Walon û ya Brukselê hatin maliştin, rastgira radîkal ji parlemanê derket. Em behsa Partîya Gel a ku sala 2009ê ji alîyê parêzerê kar Mischaël Modrikamen ve hat damezrandin, bikin. Vê partîyê di hilbijartinên 10ê hezîrana 2010ê de ango di hilbijartinên xwe yên pêşî de encameke hêja bi dest xist. Bi tenê yek parlamenter şand meclîsa federal û pirsgirêkên navxweyî ji niha ve wê ji hev dixin, yek ji van pirsgirêkan niqaşa li ser pirsa angajmana "belçîkî" yan jî "fransîaxêv" a partîyê ye.

Li alîyê flaman, ji ber îzolasyona xwe ya sîyasî –partîyên din wê li derveyî koalîsyonan dihêlin- û ji ber hevrikîya Nieuw-Vlaamse Alliantie (N-VA), Vlaams Belangê bandora xwe ji dest da. Ev partîya din a neteweperest a flaman N-VA bi awayekî zelal li baskê rastê yê siyasetê ye, belê xwe weke dijmina bîyanîyan nîşan nade. Ew hem fikrên sabît yên li dijî misilmanan yên Vlaams Belangê parve nake, hem jî di nav parlamenterên wê yên di meclîsa federal de hilbijartîyên bi eslê xwe ne ewropayî jî hene.

Ya rastî, li Belçîkayeke ku –bi zehmetîyên her diçe zêde dibin– du "gelan" ango belçîkî û flamanan tîne cem hev, rastgira radîkal jî bi awayekî mantîqî vê doza nasnameyî ya dualî dihewîne. Belê, navenda giranîya hilbijartinan a welatê flamanan li milê rastê yê sîyasetê ye, ya Walonyayê bêhtir li navend-çepê ye. Em behsa dengdarên Brukselê bikin. Dengdarên Brukselê hema hema bi rengekî wekhev di navbera van herdu alîyan de belav dibin. Pêşketinên sazûmanî yên darayî yek bi yek ji alîyê tevgera flaman ve bi zor û zehmetî hatin bidestxistin (1) bi krîza ku derb li Walonyayê û paşê paytextê xistî re, rastî hev hatin. Nexasim, piştî girtina kanên komirê û îflasa sektora hesin, krîzê tesîr li Walonyayê kir. Du dîyarde –pêşketinên li welatê flaman û krîza li Walonyayê– ku mumkin e ne bê peywendî bin. Ev jî sedema helwêstên dijberî hev e, yên li ser dosyayên mîna mafê dengdana bîyanîyên ne ewropayî di hilbijartinên herêmî de (bi zorê sala 2006ê hat bi dest xistin) yan jî qebûlkirin û legalkirina biyanîyên ku kaxizên wan ên fermî nînin. Xeta wan ji hev cuda dike jî mutleq nîne: rastgira lîberal a fransîaxêv weke mînak dixwaze ku sergirtina jinê were qedexekirin. Ya ku cudatîyên bandora rastgirên radîkal ên belçîkî rave dike, ji hebûna du rayên giştî yên ku weke ku ne mumkin e li hev bikin tên nîşandan bêhtir dîrokeke hevpar e: dîroka Belçîkayeke di krîzê de, ya ku her diçe bêhtir zehmet e mirov xwe pê îfade bike.

* Birêveberê Navenda Lêkolîn û Agahîyên Civakî-Sîyasî (CRISP, Bruksel).

1 Di dawiya sererastkirinên li ser hev a destûra bingehîn a Belçîkayê de, gelek erk û hêzên dewletê derbasî herêm û şaredariyên (welatê flamanan jî di nav de) welêt pêk tînin, bûn. Ev erk û hêz di qadên di warê siyasî de girîng yan jî nazik de ne; yên mîna kar, aborî, jîngeh– belê her weha istîhdama ziman yan jî serwerîsiya şaredariyan

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

### Ewropî, bi şerekî re ku ne yê wan e, rû bi rû man

# Almanya li pey statuyeke hêza mezin e

Philippe Leymarie *

Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur (NATO) siberoja xwe li Afxanistanê dîyar dike, li Afxanistana ku tevî hêzên mezin ên taqwîye yên amerîkî jî jê nayê xwe ferz bike. Ji civîna bilind a Lîzbonê û vir ve, di çirîya paşî ya bihurî de, NATOyê heta 2014ê mohlet daye xwe daku hêz û erkên xwe bide artêş û polîsê afxan.

Operasyona kevin "alîkarîya ji bo ewlekarîyê" veguherî ser şerekî rastîn ku li ba birêveber û raya giştî yên dewletên ewropî yên ku dixwazin "vekişin" fikaran çêdike. Niqaşa di derbareyê nûkirina meha bê ya erka yekîneya alman de – di koalîsyonê de sêyemîn hêza xurt e – îşaret bi pirsên manûnemanê dike...

*Em şok bûbûn. Me fêm kiribû ku ew tiştina vedişêrin. Tu tişt zelal nebû: hejmara mirîyan, cenazeyên veguhestî ...*" Bispora sîyaseta alman li Afxanistanê ya Înstîtûya Sîyaseta Navneteweyî û Ewlekarîyê (SWP), Citha Maass, di çarçoveya wezîfeyeke fermî de 4ê îlona 2009ê li Afxanistanê bû, ango dema ku yekî ji fermandarên yekîneya alman a di nav Hêza Navneteweyî ya Alîkarîya ji bo Ewlekarîyê (ISAF) de ji hêza hewayî ya NATOyê xwest du tankerên ku ji alîyê serhildêran ve hatine revandin, bombe bike. Efserê payebilind ji bo bidestxistina tankeran neçarîya çûna ji erdê wekî talûkeya jîyana eskerên alman nîşan da.

Ya ku jê re herweha "derba şaş a Kundûzê" tê gotin bû sedema mirina, piranîya wan sîvîl, sed û çil û du afxanan. Û îmaja ku Almanyayê dixwest bide jî hilweşand. Demeke dirêj alîyê eskerî yê angajmana wê hatibû mandelkirin. Ev alî weke "alîkarîya pêşketinê bi parastina çekdarî" hatibû nîşan dan, karûbarekî insanî û îdealîst ku tu peywendîya wî bi xizmeta şerê li dijî serhildêrîyê re nîne: bicihkirina demokrasîyeke rojavayî, azadkirina jinê, misogerkirina derfeta çûna dibistanê ji bo keçên ciwan, û hwd.

"*Şer li pişt perdeyeke insanî tê veşartin.*" Citha Maass bi bîr dixe ku malpera Wezareta Parastinê ya Alman bi serî ve mişt bû bi mijarên alîkarîya ji hikûmeta afxanî re dayî, belavkirina zad û qût, vegera malê ya penaberan; lê belê hema bêjin hîç behsa awayê li vî welatî ji nû ve misogerkirina ewlekarîyê nedihat kirin: "*Heta bûyera li Kundûzê qewimî, hikûmeta alman îmaja Afxanistaneke ku li gorî rastîyê, şadtir û erênîtir bû, derdixist pêş. Hikûmetê rewş bi peyvên dîplomatîk rave dikir bêyî ku kite bi kite behsa bûyeran bike.*" Salên 2009 û 2010ê ji anîna "îstîqrara" ku berê hatibû danezan dûr bûn, bi ser de jî, ji damezrandina ISAFê û vir ve, ango ji sala 2003ê û vir ve, salên herî bi şîddet û kujer bûn.

Bi civaka alman û her weha parlemanteran re hîsa ku hatibin xapandin, peyda bû. Ji bo aşkirina wan, lêkolîneke parlemanterî hat dest pê kirin. Berî ku di nav dojeha guhertineke koalîsyona hikûmetê de wenda bibe, wê kir ku wezîrê parastinê, cîhgirê wî û serokê fermandarîya giştî îstîfa bikin. Ji dema bûyî serokwezîr û vir ve, Angela Merkelê nîsana 2010î ji bo cara pêşî li ser asfalta balafirgehê pêşwazî li cenazeyên heft eskerên alman ên ku li Afxanistanê hatin kuştin kir. Û wê bi xwe jî di dawîyê de – bêyî dilê xwe – peyva "şer" bi lêv kir ku heta hingê tabû bû.

Redaktorê rojnameya alman a çepgir a Berlînê *Die Tageszeitung*ê (TAZ) (1) ya ku li ser rêya Rudi-Dutschke çend metroyan dûrî kevne-"Checkpoint Charlie"yê (2) bi cîh bûyî, Sven Hansen da zanîn ku "*Bi carekê em pê hisîyan ku fermandarê alman weke Ramboyekî tev digerîya. Berîya vê, amerîkî bi vî rolî radibûn: tu pêşî guleyan direşînî, paşê tu lêdikolî! Em yên baş bûn, yên ku ji nû ve ava dikin: pêşî tu dipirsî û bi tenê pişt re heke tehlûke ji bo jîyana te hebe, hingê tu hişyar dikî ku tu wê bersivên eskerî bidî...*"

Ev îmaja eskerên jinûveavaker, yên li herêmeke bakurê Afxanistanê bicihkirî, devera ku demeke dirêj weke nisbî ewle dihat dîtin, bi carekê zelûl bû. Dêrên alman ên ku dîsa jî zane û sergiran in, desteka ku didan hikûmetê qut kir. Kesayetîya herî darîçav a dêra protestan a alman, metrana jin Margot Kässmann di waezeke xwe ya dengvedayî de 1ê çileyê 2010ê got: "*tu tiştê baş li Afxanistanê nîne!* (3)" Hempîşeyê wê yê katolîk, metranê Freiburgê Robert Zollitsch, banga guhertineke sîyasetê kir ku "*bi awirê exlaqê xirîstîyanî, mecbûrî ye*". Ji çend salan û vir ve, ji xwe, piştî vegera keşeyên eskerî ji Afxanistanê, şahidî û niqaşên li zanîngeh, li NGOyan û li dêran qat bi qat zêde bûn, jihevdûrbûna armancên fermî ya angajmana Almanyayê û rastîya wê piştrast kirin.

Êşeke dijwar xwe li vê rewşê zêde kir: di tebaxa 2010ê de malpera înternetê *Wikileaksê* di derbareyê hevkarîya elemanên hêza taybet a alman digel yekîneyeke amerîkî de aşkere kirin ku armanca vê yekîneya amerîkî tunekirina kadroyên Talîbanê ye, ango kuştina wan yan jî bêyî biryareke dadgehê girtina wan e. Li gorî kovara heftane ya sereke a alman *Der Spiegel*ê, artêşa alman (Bundeswehr) lîderên Talîbanê yên ku wê bi xwe hilbijartî li lîsteya xwe ya mirovên divê werin kuştin, zêde kiribû.

Li Wezareta karên derve, mirov bawerîyê pê didin ku ev wezîfeya hêzên taybet li raya giştî aşkere bû û bi niqaşên pir caran li parlemanê hatin kirin, mîsyon zelal û şefaf bû. Lê belê, ji bo kevneberdevkê Die Grünen (Partîya Keskan) Winfried Nachtwei ku bi xwe jî bisporê Afxanistanê ye, van aşkerekirinan hê nû "*ya ku mirov nabe lê mikur were*" ya eleqedarî vê angajmanê piştrast kir, ev angajmana ku ew weke "*bêwate*" bi nav dike û dibêje ku tu peywendîya wê bi ewlekarîya Almanyayê re nîne. Ew bi xemgînî dibêje ku di vê pirsgirêkê de, "*mirov berîya her tiştî pê dizanin ku nizanin*".

Avahîya zexim a li nava Berlînê, Bendlerblock, cihê ku serfermandarîya hêzên deryayî di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de lê bi cîh bûyî, îroj Wezareta Federal a Parastinê dihewîne: efserên payebilind li wir êrîşek amade kiribûn ya ku hindik mabû 20ê tîrmeha 1944ê Hîtler bikuje; Albay Klaus Graf von Stauffenberg û plankerên din ên êrîşê li wir jî hatin kuştin. Kulta dîyarî van fîgurên eskerî (yên kêmdîtî), yên ku berxwedana li dijî nazîsmê kir, xwe weha nîşan dide ku hîmê demokratîk yê artêşa nû (Bundeswehr) ya ku sala 1954ê bi destûr – kontrola – Hêzên Hevgirtî û Bundestagê (Parlamentoya Almanyayê) hat damezrandin, ji bo ku ruh û sîya Wehrmachtê (Artêşa Împeratorîya Alman) ji ser xwe bavêje.

Efserê pêşwazîya me kir, bê zehmetî qebûl kir (4) : ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn û vir ve ev yekem car e ku hewqas mirov bi navbeynkarîya artêşa alman tên kuştin. Wekî din, fermandarîya yekîneya Bundeswehrê yekemîn hêz bû ku bi rengekî ciddî rêzikên nû yên angajmanê bin pê kirin, yên ku fermandarê hingê yê ISAFê general Stanley McChrystal hê nû derxistibûn daku pêşîyê li zerara li sivîlan dibe, bigire. (5)

Lê bêhtirî piştî salekê, li Bendlerblockê mirov tercih dikin ku mijarê bi awayekî "erênî" nîşan bidin: ev bûyer û aşkerekirin qet nebe piştrast dikin ku eskerên alman – ku ji salan û vir ve ji ber lawazîya xwe ya beşdarbûna di pratîkê de dihatin rexnekirin – bi tevahî tev li şerên li herêmên bakur ên Afxanistanê dibin, û ji ber vê jî, serhildêrên Talîbanê dorê li wan digirin. Di sibata 2010ê de, li ser daxwaza lezgîn a amerîkîyan, Berlînê qebûl kir ku 500 eskerên din bişîne Afxanistanê. Bi vî rengî, cihê xwe weke sêyemîn yekîneya mezin a di koalîsyonê de (5200 esker) parast. Hêza herî xurt di koalîsyonê de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne (100 000 esker), paşê Meliktîya Yekbûyî tê (10 000) û hêza Fransayê (3850 esker) piştî ya Almanyayê tê.

Bêhtirî 400 esker û 200 polîsan, karê wan ê yekane ew e ku hêzên afxan perwerde bikin. Kredîyên eskerî li gor berê du caran hatin zêdekirin û sîleh û alavên eskerî ji bo ku bikaribin li hemberî tehlûkeyê bisekinin, hatin adaptekirin: makîneyên zirxî, teqwîyeya topan, peredana bi balafirên bêpîlot. Efserek pê pesnê xwe dide "*li gorî min alavên eskerên alman li Afxanistanê di nav yên heyî de yên herî baş in*" û îşaret pê dike ku Bundeswehr di operasyonan de aktorekî sihê ye. Û ji bilî sînorekî, ew li gorî heman rêzikên angajmanê, şer dike: herêma wezîfeyê ya ku danê û parlemana alman erê kirî, bakurê Afxanistanê dimîne. (6)

Efserê em pêre hevpeyvînê dikin ji ber vê yekê bêhtir li "*şaşjihevfêmkirina*" di navbera artêş û civaka alman de poşman e, tevî ku ji bo vî efserî di ketina nava şerekî de ku êdî nav lê tê kirin, pirs "*qebûlkirina* [ji alîyê sîyasetvanan û raya giştî ve] *asteke guncaw a şiddetê*" ye.

Li Wezareta karên derve, dîplomatek dengvedana mezin a trajedîya Kundûzê li Almanyayê li ber reaksîyona rayedarên herêmî yên afxan girt. Reaksîyona wan bêhtir bi kêrî Almanyayê dihat. Li gorî wan, di çarçoveya neewlekarîyeke zêde de, esker normal tev gerîyabûn. Dîplomat dide zanîn ku "tezmînata" ji mexdûrên bombekirinê re – serê malbatê 5 000 euro, li gorî standartên NATOyê – ji tebaxa 2010ê ve hatîye dayîn. Ew bi israr îşaret pê dike ku ev alîkarî gaveke bi dilê Almanyayê ye û ne ferzeke huqûqî ye; ew vê tazmînatê berîya her tiştî weke "*bêşekî şînê yê li gor rêûresma herêmî*" nîşan dide.

Afxanistan û krîza aborî ferz dikin ku ji sala 2011ê û pê ve, Bundeswehr wê serûbinîhevbûnên herî mezin ên hebûna xwe ya pêncî û pênc salan bibîne. Rapora komîsyona Weise ku serokê Ajansa Kar a Federal serokatîya wê dike, weha behsa Bundeswehrê dike: "*sazîyeke îdarî, ya ku li gor encamên bidestketî, zêdeyî hedê xwe mezin û buha ye*" û jê nayê ku wezîfeyên xwe bi cîh bîne. (7) Li gorî texmîna Înstîtûya Alman a Lêkolîna Aborî (DIW) buhayê salane yê rastî yê wezîfeya li Afxanistanê – li şûna yek milyar euroya li butçeyê qeydkirî (8) – sê milyar euro ne, ango di navbera 2001 û 2013ê, destpêka muhtemel a vekişînê de mîqdara fatoreya lêçûnan wê 36 milyar euro be.

Di nav fikaran de li alîyekî yên aborî, li alîyê din yên eskerî, dilê wezîrê parastinê yê federal Karl-Theodor zu Guttenberg, yê ku Merkel pişta wî digire, heye ku hejmara yekîneyên dikarin rehet werin organîzekirin du caran li berê zêde bike û hejmara eskerên heyî jî ji sê paran parekê kêm bike (wê hejmara eskeran daxîne 180 000î). Bi betalkirina eskerîya mecbûrî ya ku artêşa alman ji damezirandina xwe ango 1955ê û vir ve xwe dispêre ew, wezîr dixwaze vê yekê di pratîkê de pêk bîne. Lîberal, partîya keskan û çep li ser betalkirina qanûna eskerîya mecbûrî li hev dikin. Ev eskerîya mecbûrî (ji dema dirêjahîya wê daxistî şeş mehan û vir ve), di warê eskerî de gelekî newekhev û bê bandor e. Lê belê Demokratên Xirîstîyan (CDU) û Xirîstîyanên Bavarîyayê (CSU) yên ku di kongreyên xwe yên di çirîya pêşî û çirîya paşî ya 2010ê de ev mijar nîqaş kirin, bi giranî terciha xwe ji bo parastina xizmeteke sîvîl a berfirehtir kir, ku wê ji tîrmeha bê û pê ve bikeve şûna eskerîya mecbûrî.

Artêşa alman ji bo ku demokrat û pasîfîst be û ji"eskerên welatî" pêk were hatibû plankirin û, di destpêkê de, bi serê xwe nehatibû hiştin. Berîya 1990ê Komara Federal a Almanyayê (BRD) û Almanyaya Rojhilat bi tevahî serbixwe nebûn, tev li operasyonên navneteweyî yên ku navê "aştîyê" li wan dihat kirin, nedibûn. 2ê çirîya pêşî ya sala 1990ê, piştî ku dîwarê Berlînê hilweşîya, hevdîtineke "4+2" (9) bi peymaneke yekbûnê û qebûlkirina serxwebûnê bi encam bû. Li gor destûra bingehîn a Almanyaya Rojava, ku xwe li ser Almanyaya yekbûyî ferz kir, tevahîya wezîfeyên eskerî yên li derveyî welêt divê ji alîyê parlemanê ve werin erêkirin, ev rewş berevajî qaîdeya li gelek welatan e (Fransa jî di nav de). Her biryara girîng – weke nûkirina dema wezîfeyê – vediguhere "*canbazîyeke xurt a sîyaseta hundir*" ku bi qebûlkirina rêze-sînordarîyan bi dawî dibe û ev yek jî digihîje wê astê ku bi eskeran re hîseke weha ku birêvebirên sîyasî li pişt wan ne yekgirtî ne, peyda bibe. (10) Wekî din, Bundeswehr bi şev û roj ji alîyê komîserekî parlemanter ê hêzên çekdar ve tê şopandin: parleman bi dengdayîna veşartî ji bo pênc salan vî komîserî hildibijêre, komîser nabe ku parlemanter an jî karmendê dewletê be û qet nabe ku esker jî be; ew "*li gorî parastina mafên bingehîn û weke organê alîkar ê Bundestagê ji bo pêkanîna kontrolê*" tê neqandin.

Hikûmeta alman neçar ma ku şert û mercan biafirîne ji bo ku wezîfedarkirinekê li derveyî Ewropayê û derveyî herêmên desttêwerdana xwezayî yên NATOyeke ku ji dema jiholêrabûna dijmina sovyetî ve îdîa dike "bê sînor" e, bi raya giştî hêdî hêdî bide qebûlkirin. Ji ber vê, yekemîn beşdarîya wezîfeyên navneteweyî ya Almanyayê sala 1993ê bi awayê xizmeta tendiristîyê li Kamboçyayê bû. Piştre sala 1994ê dîsa di çarçoveya insanî de.

Derbasbûna bi rastî "*ji çandeke xwe ji bikaranîna hêzê vedide*" (11) sala 1999ê pêk hat, bi biryara serokwezîrê sosyal-demokrat Gerhard Schröder a beşdarbûna di operasyonên li dijî Sirbîstanê û şerê Kosovayê de: guleya pêşî hat teqandin. Piştî êrîşên îlona 2001ê, di "şerê li dijî terorê" de bi damezrandina ISAFê re ya sala 2003ê, Almanyayê pişta amerîkîyan girt. Welatê yekbûyî yê ji "*rewşa îstîsnayî ya dîrokî ya serbixwenebûnê*" (12) derketî û aktorekî mezin ê aborî, êdî dest bi doza "rewşa xwe ya normal" kir û ev jî bi xêra nifşekî nû yê birêvebiran qewimî yê ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji dayik bûn û ji bona wan "*karê bibîranîna serdema nazîyan [nabe] êdî li ser dika navneteweyî Almanyayê asteng bike*".

Ji hingê ve Bundeswehrê ji bo destwerdanên derveyî welêt ji xwe re daxwazeke ji dil peyda kir: li Kongoyê (2006), li Çadê (2007) yan jî li Okyanûsa Hindê li dijî rêberên deryayî yê Somalîyê (ji 2008an û vir ve). Lê belê ev operasyon timî dema wan û herêma wan sînordarkirî bûn, çarçoveya wan ji alîyê parlemanê bi baldarî hatibû dîyarkirin, bi awirekî piştgirîya navneteweyî û jinûveavakirina piştî şerî hatin birêvebirin, tu pêwendîya wan bi ewlekarîya neteweyî ya alman re nehat danîn û dema hatin birêvebirin bikaranîna sîlehan bi parastina personelê xwe sînordar dikir.

Weke li deverên din ên Ewropayê (nivîsa di çarçoveyê de bixwînin), li Almanyayê jî raya giştî ji argumana dibêje azadîya we li wir, li ser çîyayên Afxanîstanê dîyar dibe, hestyar nîne. Kevneserokê binkomîsyona parastinê ya Parlemana Ewropayê Carl Von Wogau (CDU) ji xwe dipirse "*Em çima îroj bimînin?*" Tevî ku partîzanê desttêwerdana rojavayê ye jî, ev serkêşê dîplomasîya ewropayî îdîa dike ku "*dijminê me terorîzma navneteweyî ye, ne talîban in. Ev karekî eskerî nîne, lê belê karê polîsan e.*" Dema ku ew vê dibêje, ew bi bîr dixe ka çawa berê li Kosovayê jî kiribû, Almanya bi armanca misogerkirina bîstiqrarkirina Afxanistanê angaje bûye: polîs, dadgerî, perwerdeyê ... li pêş digire.

Lê belê xelkê Almanyayê di cih de bi pirsgirêka Balkanan hesîya û ji bo pêşîlêgirtina li komkujîyên li ser erdên welatekî ewropayî, bi pêwîstîya angajmaneke eskerî jî hisîya. Li hemberî vê Afxanistan dûr e. Ji xwe, "daneqebûlkirina" angajmanên li Afrîkayê –Kongo, Çad– zehmet bû. Bi tenê operasyona li dijî rêbirên deryayî li Okyanûsa Hindê xwedîyên xisletên îdeal xuya dikir: mexdûrên sîvîl nînin; şerekî di navbera "profesyonelan" de ye (rêbir li dijî eskeran); parastina rêyên bazirganîyê (wezîfeyeke tenduristîya gelemperîyê); çalakîyeke piralî û hwd.

Li gorî Hansen stratejîya niha jî xirab e: bêhtir esker hene û rewş xirabtir dibe. Lê belê gelo li wir stratejîyeke din hebû? Ev rojnamevan – kevneparêzvanê dunyaya sêyemîn û dijberê eskerîyê – dibêje serê wî tevlîhev e, weke ya redaksyona rojnameya wî û weha ji xwe dipirse: "*desttêwerdana heyî tu tiştê hêja bi ser nexist. Êdî? Em ê afxanan perwerde bikin û biçin? Lê belê heke NATO ji welêt veqete, hindik tiştê mayî jî gelo wê ji hev nekeve?*"

Weke piranîya hempîşeyên xwe yên Ewropayî, Merkel jî bi awayekî zelal dest nîşan dike ku "*li Afxanistanê şer ji bo ewlekarîya Almanyayê û mafên mirovan tê kirin.*" Dîplomatek li gotinên Merkelê zêde dike: "*li Almanyayê heta îroj bextê me xweş bû. Lê belê êrîş li Londra û Madrîdê pêk hatin ...* " û hebûna çil neteweyan di nav koalîsyona ÎSAFê de derdixe pêş "*hemû dunya li wir e.*" Ew her weha dibêje, êdî daxwaza ku "*Afxanistanê veguherînin Swîsreyeke nû*" nemaye.

Kesên me bi wan re hevpeyvîn pêk anîn, bi bîr dixin ku tesîra şerê li Afxanistanê li tevahîya Asyaya Navîn dibe. Lewra, ne ji ber xetên lûleyên petrolê yan jî maddeyên xam, lê belê ji ber ku "*li vê herêma erda wê nazik, xalên biîstqrarkirinê gelekî girîng in*", alîyekî pirsgirêkê yê jeopolîtîk heye. Li gorî kesekî me hevpeyvîn pê re çêkir, sedema alîkarîyeke demdirêj ev e: ji salên 1970yî û vir ve Almanyayê bi sê rasthatinan polîsê afxan perwerde kir. Di salên 1960î de vî welatî para herî mezin ji alîkarîya almanan digirt. Ew îroj dîsa dibe welatê ku herî zêde alîkarîya almanan digire... (13)

Têkilîya alman û afxanan xwedî dîrokeke nêzî sed salan e. Sala 1919ê melikê Afxanistanê alîkarîya kevne-împaratorîya alman kiribû daku piştî şkestinê ji tecrîda dîplomatîk xilas bibe. Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Hîtler –ê ku afxan ji bo wî arî bûn– hewl da vî welatî ji bo di ser brîtanîyan re biqevêze, bi kar bîne. Berevajîya vê jî qewimî; Almanyaya Rojava penaberên ku ji dagirkerîya sovyetan revîyabûn hewandin, û xwendekaran xwe li dibistanên Almanyaya Rojhilat qeyd kir. Lîseya German Amani ya li Kabûlê –ku hevrikîya sazîyên fransî û tirkan dike– şahidîya vê nêzîkatîya ji mêj ve dike û li ser bextê kesên me hevpeyvîn bi wan re kirî be; afxan wê tu carî almanan weke dagirkerên sovyet yan jî amerîkî nebînin. Şoka piştî Kundûzê wê gelekî bêhtir bi kelecan bûya heke raya giştî pê bihesaya ka "eskerên pêşketinê" yên dilnerm li welatekî dost çiqasî weke şervanên dirinde tev digerin.

Ev pirs bi rola aşkerekeran rabûn, weke ku Afxanistanê alîkarî dabe Almanyayê daku di çavên xwe de normal bibe: gelo ji bo vî neteweyê yekbûyî ku hê jî hêzeke mezin a aborîyê mumkin e ku di nav "qambosteke sîyasî" de bihewe yê ku weke mînak artêşa wî bi zorê xwe dide qebûlkirin? Ji ber ku serokkomar Horst Köhler di gulana 2010ê de, piştî ku ji serdaneke yekîneyên li Afxanistanê bicihkirî vegerîya, îdîa kir ku welatê wî jî divê "*bi awayekî eskerî berjewendîyên xwe, azadîya bazirganîyê û bihevguherînê biparêze*" di nav hevalên xwe de jî, bû sedema skandalekê. Piştî ku wezîr Karl Theodor Zu Guttenberg li ber wî rabû û got "*berjewendîyên aborî sedemeke ji bo rewakirina wezîfedarkirina eskeran a li Afxanistanê pêk nayîne*" serokkomar Köhler terciha îstîfayê kir.

Piştî trajedîya Kundûzê, serokkomar karê şikandina wê neynikê bi dawî anî, ew neynika ku van salên dawîyê îmaja Almanyayeke çi xwezayî, çi jî ji ber pêwîstîya pasîfîst, jinûveavaker û insanî nîşan dida. Köhler bawerî pê da ku şaş hatîye fêmkirin: wî çêl li beşdarbûyîna alman a di operasyona ewropayî Atalantayê ya ji bo ewlekirina çûnûhatina deryayî ya li Okyanûsa Hindê de kiribû û ne li angajmana li Afxanistanê. Lê belê êdî dereng bû, Cîtha Maass weha şirove dike: "*li Almanyayê, mirov nebaniyane ku li gor berjewendîyên neteweyî bipeyivin. Di van deh salên dawîyê de ev niqaş jî dabû alîyekî.*"

Niha, berê awirên herkesî zivîrîne ser mohleta derbasbûna 28ê sibata 2011ê, ev dem îşaret bi dawîya dema wezîfeya heyî ya Bundeswehrê di nav ISAFê de dike. Tevî ku lihevbûna li parlemanê di asteke kêm de be jî, bê guman wê ji hikûmetê were vê mohletê dirêj bike. Bi tenê Die Linke –kevnekomunîst û çepa sosyalîst– doza tavilê vekişandina eskerên alman kir. Lê belê di sibata 2012ê de, heke rewş neguherîbe, destûra dirêjkirina mohleta wezîfeya eskerên alman li Afxanistanê misoger nîne. Derdorên fireh ên keskan, sosyal demokrasîyê, her weha xirîstîyanên demokrat jî dibe ku derbasî alîyê "dijber" bibin. Maass weha dinirxîne: "*êdî bi tenê ji bo ku dilê amerîkîyan xweş bikin û piştî êrîşên li dijî bircên New Yorkê şertê piştgirîyê yê NATOyê pêk bînin, em hew dikarin li Afxanistanê şer bikin. Ji bo almanekî tu sedema ferzkar nîne ku ji bo 'Afxanistanê bimire.*"

*Rojnamevan, nivîskarê bloga *Défense en ligne [Parastina li ser xetê]*

1 Ev rojname her meh versiyona bi almanî ya Le Monde Diplomatique'ê diweşîne

2 "Checkpoint Charlie" di serdema dîwarê Berlînê de deriyê sînor ê herî navdar bû li bajêr. Hezîrana sala 1990ê ji hev hat xistin û ji hingê ve ji bo tûrîstan yek ji wan deveran e ku divê were dîtin

3 Piştî ku dema serxweş ´erebe diajot hat girtin, sibata 2010ê Kässmann neçar hat hiştin ku îstîfa bike

4 Weke kesê em li Wezareta karên derve pê re axivîn, wî jî xwest ku navê wî neyê aşkere kirin

5 Erka General Stanley McChrystal hezîrana 2010ê hat betalkirin û şûna wî general David Petraeus şûna wî hat wezîfedarkirin. Binihêrin li "Afghanistan: ave Petraeus!" [Afxanistan: silav li te Petraeus!], Défense en ligne, Les blogs du Diplo, 25ê hezîrana 2010an

6 Veguhastina eskeran ber bi herêmên din ve ji bo demeke diyarkirî bi destûra wezîrê parastinê, bêyî şêwirîna bi parlemanê jî dibe

7 Weke mînak, ji bo her eskerê li cihê cih veguhêzin devereke dûr, 35 esker û 16 sîvîl divên. Wezaret bi xwe jî li ser hivdeh birêvebiriyan dabeşkirî ye û ev birêvebirî jî gelek caran dikevin ser hev. Binihêrin li TTU-Lettre d'informations stratégiques et de défense [TTU-Nameya agahdariyên stratejîk û parastinê], hejmar 775, 2'ê çiriya pêşî ya 2010ê

8 Di nav vê mîqdarê de ev mesref jî hene: lêçûnên ku wezaretên din digrin ser xwe, dermankirin û tezmînkirina birîndaran, alîkariya bi malbatan re û hwd

9 Peymana ku jê re dibêjin "4 + 2" ya ku îlona 1990êli Moskvayê di navbera Almanyaya Rojava, Almanyaya Rojhilat, Fransa, Yekîtiya Sovyetan, Brîtanyaya Mezin û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de hate mohr kirin, Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi dawî anî û ji bo yekbûna her du Almanyayan jî şêrtê pêşî bû. Li gorî vê peymanê Almanyaya nû destê xwe ji sîlehên nukleer dikişîne û sînorên xwe jî weke "nabe ku biguherin" qebûl dike

10 Binihêrin li Markus Kaim, "L'engagement militaire allemand" [angajmana eskerî ya alman], Notes du Cerfa, hejmar 76, tîrmeha 2010ê

11 Jacques-Pierre Gougeon, "L'Allemagne, nouvelle puissance" [Almanya, hêza nû], Le Monde, 5ê -çiriya pêşî ya 2010ê

12 Heinrich August Winkler, Histoire de l'Allemagne, XIXe, XXe siècle. Le long chemin vers l'Occident [Dîroka Almanyayê, sedsalên 19 û 20ê: rêya dirêj a ber bi Rojavayê ve], Fayard, Parîs, 2005

13 Krediyên hevkariya sîvîl li gor berê du caran zêdê bûn, salê ji nîv milyar euroyî dibihurin

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



RODI KHALIL: **Xewn I**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 60 x 60 cm

# Cîhaneke din mumkin e

LAURENT CORDONNIER

Serge Latouche nepêşketinê weke armanceke zelal dibîne û ew di berhema xwe ya dawîn de derbasî qada dumahîkê dibe: keşifkirina "*çêkirina medenîyeteke xwînsar û herweha hêzeke miqayitê xwe ku bikaribe li pêşîya neçarîya civakeke di pêşvajoya mezinbûnê de bibe alternatîf*". (1) Ji aborîya mezêxer ya "baş" ku Arnaud Berthoud dibîne, herweha bi alîkarîya nêrînên Ivan Illich û Jean-Pierre Dupuis, Cornelius Castoriadis û Andre Gorz, çêkirina sazîyeke xeyalên din şekil digire, bi hêz dibe û bawerîyê dide. Lê belê, eger em bifikirin ku nêrîn cihanê bi rê ve dibin, wê demê, ji bo destpêkê, divê em xwe li gorî asta Hobbesî tenzîm bikin, daku em bikaribin utopîya wî ya xerab (ku piştre bûye ya me hemûyan) careke din bidin pêşxistin. Li gorî Latouche, ev "*Dilê cemidî yê xeyalên aborîya klasîk e*" û Arnaud Berthoud vê utopîyê weha bi bîr dixe: "*Divê kes ji nişka ve xwe bi kesên din ve girênede û jiyana xwe ya mezêxer mîna karekî pir taybetî an tenê bike, ku ew bi tiştên xwezayê re were girêdan.* (2)" Eger girêdana bi "*çêkirina civakên aborîyê yên xweser û dost, hem li Bakur û li Başûr*", ji niha ve weke karekî pir pêwîst were dîtin, wê demê tenê lazim e ku em "aborîya giştî" û şiklên sazîyên vê merheleya piştî pêşxistina, ku Latouche belkî zêde bi ecele, tîne ziman, bibînin.

Sazkirina "modeleke aborîyê" ya civakeke ji mezinbûnê dûrketî: ev çend sal in ku Jean Gadrey li ser vî karê girîng dixebite (3). Berhema wî ya dawîyê weke kurteşiroveya xebatên wî hatiye nivîsandin. Nêrîna ku mezinbûna aborîyê hê jî tiştekî baş e (her çend ev bi tena serê xwe nabe encamek jî), lewra ku ew dikare pirsgirêkên me yên sereke (bêkarî, bersivdana pêwîstîyên teqawutîyê, kêmasîyên xercên girseyî, newekhevî) çareser bike, weke dereweke jehrî tê îspatkirin. Bi van gotinan, aborînas dixwaze bêje ku alternatîf hene û ew bi tenê nayên maneya kêmbûna nirxa lêzêdekirî an xebatê: "*Hemû tişt vê bawerîyê dide mirov ku, di dehan salên pêşîya me de, wê pêwîstî bi hêza "milan" û ya serîyan hebe daku em bikaribin li mirovahîyê xwedî derkevin, dev ji bikaranîna enerjîyên fosîl berdin, ji bo pêşerojeke baş bingehê amade bikin û têxin xizmeta mirovahîyê*". Divê li ser xebatên mezinbûneke baş û bi kalîte were sekinandin. Divê ev hewl tenê di warê aborîyê de nebin, herweha di warê rewşa civakî û ya jîngehê de jî pêwîstî bi wan heye. Dema ku bi vî awayî bê dîtin, hingê dê mezinbûneke bi kalîte çêbibe.

Di rastîyê de çareserî di destê me de ye: bêyî ku em li zêdetir sa´etên kar ên karkeran bigerin û herweha xwezayê xerab bikin, divê mezinbûna aborîyê bi rêya pêşxistina kalîteyê were bidestxistin, Bêguman ev jî zêdetir kedê dixwaze. Lê belê di vir de pirsgirêk ew e ku çawa were kirin daku "dewlemendîya bêmezinbûn" (4) venegere aborîyeke di bin zextê de? Di vê xalê de nivîskar dikare bêje ku, niha gog li ba aborînasên Keynesî ye.

Thomas Coutrot jî dibêje ku, ji bo "aborîyeke di rastîyê de aborî" (5), guhertin û pêşxistina sazûmankarîyê tiştekî pêwîst e. Gavên herî girîng ku dikarin ji van guhertinan re rêberîyê bikin, demokrasî ye. Ew balê dikişîne ser gotinên Tocqueville -"*gelo weha bawer dikin ku, piştî xirabkirina sîstema feodal û zorbirina axa û began, wê demokrasî li ber derê burjuva û dewlemendan bisekine?*"- Coutrot li vê derê binê "demokrasîya aktîv" xet dike û dibêje, divê ev demokrasî bi hêz be daku ew bikaribe karê civakê koordîne bike, li pêşiya kiryarên xirab yên dewletê û herweha yên fînansa kapîtal, ku biryarên wê yên polîtîk bi rewşa aboriyê ve hatine girêdan, bibe asteng. Di qada pêşxistina aborî û herweha fînansekirinê de divê "demokrasîya aktîv" cihê rêveberîya hikûmetên ku ji alîyê partîyên alîgir ve pêk tên bigire (memûr, mezêxer, xebatkar, hilbijêr….)

"*Li vê derê, bêyî ku peymaneke civakî hebe, demokrasîyeke berwar, bi serê xwe nikare ji pêwîstîyên civakî re bibe bersiv. Koordînasyoneke dînamîk ya civaka sivîl dikare dewletê jî demokratîze û herweha bazarê jî sosyalîze bike (ne bi zextê). Ji bo ku ev xala dawîn pêk were, guhertinên sazîyên dewletê pir pêwîst in: Demokratîzekirina xizmetên civakî, kontrolkirina civakî ya fîrmayan (...), agahdarîyeke baş û serbixwe di derbareyê berên civakî û jîngehê de, sîstemeke vekirî û aşkere di derbareyê buha û qîmetan de, siyaseteke civakî ya aktîv di derbareyê bazara pere, bac, bûdçe û krêdîyê de lazim e. Herweha divê planeke neteweyî ya aborî jî hebe ku karê sermayedanê di warê sektorî û herweha herêmî de, baştir were kirin. Dîsa, pêwîstî bi mekanîzmeyeke weha heye ku di derbareyê sermayedana aborîyê de biryaran bide*". Nivîskar "utopiyeke realîst" derdibire û dibêje ku, heta ku em bi awayekî zanistî û haydar li ser rewşa xwe nesekinin, em nikarin zêde sedem û rastî û nerastîya van nêrînan niqaş bikin.

1 Serge Latouche, *Sortir de la société de consommation. Les liens qui libèrent [Azadbûna ji Civaka Mezêxer, Girêdanên ku Mirovî jê Azad Dikin]*, Parîs, 2010, 221 rûpel, 18 euro

2 Arnaud Berthoud, *Une philosophie de la consommation. Agent économique et sujet moral [Felsefeyeke Mezêxer. Kiryara Aborî û Kirdeya Moral]*, Presses universitaires du Septentrion, Villeneuve-d'Ascq, 2005

3 Jean Gadrey, *Adieu à la croissance. Bien vivre dans un monde solidaire [Bi Xatirê Te Mezinbûna Aborî. Jiyana Xweş di Nav Cîhaneke Hevkar de]*, Les petits matins / Alternatives économiques, Parîs, 2010, 189 rûpel, 15 euro

4 Mîna sernivîsa pirtûka Tim Jackson, De Boeck, 2010

5 Thomas Coutrot, *Jalons vers un monde possible. Redonner des racines à la démocratie [Ber bi Cîhaneke Mumkin ve. Vedana Rehên Demokrasîyê]*, Le bord de l'eau, Lormont, 2010, 226 rûpel, 16 euro

Wergera ji fransî: Ahmet Dere



Îlon 1978

# Neteweyekî parçebûyî: Zor û zehmetiyên têkoşîna gelê kurd

SÉLIM TURQUIÉ *

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Di vê hejmarê de jî me cardin ji arşîva Le Monde diplomatique du nivîsên Sélim Turquié ku di tebaxa 1977ê de hatine weşandin, hilbijartin û me xwest em pêşkêşî xwendevanên xwe bikin.

Nivîsek ji wan şîroveya du pirtûkan dike: Pirtûka "Kurd û Kurdistan" ku ji aliyê zanayê kurd Îsmet Şerîf Vanlî ve hatiye nivîsandin û du cildên din ku di nav weşanên "Gesellschaft für bedrohte Völker- (GfbV)" de hatibûne derxistin. Di hin cîldên pirtûkê de gotarên gelek nivîskarên din jî hene. Nivîskar, behsa Vanlî û Kendal Nezan dike ku li ser Kurd û Kurdistan bi nivîsên xwe yên balkêş beşdar bûne.

Nivîskar, pirtûkeke din a bi navê "Iraqa Nû û Pirsgirêka Kurd" dide nasandin ku ew jî ji aliyê nûnerê Iraqê yê UNESCOyê Aziz el-Hajj ve hatiye nivîsandin û li gor Turquié, helwêsta pirtûkê û helwêsta Baasî mîna hev in. Nivîskarê pirtûkê Aziz el-Hajj, bi xwe yek ji rayedarên Partiya Komunîst a Iraqê bûye. Pirtûk tevgera kurdan li Iraqê mîna hevkarên împeryalîzmê nîşan dide.

Nivîseke din ya Sélim Turquié jî, li ser peymana di nav Bexda û Tehranê de ye. Di vê nivîsê de Turquié balê dikşîne ser wehşeta dewleta Iraqê û dide xuyakirin ka çi qetlîam kirine, kurdan çawa sirgun kirine û mafên wan binpê kirine. Di vê demê de tevgera kurd têk çûye û tu serhildan û şer jî tuneye. Lê dîsa jî dewleta Baasî derfeta jiyanê nade kurdan û bi alikariya Îranê rê li ber wan digire, nefî û qetil dike.

Di vê dema ku serhildana kurd careke din zindî dibe de, pirtûkeke bi navê *Kurd û Kurdistan* (1) derketîye û tevahîya dîroka gelê ku hejmara wî ji 17 mîlyon kesan zêdetir e tîne bîra me.

Qedera vî gelî ecêb e! Piranîya gelên ku di bin bandora Osmanîyan de bûn, pir zû mafê serxwebûna xwe bi dest xistin, lê belê ne vî gelî. Digel her tiştî, çawa ku Maxime Rodinson di nivîsa pêşîn ya berhemê de dibêje *"Ha ji we re gelekî pir taybet, yê ku bi zimanê xwe ê zelal diaxive (..), yê ku li ser axeke yekpar dijî, yê ku bi çandeke xas hatîye mezinkirin, yê ku di nav xwe de tu carî asîmîlasyon qebûl nekirîye, yê ku bi hezaran caran tespît kirîye ku ew neteweyî ye û civakeke neteweyî ye"*...Îro gelê kurd di nav çar dewletan de hatîye parçekirin, li Tirkîyeyê ew % 23.8, li Îranê %16, li Iraqê %28 û li Sûrîyeyê jî %11ê nifûsê pêk tîne.

*Kurd û Kurdistan* berhemeke hevbeş e, ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatîye nivîsîn. Ev koma rewşenbîran li ser dîrokê lêkolînê dike û rewşa heyî ya kêmneteweyan û herweha ya kêmneteweyên belavbûyî dinirxîne. Ligel nasname û zanabûna neteweyî ya van kêmneteweyan, xaleke wan a din ku hevbeş e jî; ew hemû xwedîyên rastîyekê ne ku ji alîyê gelên bindest ve hatine bindestkirin. Ev "dagirkerîya xizanan" ku li dijî wan tê bikaranîn, li gorî gotinên parêzerê kurd [Ismet Şerîf] Vanly, ji hemû dagirkerîyan xirabtir e. Ji ber ku ev dagirkerî weke "pirsgirêka hundirîn" ya van welatên cîhana sêyem hatîye bi nav kirin: sempatîya navneteweyî ya li dora pirsgirêka kurd heyî, di vê rewşê de zêde encameke baş bi dest naxe.

Çima gelo, digel giringîya hejmara xwe, kurdan nikaribû dewleteke serbixwe, weke hemû cîranên xwe, damezirînin? Nivîskarê kurd Kendal [Nezan] bersiveke baş dide vê pirsê û vê yekê bi nirxandina xwe ya derbareyê rewşa fîzîkî ya Kurdistanê ve girêdide –welatekî di nav çîyayan de tenê hatî hiştin, paşmayî û tu derîyên wî ên li ser behrê vebibe tune– û bi taybetî rewşa civakî (eşîrî) ya gelê kurd û her weha paşvemayîna wî ya îdeolojîk û safîya siyasî ya rêveberîya wî bûne sedem ku ew nikaribe ji xwe re dewleteke serbixwe ava bike. Ev rewşa wî bûye sedem ku pir hêz jê re xayîntîyê bikin, pişta xwe bidin wê û bibin amûrên ku hêzên serhildanên vî gelî werin pelçiqandin. Zexta ku li dijî vî gelî hatîye bi kar anîn pir dijwar bûye û xwîn rijandîye. Di navbera 1925 û 1938ê de yek mîlyon û nîv kurd li Tirkîyeyê hatine qetilkirin û koçberkirin. Li Îranê ev zext hêdî hatîye meşandin, lê belê asta wê dijwartir bûye. Di her alîyê de li dijî gelê kurd zexta rojane hatîye meşandin, di jîyana wî ya rojane de hertim koçberî hebûye û ew bûye hedefa siyasetên asîmîlekirina çandî û ya zimanî jî.

Pirtûk dîqeteke taybet dikişîne ser kurdên Iraqê û tevgerên berxwedanê ku ji sala 1961ê vir ve li vî welatî hatine dest pê kirine. Bandora şer ji dewlemendîya petrola Kurdistanê ye, ku parçeyê mezin ya petrola Iraqê ye û %53,6 hatina giştî ya dewletê ku ew jî ji %72 tîcareta derve ya welat, zêdetir e. Têkoşînê hin encam dane, ji ber ku kurd tenê li Iraqê weke "netewe" tên naskirin û li wê derê, di prensîpê de, mafê wan ê "otonomîyê" heye. Hebûna şer jî bi nasnekirina vê otonomîyê ve girêdayî ye -heman rastî îro jî heye- û kurd dixwazin ku ev otonomî li ser esasê "herêman" were naskirin. Wateya vî şerê dawî yê li gorî modela navneteweyî bû ku ji alîyê Kissinger ve dihate birêvebirin. Roja 6ê adara 1975ê, di hizûra serok Boumedieneyî de, Îran û Îraq hatibûn cem hev (C.I.A. di kûlîsan de baş kar kiribû) û wan têkçûna tevgera Mela [Mistefa] Barzanî îmze kiribûn. Careke din hate dîtin ku, dema pirsgirêka kêmneteweyan dibe mijara gotinê, nakokîyên di navbera rejîma "pêşketî" û ya "şûndemayî" de ji holê radibin û ew hêzên xwe dikin yek. Heman senaryo di demên bihurî de jî pêk hatibû, di sala 1932ê de, şahê Îranê alîkarîya xwe li ser kurdan birî û pişt re jî artêşa tirk ket nav axa Îranê daku kurdên berxwedêr bipelçiqîne. Weha jî bû, artêşa tirk gihîşt armanca xwe.

Pirtûkeke din, *Îraqa Nû û Pirsgirêka Kurd* (2), nêrîna rejîma Baasî ya li ser pirsgirêkê xuya dike. Nivîskarê wê, Aziz el-Hajj e, ew îro li UNESCOyê nûnerîya Îraqê dike û yek ji rayedarên Partîya Komûnîst a Îraqê ye. Heman partîyê dev ji armanca xwe ya pêşxistina têkoşînê berdabû û bi rejîmê re li hev kiribû, ji ber vê helwêsta xwe jî, li pêşberî girseyan rexne li xwe girtibû. Pirtûka wî, ya ku bi rengên marksîst hatîye nexşkirin, weke rastîyeke sîyaseta hikûmeta wî ye. Ew balê dikişîne ser helwêsta rêveberîya tevgera Barzanî û dibêje, di 11ê adara 1971ê de, dema ku biryara di derbareyê otonomîya Kurdistanê de dihate nîqaşkirin, vê tevgerê rola xwe baş nelîstîye û xwe daye kêleka emperyalîzmê û xwestîye careke din li dijî rejîma pêşketî ya Îraqê, ku di demeke kurt de nifta xwe girtîye bin kontrola xwe, şer bike. Eger bi rastî Barzanî hem bi Amerîkayê re û hem jî bi Îranê re hevkarî kiribe, gelê kurd bi buhayekî mezin cefayê ew kişandîye. Aziz el-Hajj nabêje ku herêma otonom tenê dike % 51ê axa Kurdistana Îraqê (ew li vê derê herêmên giring ên niftê di nav axa Kurdistana otonom de hesab nake). Tê zanîn ku biryara 11ê adara 1971ê, ya di derbareyê Kerkûkê de, tu car neketîye merîyetê û miqabilê wê, kurd ji wê herêmê hatine koçberkirin daku girseyên ereb werin li wê derê bi cih bibin. Li gorî Aziz el-Hajj, ev weke tedbîrekê hatîye girtin daku "bîyanî nikaribin derbasî nava Iraqê bibin".

Weha dîyar e ku careke din wê pirsgirêka kurd bibe mijara nîqaşan. Pirtûkên ku di van demên nêz de hatine weşandin, bi taybetî ya *Kurd û Kurdistan*, rewşê bi şêweyekî dîrokî dinirxînin û balê dikişînin ser pirsgirêkê. Lê belê, dema ku mirov kêmasîyên tevgera kurd, ên ku di demên nêz de hatine jîyîn, digire ber çavan, divê em cudahîyê bixin navbera daxwaza gel a ji bo serbixwebûnê û daxwaza rêveberîya sîyasî ya vê tevgerê. Digel her tiştî jî, bi rastî, divê êdî pirsgirêka kurd nebe haceteke şerê di navbera çê û xiraban de.

*Rojnamevan û romannivîsê lubnanî

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

RODI KHALIL: **Şewqa evînê II**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 70 x 50 cm

# Piştî peymana di navbera Bexda û Tehranê de

**Yekîtîya Xwendevanên Kurdistanê li Fransayê ji me re nameyeke dirêj î pir biwate şand û em jî diweşînin:**

*Hikûmeta yekem ya Partîya Ba´as, ku bingehê xwe ji darbeya leşkerî ya 8ê sibata 1963yê digire û ji alîyê general Hesen el Bekir ve dihate birêveberin - yê ku niha serokê dewletê, serokwezîr û her weha serleşkerê bilind û hwd. e – bûye qatilê bi kêmanî 3 hezar komunîstên îraqî, ku di nav wan de hemû endamên buroya siyasî û komîteya navendî jî hebûn. Em li ser mijarên wehşeta ku di dema kampanyaya li Kurdistanê hat meşandin de nasekinin, herweha ne li ser dardekirinên gelê cihû, ne li ser qurbanên ku di odeyên işkenceyên Qesr el Nihayayê (Qesra Dawîn), ne jî li ser cezayên ku li hin rayedarên payebilind ên Ba´asî (Hardane Takriti, Nazim Kazar û hwd.) ku nakokîyên wan bi rêveberên partîyê re hebûn, nasekinin. Ev hemû di rabirdûyê de man. Li vê derê em ê li ser rewşa nuha, bi taybetî jî li ser kiryarên ku di nav du salên bihurî de li Kurdistana Iraqê pêk hatine bisekinin.*

*Em dizanin ku di adara 1975ê de, piştî peymana ku di navbera şahê Îranê û Seddam Hisên (cîgirê serokê Iraqê) de pêk hat, ku wê demê serokatîya tevgera kurd jî ji hev ketibû, berxwedana leşkerî ya li Kurdistanê helîyabû. Ev rewşa hanê, ne encama 14 salên şerê di navbera tevgera kurd û dewleta Iraqê de bû. Lewra rayedarên îraqî ji vê rewşê sûd wergirtin daku herêmên kurdan, ên li ser sînorê Tirkîyeyê, Sûrîyeyê û Îranê, herweha deverên wekî Kerkûk û Xaneqînê, ku petrol pir lê heye û ji bo kurdan stratejîk in, vala bikin û kurdên li wan deran ji cihên wan rakin. Derbareyê hejmara kesên ku hatine koçberkirin cur be cur nêrîn hene, li gor hin nêrînan hejmara wan di navbera 200 û 500 hezaran de ye.*

*Girseyên ku hatine koçberkirin, di kampên çola Diwanîya û Nassirîyeyê de, kom bi kom hatine bicihkirin û li wan deran, bi darê zorê kar bi wan tên kirin. Li gor wezîrê ragihandinê Tariq ´Ezîz, kurdên ku hatine koçberkirin "li dijî gelê Iraqê û li dijî serxwebûna dewleta Iraqê sûcekî mezin kirine, lewra divê ew cezayê xwe bikişînin" (Financial Times, 14 tîrmeh 1975).*
*Di vê demê de, hejmara kesên ku têne koçberkirin ewqas zêde bûye ku kampên berê têrê nakin, lewra rayedarên îraqî, yek li herêma El-Rifaîyê, ya din jî li herêma Souq-El-Coukhê, ku nêzîkî Nassirîyeyê, 2 kampên din çêkirine.*

*Koçberkirina sîstematîk ya kurdan bûye sedem ku Kurdistana Îraqê vala bibe û lewra hikûmeta Bexdayê şûna wan li heman deveran eşîretên ´ereb, yên ji başûrê Îraqê û her weha yên ji Misrê bi cih dike. Şûna navên bi kurdî navine bi erebî li gund û bajarên kurdan têne kirin. Her weha, bajarê herî kevin yê kurdan Kerkûk êdî di zimanê fermî de weke El Ta´amin tê bi nav kirin. Bajarên din jî bi navên weke Haifa, Jaffa, El-Quds û hwd têne naskirin. Li her devereke Kurdistanê, cihên stratejîk weke wargehên kontrolkirina girseyan têne ava kirin.*

*Di nav du salên dawîyê de, bi sedan kes hatine dardekirin, lê belê tu kes nikare hejmareke giştî û rast bide. Li gor rapora salane ya Amnesty Internationalê ku derbareyê sala 1976ê hatîye nivîsandin, "Îraq yek ji welatên Rojhilata Navîn e ku herî pir mafên mirovan bin pê dike".*

*Di dawîya sala 1976ê de, termên 244 kurdên ji herêma Silêmanîyê, ku bûbûn qurbanên komkujîyekê, di nav asîdê de hatine helandin. Di hejmara 21ê sibata 1977ê ya Times a Londrayê de, hin agahî derbareyê vê komkujî û kiryara hovane de hatine weşandin. Roja 29ê kanûna 1976ê, piştî ku artêşa îraqî agahî digire ku komeke partîzanên kurd hatine gundê Şarestenê, leşker bi ser heman gundî de digirin û bi bahaneya ku gundî alîkarîya partîzanan dikin, li wê derê qasî 100 sivîlan dikujin. Di nav kesên ku hatî kuştin de nêzîkî 30 xwendevanên dibistanê, ên di navbera 6-14 salî de jî hene.*

*Di sibata bihurî de, vê carê civaka şi´î –ku li Îraqê xwedîya hejmara herî zêde ye- li dijî cezayên dardekirinê û cefayê ku ji ber bawermendîya xwe dikişîne, rabû ser xwe. Di dema van serhildanan de êrişî gelek qereqolên polîsan hatin kirin, pir bînayên dewletê ji alîyê girseyê ve hatin hilweşandin. Ji ber van serhildanan, bi armanca dadgehkirina şi´îyan, dadgeheke taybet hat çêkirin, ku serokatîya wê ji alîyê 3 endamên Konseya Birêvebirina Îraqê û her weha rêveberîya Herêmî pêk dihat. Hukmê dadgehê bû 8 cezayên dardekirinê û 15 cezayên muebedê. Ev biryara dadgehê ji alîyê rêveberên Bexdayê ve kêm hate dîtin û ji ber vê sedemê wan hevalên xwe ên Konseya Birêvebirina Îraqê li dijî şoreşê wekî sûcdar tawanbar kirin.*

*Mînakeke din derbareyê van kiryarên komkujîyan: di navbera 11ê adar û 4ê nîsana bihurî de, 39 kurd hatine dardekirin. Piştî biryareke bilez, roja 11ê adarê, dadgeha Mûsilê cezayê îdamê da 6 kurdên helebceyî û ew di heman rojê de hatin dardekirin. Piştî deh rojan, roja cejna neteweyî ya kurdan, 15 kurd li Silêmanîyê hatin dardekirin, bêyî ku tawanbarîya – Tenzîmkirina Tevgera Terorîst – li ser wan bê îsbat kirin. Roja 1ê nîsanê, 8 Kurd, ku di nav wan de zarokekî 12 salî û her weha jinek jî hebû, bi gunehkarîya ku alîkarîya partîzanan kirine, hatin dardekirin. Roja 4ê nîsanê, dadgeheke Kerkûkê cezayê mûebedê da 10 ciwanên kurd. Ev ciwanên han bi "amadekarîyên ji bo kuştina walîyê Silêmanîyê" hatibûn tawanbar kirin. Ev walî dijî û tiştek jî pê nehatîye. Ji ber ku dadgehê nikaribû sûcê van ciwanan tesbît bike, ew bi "fikirandina di derbareyê terorîzmê de" hatin tawanbar kirin û darde kirin.*

*Li vê derê em dixwazin dawîyê li rêzkirina bûyeran bînin. Eger hikûmeta Bexdayê van kiryaran înkar bike, em ji wê dixwazin ku ew rê bide delegasyonên Neteweyên Yekbûyî, Amnesty International û her weha ya Federasyona Navneteweyî ya Mafên Mirovan daku li Îraqê û li Kurdistana Îraqê bigerin. Ji alîyê xwe ve, em dibêjin ku, eger seredanên delegasyonên van sazîyan pêk werin, em dikarin hemû agahîyên xwe ji wan re aşkere bikin daku li ber raya giştî ya cihanê, qedrê gelê kurd bê zanîn. Her weha li vê çavkanîyê jî binêrin: Fîksîyona Xweserîya li Kurdistana Iraqê.*

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

RODI KHALIL: **Jin û lawir**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 90 x 65 cm

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

## Rodi Khalil

Rodi Khalil, di sala 1973'yan de li Tel Hadat a Sûriyê hatiye dinyayê. Dibistana navîn, li bajarê Al Hassaka û zanîngeh jî li Şamê qedandiye. Khalil, li Zanîngeha Şamê beşê mîmariya hundirîn, hunêr û dekorasyon xwendiye. Rodi, li Sûriyeyê yek ji wan kesên bênasname ye. Ji ber ku ne xwedî nasnameyeke fermî bûye nikariye dîplomaya zanîngehê bigre.

Rodi Khalil, bingeha hunera xwe li ser bedewiya çanda kurd daye rûniştandin û nexasim peyxama xwe zêdetir ji efsaneyan digire.

Di wêneyên xwe de, ji aliyekî ve cîh dide alozî, zext û birçîbûnê û ji aliyê din ve jî li ser babetên wek aşitî û evînê disekine. Di berhemên Khalil de, meriv dikare bi hêsanî remz û şîfreyên çandên Mezopotamya, Asûriyan û Medan bibîne.

Hunermend Rodi Khalil, her-weha karê dekorasyonê yê fîlman jî dike. Heta niha li gelek welatên cuda yên wek Ûkrayna, Kuweyt, Îngiltere, DYA, Tirkiye û Holandayê tev li pêşangehên şexsî û karma bûye. Rodi Khalil, li bajarê Almanya, li Bremenê dijî û xebatên xwe yên hunerî li vî bajarî didomîne.

Ji bo zêdetir agahî:
www.rodi-khalil.de

# Çîn û Kore

PHILIPPE PONS *

Rewşa awarte ya leşkerî ya di nîvgirava Koreyê de heyî, gihîştîye asteke çetin û stratejîk. Di piştperdeyê de, şerê 1953yê yê di navbera Komara Gel û Demokratîk ya Koreyê û Çînê û hêzên Neteweyên Yekbûyî de -ji alîyê Amerîkayê birêvebirî- heye, ku tenê bi agirbestekê bi dawî hat. (1) Ji wê demê û vir de, tu peymaneke aştîyê nehatîye îmze kirin.

Çiqas cihê meraqê bibe jî, Koreya Bakur dixwaze bi Dewletên Yekbûyî re ku pêwîst bibe, bi rêya nîşandana tankan jî, bikeve dîyalogê. Ev dîyalog wê jê re tenê nebe sedemê xweparastinê û herweha hacetê tunekirina ambargoya li dijî wê, lê herweha wê bibe sedemê ku ew xwe ji bin bandora Çînê jî azad bike.

Bûyera roja 23ê mijdarê (november), Pyongyang giraveke piçûk a ji Koreya Başûr, ku ji sînorên wê çar kîlometre dûr e û di nav Deryaya Zer de ye (xelkê sivîl jî di nav de, çar mirî û derdora panzdeh birîndar), rewşa şerê muhtemel a nîvgiravê nîşan dike. Serdestîya li ser vê herêma deryayê, li kêleka çemê Han, ji alîyê Bakur ve nayê qebûlkirin, ji ber ku wê tu car sînorên ku di sala 1953ê de, ji alîyê Neteweyên Yekbûyî ve hatine xet kirin, nas nekirîye. Dê were zanîn ku, di wê demê de ew ne endama vê rêxistinê bû. Di dema ceribandinên şer, yên di sala 1999, 2002 û 2009ê de leşkerên her du welatan jî hatibûn kuştin. Lê belê, ev cara yekem e ku girava Yongpyong, herêmeke leşkerî û herweha sivîl jî lê dijîn, bûye hedef. Li gor Komara Gel û Demokratîk ya Koreyê (KGDK), heman êrişa mijara gotinê, di encama "provokasyona" Başûr de çêbûye. Di her awayî de, divê em vê jî not bikin ku, bi taybetî li gor nêrînên bisporê japonî Haruki Wada, ê ku di derbareyê pirsgirêkên Koreyê de kar dike û herweha profesorê zanîngeha Tokyoyê ye, ev êrişa li dijî girseya sîvîl wê bibe sedemê ku, ji vir û bi şûn de, çawa ku ji sala 2000ê vir ve bi hev re dijîn, êdî ev her du hêzên leşkerî wê nikaribin li kêleka hev bimînin.

Piştî ku bisporê amerîkî Siegfried Hecker, ê di warê nukleer de kar dike, hatîye KGDKê û li wê derê xwestîye karê ji bo dewlemendkirina ûranyûmê bide meşandin, ev bombebaran pêk hatîye. Em nizanin ka ev hewldan hê jî hene an ne, digel daxûyanîyên Pyongyangê – tê zanîn ku heman hewldan bûne bingeha sedemên ku KGDK du ceribandinên nukleerî, di sala 2006 û 2009ê de, pêk bîne. Pyongyang xwedî pir armancan e: bidestxistina çekên tunekirinê û hêza guftugokirinê, û herweha ew dixwaze bi vî awayî teknolojîya xwe jî bide firotin. Bi aşkerekirina hewldanên xwe, ên di derbarê karê nukleer de, ev rejîm dixwaze buhayê tunekirina hêzên xwe ên nûklêer zêde bike.

Rewşa li Pyongyangê bi me dide xuyan ku, rêveberîya Kim Jong-Un, kurê Kim Jong-il, dixwaze diyar bike ku ew rengê xwe dide rejîmê: Dewletek ji alîyê malbatekê ve tê bi rêve birin, (Kim Jong-il jî, di sala 1994ê de, desthilatdarî ji bavê xwe Kim il-Sung wergirtibû). Gelo ev her du bûyer bi hev ve girêdayî ne? Gelo armanca vê êrişê ew bû ku artêş dîwarê derdora xwe qayîmtir bike? Vê gavê, ji ber helwêsta neyênî ya pergala Koreya Bakur, agahîyên çavdêran tenê bi spekûlasyonan bisînor in.

Digel her tiştî jî, wusa dixuye ku, di pişt perdeyê de, sedemên vê rewşa awarte hebûna pirsgirêkên aborî ne û ew xwedîya roleke mezin e: tenêkirina welat û ambargoya navneteweyî bûne sedemên xirabûna rewşa aborî ya welat; herweha, ev rewşa xirab ya aborîyê bûye sedemê ku rejîm nikaribe li ser pirsgirêkên aborî û civakî bibe otorîte û xwe ji bin bandora Çînê azad bike. Di stratejîya ku ji alîyê Pyongyangê ve tê teqîp kirin de pir armanc hene.

Berîya her tiştî, armanca KGDKê ew e ku bala rêveberîya Obama, ya ku heya niha armanca wê ew bû ku, li dijî KGDKê hêza xwe ya "sebirkirina stratejîk" raber bike. Ev rastî pir caran ji devê sekretera dewletê Hillary Clinton jî derketîye. Bi gotineke din: heya ku Pyongyang berpirsyarîyên xwe negire ser xwe û hebûna çekên xwe ên nukleer qebûl neke, rêveberîya Obama naxwaze tu înîsyatîvê bigire. (2) Sedema duyem jî ew e ku, heman rêveberî dixwaze derdên xwe ên hundirîn derman bike.

Hemû armanca Kim Jung-Un ew e ku, çi di nav hêza partîyê de û çi jî di nav artêşê de -ew bûye generalekî çarstêrkî- piştî Kim Jong-Il bikaribe berdewamîya rejîmê biparêze. Dumahîkeke bi tevahî sembolîk: pir zehmet e ku em bêjin wê ev ciwanê 27 salî bikaribe, weke bavê xwe û bapîrê xwe, rejîmê bi serê xwe bi rê ve bibe. Di rewşeke wusa de, diyar e ku wê rêveberî dîsa ji alîyê hêzeke ji malbata Kim pêk were, bi taybetî apê wî Chang Song-Taek, "di nav rêveberîyê de xwedî cihê duyem e" serokê komisyona parastina neteweyî ye (organa bilind ya welat). Herweha, di nav rêveberîyê de wê kesên taybet ên ku li dijî Japonyayê di nav têkoşînê de cih girtine jî bibin xwedî cihên girîng. (3) Di rewşeke wusa de, divê rejîm di nav xwe de bihêz be, da ku ew bikaribe welêt di pêvajoya veguhertinê de bi rê ve bibe. Rejîmê sînoreke demê ji xwe re diyar kirîye: 2012, tarîxa sedemîn (100.) rojbûna Kim Il-Sung e, bi vî awayî ew dixwazin îmaja "welatekî dewlemend û xurt" diyar bikin.

Digel giranîya pêşketina cîranê wê Çînê, welat tenê di qada informatîk û pergalên nûmerîk de pêşketineke piçûk dijî û aborîya wî jî baş nîne. Di sala 2010ê de, li gorî texmînên Bankeya Koreyê, (Seûl), pêşketina aborî ji % -0,9 bû. Ji ber sedemên rewşa xirab ya çandinîyê û herweha hebûna pirsgirêkên rêxistinîya çandinîyê, KGDK wê di sala 2010-2011ê de weke salên bihûrî ji çandinîyê encamê bigire (yek mîlyon ton genim). Ji 23 mîlyon kesan, 6 mîlyon li benda alîkarîya navneteweyî ne. Lê belê, ji ber sedemên hebûna pirsgirêkên tanzîmî, ji wan 6 mîlyon kesan, tenê mîlyonek û nîv kes dikarin ji heman alîkarîya navneteweyî sûdê werbigirin. Yên mayî, li benda alîkarîya Çînê ne, lê belê tu kes nizane ka ev alîkarî çiqas e. Di vî warî de rewş baş nîne, ji bo hinekan jî pir xirab e. Kêmasîya zexîrê li ser qada tendurustîyê jî bandor kirîye, derman û derfetên din ên nexweşxaneyan pir kêm in.

KGDKê tu cara xwe ji felaketa dawîya salên 1990î xilas nekirîye. Piştî rewşa sekinandî ya dawîya salên 1980yî, ew ji alîyê derewên rayedarên Sovyetê û yên Çînê ve hate xapandin, ji hilweşandina Sovyetê bi şûn de jî, ew careke din ji alîyê rayedarên Pekînê ve şaş hat agahdar kirin. Ji ber kêmasîya enerjîyê, kargeh hêdî dixebitîn û herweha, ji ber kêmasîyên derfetên pîşesazîyê, di xebatên cotkarîyê de jî paşketin çêbû. Di sala 1994ê de, Kim Jong-Il berpirsyarîya welatekî di nav rewşeke pir xirab de hilgirt ser xwe. Ev neçarîya di warê aborî de û herweha lê felaketên xwezayî jî zêde bûn, di salên 1995 û 1998ê de bû sedemê birçîbûneke mezin. Hejmara kesên ku jiyana xwe ji dest dan gihîşt şeş sed hezar (600 000) heya mîlyonekê. Vê rewşê li pişt xwe bîranîneke civakî ya xirab hişt. Ev felaket bû sedem ku bawerîya rejîmê bi xwe ya ku ew bikaribe bersivê bide daxwazên girseyan, bişkê.

Bi awayekî aşkere, ev weke rewşeke ku nayê guhertin tê xûyan. Lê belê KGDK ya 2011ê weke ya 1994ê nîne. Birçîbûn û dumahîka wê, derî ji bûyerên civakî ên kûr re vekir. Ji neçarîyê, aborîyeke nerast (bazara reş) bi pêş ket. (4) Bi riya vê bazarê wan xwest pêşî li têkçûna pergalê bigirin, lê belê ev rewş bû sedem ku bazara reş bibe aborîya asayî û di paralelê ya dewletê re bimeşe.

Vê rewşê bi awayekî pir neyênî bandor li ser rayedarên Koreya Bakur kir: nêrînên biyanî ên di derbareyê rêveberîya civakê de zêdetir bi bandor bûn. Rewşa welêt bû sedemê ku, bi hejmareke mezin, girseyên gel ber bi Çînê ve biçin. Ne ku bi armanca li wê derê bibin penaberên siyasî, lê sedemê vê çûyîna girseyî birçîbûn bû. Piranîya van penaberan, hinek ji wan bi riza xwe, hinek ji wan jî bi darê zorê, careke din vedigerîyan KGDKê. Ev penaberîya girseyî, bû sedem ku di sînorê Çînê de karê qaçaxîyê bi pêş bikeve û herweha, di derbareyê rewşa rejîmê de agahî belav bibin. Heya wê demê, dîwarê ku di navbera cîhana derve û jiyana hundirê welêt de heyî, weke pergaleke kontrolkirina civakê dihat bi kar anîn. Digel pir tedbîrên ku di sînor de hatin girtin, dîsa jî hejmara kesên ku derbasî Çînê dibin her ku diçe zêdetir dibe. Bi vê rewşê ve girêdayî, dram tên jiyîn, herweha bi hejmareke mezin jin dikevin nav jiyana xirab, xwe difiroşin. Telefonên Çînê ku li her du alîyên sînor kar dikin, ji bo hatin û çûyîna qaçaxan weke hacet têne bi kar anîn. Di alîyê din de, li herêmên Koreya Bakur, ên li ser sînorên Çînê televîzyonên çînî dikarin werin temaşekirin, lê belê ev dikare bibe sedemê cezayê zîndanê jî. Di destpêkê de, rejîm dixwaze hewl bide, da ku ew bikaribe, bi alîkarîya reformên tîrmeha 2002an, aborîya bazarê careke din bigire bin kontrola xwe. Ew dixwaze serbestîya buhayan, ya destheqan, ya pere, ya aborîyê û herweha xweserîya ji bo pîşesazîyê çêbike. Ji ber sedemên nebûna bazirganîya dîrekt, (pergala hevpar ya civakî li welêt dihat meşandin) pere zêde nehatîye bi kar anîn, piranîya pêdivîyên gel bi riya kûponan dihatin kirîn û firotin. Heya destpêka salên 1990î jî, KGDK welatekî lê herî kêm pere dihat xerc kirin bû.

Rakirina parçeyî ya pergala kûponan, li gor pêdivîyên malbatekê, di jiyana rojane de guhertinên mezin çêkirine. Li gorî nêrînên Ruediger Frank, *(5) "Bûyera ku bihêle buha(nirx/fiyet) bibin bingehê pêşwazîkirinê û nêzîkatîya ku qebûlkirina daxwazan raber dike ne karê dewletê ye"* ev weke pêşketineke bingehîn e. Di teorîyê de, hê jî dewlet buhayan (fiyetan) kontrol dike, lê belê…ev li gor rewşa bazarê ye. Bi awayeke fermî, rejîm formûla *"reformên pergalê"* qebûl nake, bi zimanekî siyasî ew dixwaze vê yekê weke *"reformên hundirîn yên pergalê"* diyar bike. Bi vî awayî ew dixwaze hebûna *"aborîya bazarê"* qebûl bike. Tevî ku pergal ji sala 1948an û vir ve, bi damezrandina KGDKê re, hebe jî, van reformên dawîyê bandoreke bisînor li ser aborîyê çêkirîye.

Di mêjîyê rêveberan de, divê ev reform baş pêk werin, da ku ew bikaribin ji derve kapîtalê bikişînin welêt û herweha tecrubeyê bi dest xin; bi taybetî di derbareyê têkilîyên bi Amerîkayê re, ku ev hêz di qada aborî ya navneteweyî de xwedîya dengê vetoyê ye (FMI, Bankaya Cîhanê û Bankaya Pêşvebirina Asyayê) û bi Japonyayê re (dema ku têkilî bi KGDKê re çêbibin ev welat wê zerarên şer bide). Ev hêvî ji alîyê krîza nukleer, ku di sala 2002ê de ji alîyê George W. Bush ve hate dest pê kirin, asteng bûn. Di wê demê de karê dewlemendkirina nukleer hê di vî welatî de nedihat meşandin.

Vebûna Çînê li cîhana derve bi kêfxweşî hate pêşwazî kirin, lê belê ya KGDKê weke parçeyekî leystokê hate dîtin. Bê têkilîya bi derve re, reformên aborî nikarin bi ser kevin. Miqabilî vê rewşê, li gorî dîroknasê rûs Andrei Lankov, pirsgirêkên civakî yên ku li vî welatî hene, weke parçeyek ji *"mirina xwezayî ya stalînîzmê"* (6) ne, hêdî hêdî li pêş dikeve lê ne bêbandor e.

Rejîm di nav tirsê de ye ku ew kontrola pêşketinên civakî-aborî winda bike, lewra ew hewl dide ku çalakîyên „aborîya duyem" bipelçiqîne, piştre jî têxe bin bandora xwe. Ji 2005ê bi şûn de rejîmê xwest aborîya dewletê zindî bike, lewra, bi cur bi cur derfetan, wê cesaret da karê bazirganîyê. Herweha, di pergala belavkirina alîkarîya girseyî de jî hin guhertin çêkirin. Armanca vê ew bû ku, kesên pir xizan birçî nemînin. Pê ve girêdayî, rejîmê qedexe kir ku jin û mêrên ji 50 salî piçûktir di nav karê bazarê de cih bigirin, da ku ew neçar bin di kargehên dewletê de bimînin. Lê belê ev biryar negihîşt armanca xwe, li gor anketeke sala 2008ê, ku di nav penaberên Koreya Bakur ku li Başûr dimînin de hatîye çêkirin, piranîya şênîyên welêt di nav karê bazarê de cih digirin. (7)

Gelo ev ceribandina ji nû ve kontrolkirinê tê wateya vegera ber bi paş ve? Bê guman, ev tê wateya ku rejîm dixwaze pêşketina civakê bigire bin kontrola xwe. Digel her tiştî, jî hewldanên rejîmê nikaribûn ji pêşketinan re bibin asteng. (8) Ji nû ve binavkirina wonê, di qanûna 2009ê de, ku buhayê wê bi sedî hate parve kirin (woneke nû, dike sed wonên berê), yek ji tedbîrên bi xwastek e ku di dema dawî de pêk hatîye. Armanca wê, şikandina bandora enflasyonê bû. Ev biryar bû sedemê xirakirina pergala dovîzan ku hin bazirganan ji xwe re çêkiribûn. (reqamek hatibû diyar kirin ku her kes li gor wê bikaribe pere biguherîne). Lê belê, piştî demeke tevlihev, rejîm neçar ma ku ji aborîya paralel re derî vebike, ev jî bû sedem ku aborîya legal û îlegal bi pêş bikeve.

Cîhana civakê ya binerd, di dîroka KGDKê de, dibe bûyera herî giring ya dema Kim Jong-Ilê yekem. Bê guman rejîm kontrola welêt di destê xwe de digire, li gor penaberan, hemû nerazîbûnên li dijî wê, bi riya hêza polîsan tên bin pê kirin. Girtîbûna welêt, hişmendîya ku di nav civakê de hatî pêş xistin û utopîya îdeolojîk bi xwe re welatparêzîyeke teng, li ser esasê qewmîyetê jî afirandîye û nahêle di demeke kurt de, tu guhertineke bingehîn çêbibe. Ev rastî ji alîyê gelek dîroknasan (9) ve jî tê gotin. Bê ku ev rejîma totalîter ji prensîbên xwe dûr bikeve, bi riya pir çalakîyan wê di nav civakê de welatparêzîya etnîkî pêş xistîye. Ev rewş bûye sedem ku pergal ji ya stalînîzmê tevlihevtir be, tevî ku ew hê jî di hin alîyan de di bin bandora wê de be.

Pyongyangê xwe xistîye ser riya veguhertinê da ku di aborîya bazarê de pêşketin çêbibin bê ku ji bo azadkirina siyasetê destûrê bide. Ev rewş jî bûye sedemê ku kadroyên partîyê, burokrat, memûrên dewletê û hîyerarşîya leşkerî -bi awayekî din, elîtên welêt- dewlemend bibin. Di heman demê de qadeke din ya civakê çêdibe: navbênkar, bazirganên piçûk, kesên ku pere bi deyn didin, kesên ku di navbera hêza siyasî û ya aborî de navbenkarîyê dikin… Li kêleka newekhevîyên bihurî (di navbera rayedaran û gel de), niha jî di nav gel de qadeke nû ya civakî çêdibe, ev qada nû, li gor atmosferê ji xwe re cih çêdike, dixwaze di nav beşên civakê, yên xwedî taybetmendîyan de -û bingeha xwe ji dema bihurî digirin- bibe hêz.

Heya dawîya salên 1980yî, welêt pêşketineke giranbûha, di derbareyê karê bingehîn de, çêkiribû. (10) Gel jiyaneke asayî û wekhev dijî, lê ne elît. Piştî „salên reş" ên birçîbûnê, li Pyongyangê û li herêmên derdora wê, cama welêt û nakokîyên di navbera qadên civakê de, her ku çûn zêdetir aşkere bûn.

Ji alîyekî ve, beşeke civakê bi awayekî pir cuda mesrefan dike, (bi taybetî telefonên destan, digel ku ew tenê di nav sînorên welêt de têne bi kar anîn, baleke mezin kişîyaye ser wan û zêde têne firotin); ji alîyê din ve, piranîya gel di nav çetinahîyan de dijî. Di sûkên girtî de, derên ku her kes dikare bikevê, tiştên ku firotina wan serbest e, ji destan têne revandin (markeyên çînî, ên japonî û yên Koreya Başûr, herweha zexîre). Derên wusa hertim tije ne. Lê belê, divê pere hebe. Di kolanan de, li dora çarçîyan bi kêr hinekê kêmtir in. Di herêmên çiyayî de, gel bi hêza destê xwe dijî, di zevîyan de kar dikin, riyên xwe bi xwe çêdikin, di destê wan de tevir û bêr, bi keviran xanîyan çêdikin…

Ev aborîya duyem dikare encamên xirab derxîne holê, rejîma ku dixwaze temenê xwe dirêj bike, dikare di ser vê qada aborîyê de xirab biçe: ji ber nebûna derfetên qanûnî, biryarên ku têne girtin jî nikarin bikevin pratîkê, lewra „herêmên gewr" derketine holê û li kêleka sînorên qanûnî giranîya xwe çêdikin; herweha, divê were zanîn ku serbestkirina bazara pereyî bûye sedemê zêdebûna dizan. Bê alîkarîya kadroyan, burokratan û ya endamên cur bi cur yên beşên îstixbaratê û leşkeran, aborîya paralel nikaribû bi pêş bikeve. Desthilatdarî hê jî hêza zextê di destê xwe de digire, (11) lê belê wê kontrola hin

beşên karê aborîyê winda kirîye. Li gor agahîyên penaberan, her tişt li wê derê tê bazarkirin û firotin; destûra guhertina cih, patronî, şûştina mêjî, parastin, sextekarî…

Gelo wê ev hêza binerd ya civakê bikaribe rejîmê bi paş ve, ber bi xeta dema Kim Il-Sung ve bibe? Dema Kim Il-Sung tê wateya ku, ûtopîya neteweyî li pêşîya pêdivîyên girseyê cih bigire. Çîn hêzê dide Pyongyangê da ku ew xeteke pragmatîk bişopîne. Lê belê, di KGDKê de Pekîn xwedîya avantajekê ye: aramîya rewşê. Rêveberên çînî bawer dikin ku, vekirineke lezgîn ya KGDKê dikare zerarê bide rejîmê. Li gor daxuyanîyên Choi Choon-Heum, endamê enstîtûya yekîtîya neteweyî (ya hukûmetê) li Seûlê *"Pirsgirêka nukleer di rêza yekem de hêzên rojavayî ditirsîne û nearam dike, di rêza duyem de jî Çînê nerehet dike. Eger dema piştî Kim Jong-il bê zerar dest pê bike, Çîn dikare giranîya xwe ya aborî û siyasî li KGDKê pir zêde bike "*

Têkîlîyên di navbera Pyongyang û Pekînê de di nav gelek nakokîyan de dimeşin. Hevkara wê ya herî nêz Çîn e. Heman hevkarî ji dema şerê Koreyê û vir ve (25-10-1950) didome. Di wî şerî de hêzên Neteweyên Yekbûyî, artêşa Kim Il-sung heya çemê Yalu biribû û ew kiribû nav rewşeke zehmet, lê belê alîkarîya artêşa Çînê karibû jê re bibe weke derman. Lewra, têkilîyên aborî û leşkerî yên di navbera her du welatan de dimeşin, heman hevkarî di dema pîrozbahîyên serkeftina 25-10-1950yî de jî îlan bûbû. Ji 2008ê vir ve, piştî aşkerebûna siyaseta Seûlê, ya di derbareyê nêzîkbûna ber bi Bakur ve, ku ji alîyê serokê hêza navendî ya rastgir, *Lee Myung-Bak* ve tê meşandin, Çînê zêdetir xwe nêzîkê KGDKê kirîye û vê gavê bûye hevkara aborî ya herî girîng (ji %70 kirîn û firotina derve). Herweha, di warê kirîna zexîre, enerjî û tesîsatan de, Çîn di rêza yekem de ye. Ambargoya navneteweyî tu tesîr li ser rejîmê çênekir, lê belê ew bû sedem ku Koreya Bakur bikeve nav lepên Pekînê. Dostanîya di navbera van du welatan de bi du serdanan hate xurtkirin; serdana Kim Jong-il, di 2010ê de, ji bo cîranê wî û serdana rayedarê Çînê yê herî payebilind ji bo Pyongyangê. Lê belê divê xurtbûna dostanîya di navbera van du welatan de ji bûyerên dema bihurî veqetandî neyên nirxandin. Her çend weşana telegramên dîplomatîk yên amerîkî, ku ji alîyê WikiLeaksê ve pêk hatin, bandorek kiribin jî, ev nayê wateya ku wê hevkarîya di navbera van du welatan de xirab bibe. Çîn hevkarîya xwe ya bi KGDKê re ji bo aramîya rewşê weke misogerî dibîne. (12) Li Çînê du dibistanên ramanan hene: ya "muhafezekaran", ku ji ber hebûna wê Koreya Bakur tim weke "welatekî bira" ye û ya "derdorên ku daxwaza pêşxistina têkilîyên navneteweyî dikin", ev dibistan Koreya Bakur weke barekê dibîne. Li gorî birêz Choi, *"Ev niqaşên akademîk li ser daxwazên stratejîk ên Partîya Komûnîst tu bandorê nakin."*

Pekîn hemû rewşan û herweha belavbûna rejîmê jî digire ber çavan. Ew di derbareyê hevkara xwe de tu xeyalan çênake. Lê belê, ji bo vê gavê, ew naxwaze hêzên leşkerî yên amerîkî li alîyê din ê çemê Yaluyê bibîne. Ew naxwaze di bin serokatîya Koreya Başûr de û bi alîkarîya Amerîkayê, yekîtîyek di navbera van her du welatan de çêbibe. Divê were zanîn ku, belavbûna rejîmê wê bi taybetî li ser sînorên Çîn û Koreya Bakur bibe sedemê hejmareke mezin ya penaberan. Ji ber ku di herêma Yanbianê de, li alîyê Çînê, civakeke koreyî, ya ku hejmara wê mîlyonek e, xwe pir nêzîkê KGDKê dibîne û herweha ew xwedîya hestên neteweyî ye. Hatina kutleyên penaberan dikare bibe sedemê daxwazên nasnameyî, ku vê gavê pirsgirêkeke weha di herêma Xinjiang de, ji alîyê Uyguran ve tê jiyîn. (13)

Bi armanca stabîlîzekirina KGDKê, Çîn hewl dide ku Mandşûriya kevin careke din zindî bike. Di çarçoveya vê projeya ku bi navê *Chang-Ji-Tu* tê naskirin de, ew dixwaze di destpêkê de herêmeke pîşesazîyê ava bike, ku ji 35 kîlometreyan pêk tê û li kêleka çemê Yalu, di navbera Tanghua û Dandongê de ye. Piştre ew ê vê projeyê ber bi herêmên Changchun û Jilin, heya Tumenê fireh bike. Karê ji bo çêkirina pirekê di navbera van du welatan de dest pê kirîye. Rayedarên çînî, li KGDKê, ketine nava hewldanên ji bo xebatên çêkirina xanîyan û ya pêdivîyên bingehîn in. Her weha, Çînê dest bi karê dewlemendîya binerd kirîye, heman dewlemendî li Koreya Bakur pir zêde ye (bi taybetî di warê medenê tenik de). Eger rojekê Başûr bi darê zorê were Bakur, ew ê bibîne ku pir dever hatine dagîr kirin…

Ev pêşveçûna hêdî ya Çînê, ji alîyê Pyongyangê ve zêde nayê hez kirin: lê belê, ji bo ku rejîm belav nebe, ew neçar e ku bi vî awayî xwe serbixwe bibîne. Rayedarên Koreya Bakur xwedî serpêhatîyên dirêj in. Di 1956ê de, bi alîkarîya Moskvayê, Pekînê alîkarî dabû hewldanên ji bo darbeyeke leşkerî, a li dijî Kim Il-Sung. Ev ceribandin ji alîyê hin rayedarên Partîya Komûnîst ve, ku hevalbendên Çînê bûn, hatibû meşandin. Heya ku rejîm berjewendîyên Pekînê biparêze, ew ê alîkarîya Çînê bigre; û heya ku berjewendîyên aborî û jeostratejîk ên Çînê li KGDKê hebin, ew ê nehêle stabîlîzasyona vî welatî xirab bibe. Bi vê misogerîyê ve girêdayî, wê KGDK nikaribe xwe ji Pekînê qut bike û ew ê weke satelîta wê bimîne.

* Rojnamevan

RODI KHALIL: **Evîn IV**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 50 x 50 cm

1 Li hejmara kanûna 2010an ya Le Monde diplomatique, li gotara Alain Gresh ya bi navê "une guerre civile oubliée" binêrin

2 Di sibata 2007an de li gor peymana rawestandina fealiyetên nuklerî yên Koreya Bakûr, divê reaktorê Yongbyonê bihata deaktîvekirin. Lê piştî rawestandina hevdîtinan, kontrolkirina fealiyetên nuklerî di dawiya salê de hate sekinandin. Koreya Bakûr, ji bo peymana aşitiyê bikeve dêvla peymana agirbir ya 1953yê, şertê bi DYA'yê yê rasterast diyalogê derxist pêş. Binihêrin Bruce Cumings, Le Monde diplomatique, cotmeh 2007

3 Japonyayê di navbera salên 1905 û 1945 de Koreyê dagir kir

4 Hazel Smith, "Hungry for Peace", United States Institute of Peace Press, Washington, 2005

5 Ruedriger Frank, "North Korea: Gigantic Change", Nautilus Institute, San Francisco 9 gulan 2003

6 Andrei Lankov, "The natural death of North Korean Stalinism", Asia Policy, Nr 1, Seattle, 2006. Binihêrin, "La Mue de la Corêe du Nord", Le Débat, nr 153, Parîs, çile-sibat 2009

7 Stephan Haggard û Marcus Noland, "Winter of their discontent: Pyongyang attacks the market", Policy Brief, no 10-1, Peterson Institute for International Economics, Washington, çile 2010

8 Georgy Toloraya, "The economic future of North Korea. Will the market rule?", Academic Paper Series, vol. 1, Korea Economic Institute of America, Washington, sibat 2008

9 Bi taybetî li xebatên Charles Armstrong û Bruce Cumings binihêrin. Ji bo fransî: Patrick Maurus, "La Corée dans ses fables," Actes Sud, Arles, 2010

10 Li gor CIA'yê di salên 1970ê de ji hêla pêşketinê ve Koreya Bakûr li pêş Koreya Başûr bû. "Economic Race Between North and South Korea", Government Printing Office, Washington, 1978

11 Dezgehên alîkarîyê li ser girtina 150 heta 200 hezar mirovî di nav kamp û girtîgehên "şîrketên dewletî" agahdarî dabûn. Ev yek bi rêya wêneyên satellîtê hatine derxistin

12 Raporên li ser Koreya Bakûr û Çînê bixwînin. Dingli Shen, "Pyongyang mise la neutralite de Pekin", Le Monde diplomatique, çiriya paşîn 2006

13 Gotara Martine Bulaartine a "Quand la Fievre montait dans le west chinois", ku di tebaxa 2009ê de di Le Monde diplomatique de derketî binêrin

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

# Rastîya li pişt qehremanên geşbîn

Xwendineke "hûr û hişyar" li ser edebîyata Koreya Bakurî, gava ku zêde bala xwe nede ser qehremanên geşbîn -ku ji xwe her çi diqewime bila biqewime bawerîya wan a bi şoreş û şoreşgerîyê qet naleqe- lê bêhtir berê xwe bide çarçove û şertên ku ew qehreman jê dertên, dê di heman demê de îşaretê bi guherînên civakî yên ne li ber çavan jî bike. Di navbera risteyên ji gotin û hevokên "sîyaseten rast", ku têkoşîna li dijî bedbextî û nexweşîyên dinyayê ber bi esmanan berz dikin, rastîyeke din raxistî ye: bertîl, nemana bawerîya bi şoreşê, karnekirin…

Li pişt girêdaneke fermî ya bi nirx û nizama heyî, ku bi merasîmên konformîzm û dîsîplînê (beşdarîkirina di danişîn û çalakîyên fêrbûna îdeolojîyê de û çûna xwepêşandanên cemawerî hwd.) di qada giştî de xuya dibin, xetên civakekê têne kêşan ku tê de xinizî û xemsarî şikil digire: anku ew her du taybetmendî û karakterên ku gendelîyê berbelav dikin. Heyama xelayê, ji ber hewl û lêgerîna nanê şevê, gelek kesan di civînên perwerdeya siyasî û rexne li xwe girtinê de beşdarî nedikir. Serê salên 2000î beşdarîya di van çalakîyên dilsozîyê de nîve-nîv daketibû (1). Tevî ku heyamên paştir bal û elaqeya li ser van çalakîyan zêdetir jî bû, meyleke berfireh û bihêz pê re nehat. Kiryar û tevgerên zêdegavîyê, wek zererdana bi mal û tiştên mîrî, dizîya di kargeh û kooperatîfên ziraî de, çend qatan zêdetir bûn. Nîşaneya heyamê: cemaetê heta dereceyekê bi xweşbînî li van kesan dinihêrî ku ji bo berdewamîya jîyana xwe curmên weha dikirin. Ev helwêsta xweşbîn a xelkî di romana *Klît* ya Kim Hae-Sung de, ku sala 2004ê derket, xuya dibe. (2) Romana ku xweşbînî û mezinayîya partîyê li hember sûcdaran dide pêş, di heman demê de, bi rengekî nerasterast, resmê bêserûberî û bênizamîya welatekî dikêşe ku li wir jîna bêyî binpêkirina qanûnan gelek zehmet e.

Patrick Maurusê mamosteyê Înstîtûya Neteweyî ya Ziman û Şaristanîyên Rojhilatî (INALCO, li Parîse) (ku romana *Hevalan* ya Baek Nam-Ryong (1949ê ji dayik bûye) a ku sala 1988ê li Pyongyangê hat belavkirin wergerandîye fransî) (3) wisa difikire ku *"Edebîyata koreya bakurî di pêl û dewrên cihê re derbas bû. Pêla romantîzma şoreşger û qehremanên rejîmê serê salên 1990ê tewaw bû. Û digel gotara sîyasî ku dev ji gundî, karker û eskeran berdidahevaheng û wek kirdeya dîrokê zanyar û teknîsyen didane pêş, edebîyatê jî êdî cext û girîngî da ser zanyarî û hilberînê.* Hevalan *ku berê xwe dide nav çîrokeke hevberdana jin û mêrekî, nimûneyeke pir balkêş e: ew xwe dispêre ser fikira ku rejîm baş e û rê û îmkanên rexneya navxweyî hene, ji ber ku kesên têne rexnekirin li ber vê rejîmê asteng in. Tiştê ku roman derheqê kadirên karîyerîst û durû de dibêje gelek xeşîm e lê belê dîsa jî tê qebûlkirin, ji ber ku rê û îmkana selihandin û başkirina egoîstan heye. Bi vî halê xwe zêde dûr nîne ji erkê perwerdekirina bi rêya hişyarkirinê ku rikneke felsefeya Konfûçyûs e. Ji mirovî weha ye ku edebîyata Koreya Bakurî bi temamî tê darîştin û kontrolkirin. Lê belê, divê para azadîya her cûre nivîsandinê neyê ji bîr kirin: tekst û nivîsarên siyasetên herî rast jî her gav tiştên berevajî û ziddê zahirê xwe dibêjin".*

Romanên ku di dehsalên pêşî ên salên 2000î de derçûne, dîsa cudatîya helwêstan a di navbera neslan de dikin mijara nihênî û pirsa veguhastina ruhê fedakarîya bo doza muşterek, ku neslên salmezin xwedanên wê ruh û têgihiştinê ne, dikin xema berheman… Neslên ciwan ku çav û ruhê wan ê teşebusên qezenc û faydexwazîyê bihêztir e, "hêza manewî" ya rîsipîyên xwe ji dest dane. Lim Soon-Hee (4) dibêje ku di romanan de xuyabûna van qehremanên ciwan di nav neslê ciwan de nîşaneya guherîna nirxan e. Ev neslê ku di heyama "salên reş" ên xelayê de mezin bûne, gelek zehmetî kêşane û bi çavên xwe dîtine ka çawa kes û karên wan, tevî dilsozîya xwe ya bo rejîmê, ji bêderfetîyan mirine; lewma êdî ciwan bêtir berjewendîyên xwe yên şexsî didin pêş. Haletî ruhîyeyeke ku, bi ya vî nivîskarî, sîtavka bijîyana nisbî ya îdeolojîya cemawerî ye.

PH. P.

1 Cho Jeong-Ah, *The change of everyday life in North Korea after their economic difficulties [Guherîna jîyana rojane ya li Koreya Bakûr piştî çetinahîyên aborî]*, Korean Institute for National Unification (KINU), gulana 2007ê

2 Cho Jeong-Ah, heman çavkanî

3 Ev pirtûk bi hevkarîya Yang Jung-hee û Tae Cheong bo fransî hat wergerandin û dê li cem weşanxaneya Actes Sud bê weşandin

4 *Value changes of the north korean new generation and prospects [Guherînên nirxên nifşê nû û perspektîvên koreya bakûrî]*, KINU, adara 2007ê

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

## Hêştirên Çînî û Hecînên Suûdî

# Di bin sîya Waşîngtonê de têkilîyên Pekîn û Rîyadê

ALAIN GRESH

**Tevî ku her du jî endamên G20'ê ne, parêzvana deverên pîroz ên ola Îslamê, Arabistana Suûdî, û Çîn a ku hê jî îdîa dike ku ateîst e, ne tenê ji aliyê fîzîkî ve, herwiha ji aliyê îdeolojîk ve jî têra xwe ji hev dûr in. Lê belê li gel vê yekê jî, ev deh sal in ku, li qadên aborî, çandî, olî û hetta carna di qada eskerî de jî, di navbera her du welatan de têkiliyên zexim tên honandin.**

Bi dirêjahîya otorêyan ve, li cem Carrefourê, tabelaya China Martê, supermarketeke pir mezin a nû îlanbûyî, ronî dide derdorê: li dukanên wê, bi hezaran tiştên rasterast ji Împaratorîya Navîn hatî, tên firotin. Ajansa çapemenîyê ya çînî Xinhua, dide zanîn ku 322 misilman ji eyaleta Gansuyê hatin û heta heca Mekeyê *(nivîsa di çarçoveyê de bixwînin)*, bi hezaran kes wê bidin ser şopa wan. Zanyarên her du welatan, di hezîrana 2010î de, deşîfrekirina DNAya hêştiran (*Camelus dromedarius,* hêştirên yek milikî*)* bi dawî kir û Pekînê 37 hecîn (*Camelus bactrianus,* hêştirên du milikî) dîyarî Rîyadê jî kirin, lewra ku hecîn li Erebistana Suûdîyê tunene. Restorana çînî *Leylan* weke nîşana vê lihevhatinê ye û xwarineke goştê hecînan bi şêwazê pekînî difiroşe. Wêneyên bi vî rengî, nemaze di warê aborîyê de nêzikbûna nedîtî ya her du welatan, didin xuyakirin. Di sala 2009ê de, Çînê ji bo cara yekem şûna DYAyê girt û bû bikira yekemîn a nefta Erebistana Suûdîyê. Anuha, para wê di îthalatên çînî de %11.3 ye - di sala 2000ê de, ew reqem bi tenê %4 bû. Par, di vê meliktîyê de ku niştecihên wê pir ji cîpan hez dikin -benzîn lê pir erzan e- Çînê ji DYAyê bêhtir tirimpêl firotin. Hin şiroveker vê rewşê weke qulibandineke hevpeymanîyê rave dikin û bi dilşadî an bi fikar, dibêjin ku Pekîn û Rîyad wê têkilîyeke weha deynin ku dê Waşîngtonê li derve bihêle. Lê Raed Krimli, şêwirmendê wezîrê kar û barên derve yê Saûd Al-Faysal, van şiroveyan di cih de nabîne:*"Tevî ku em pê dizanin ku dibin sedama hin fikarên Waşîngtonê jî, ti elaqeya pêwendîyên me yên bi Çînê re bi têkilîyên me yên giring û stratejîk yên bi DYAyê re nîne."* Bi dû van gotinan, ew bi mizewirî bi bîr dixe ku Rîyad, pir caran li ser daxwaza "dostê amerîkî" jî ji bo berjewendîyên vî dostî bandorê li Pekînê dike, weke mînak, li ser bernameya nukleer a îranî.

John Sfakianakis, endamê Saudi Fransi Bank û yek ji bisporên ku meliktîyê herî baş nas dike, bi heman haydarîyê işaret bi xisleta bi tevahî aborî ya pêwendîyên Pekîn û Rîyadê dike: *"Rast e ku Çîn li vir bêhtir îxracatê dike, lê ev rewş di piranîya welatan de bi heman rengî ye. (1) Suûdî jî dixwazin gava xwe biavêjin Çînê. Dema ku Çîn bixwaze di herêmê de roleke sîyasî rabe, pêwendî wê sîyasî bibe. Anuha ne wisa ye."*

Her du welat di destpêka salên 2000î de, dema ku kirîna petrolê li DYA û YEyê nema zêde bû, lê li Çînê pir zêde bû li hev hatin. Lewra jî, tu kes înkar nake ku ew ji ber neftê bi hev ve girêdayî ne. Rîyadê dixwest bazareke demdirêj ji xwe re misoger bike û Pekînê jî dixwest ewlehîya peydakirina nefta xwe xurt bike. Karbidestên çînî bi zimanê dîplomasîyê baş dizanin û ew behsa qedera hevpar a gelan, pêwîstîya bihevrejîyanê feydeyên hevbeş ên hevkarîyê dikin. Lê fikarên hêzeke ber bi xurtbûnê ve ye di daxuyanîyan de cih nagrin. Di sala 2003ê de, romaneke serkeftî ya bi navê *Cenga Ji Bo Parastina Rêyên Neftê*, weha digot "*hêzên împaratorî ku ji Çînê ditirsin*" dor lê girtin, ev dorlêgirtin wê şerekî bi dawî hatibûya (2). Di çapemenîya çînî de, hin bispor bi awayekî aşkere, derbarê girtina avtenga Malaccayê, ya rêya derbasbûyîna petrolê behsa tirs û fikarên xwe dikin. Dema ku buhayê barîlekê nêzîkî 150 dolaran bû, hin weşanên çînî, di vî karî de tilîya Waşîngtonê didît, li gor wan Waşîngtonê dixwest pirsgirêkan ji bo Çînê derxîne.

Ji bo kêmkirina girêdana xwe, Pekîn li benda peymanên ticarî yên digel Erebistana Suûdîyê nesekinî, wê jî razandinên hevpar ên di warê hîdrokarburê de bi pêş xistin. Bi vî rengî, şîrketa neteweyî ya suûdî ya hîdrokarburan Aramco, bi hevkarîya Exxon Mobil û şîrketa çînî Sinopec, di eyaleta çînî Fujianê de, refîneriyeke weha çêkir ku rojê dikare 240 000 barîlan derxîne. Şîrketeke suûdî ya din, *Saudi Basic Industries Corporation* (Sabic), bi *Sinopec*ê re komplekseke petrokîmyayê li Tianjînê ava kir, ku nû dest bi xebatê kir. Wekî din, hin şîrketên çînî li Erebistana Suûdîyê pareyê xwe razand da ku kompleksên petrokîmyeyê ava bikin û ji bo cara pêşî, destûra wan hat dayîn ku ew dest bi karê vekolana gazê jî bikin.

Îxracata neftê (û berhemên petrokîmyewî) para herî mezin a îxracata suûdî ya ber bi Çînê ve pêk tîne; herçî Çîn e, ew di beşên pir cuda yên bazara suûdî de dixebite, ji sazkirina xetên trenên pir bi lez heta bi çêkirina kargehên bêxwêkirin, alumînyûm an jî çîmentoyê. Berhemên wê yên erzanbuha (tekstîl, cil û berg, pêleyistok), di nav xebatkarên koçber an jî beşa herî xizan a serjimara suûdîyan de mişterîyên xwe dibînin -û rastî nerazîbûnên dijminane weke yên li Afrîkayê nayên, ji ber ku ew reqabeta tu berhemên xwecihî nakin. Çîn li ser bazara berhemên tevakirî yên nirxa bilind jî cihê xwe digire, ji komputeran bigire heta bi telefonên destan, tirimpêl an jî buldozeran. Şîrketên wê li ser bazarên avahîsazîya giştî bi alozîyeke zêde tev digerin. Heta wan dikir bazara trena bi lez a xeta Mekke-Medîneyê ji destên Fransayê bistînin. Ev pêşana reqabetwarîya wan û her weha jêhatîbûna wan a ji bo şidandina girêdanên xurt bi biryardêrên sîyasî û malbata melikî re ye. Ew meaşên nizim dide xebatkarên xwe, ku rasterast ji Çînê tên, li gorî balyozxaneya çînî 40 000 kes û bi gotina ticarekî suûdî, ew her amade ne ku *"înşaetê berî duhî xilas bikin"*. Lê alîyên xirab jî hene. Di çirîya paşîn a 2010ê de, ji bo cara duyem piştî çend mehan, xebatkarên çînî yên înşaeta metroya Mekeyê xwe pêşan da, hin erebe û cam şkandin ku ev jî li bajarê pîroz dîtineke ne ji rêzê bû. Wan meaşên nizim û şertên xebata di bin 45°C de protesto dikir (3). Ihtîmal e ku ne pir bi dilê rayedarên suûdî be... Ji bo çend înşaetên din, mohleta avakirinê bihurî, avahîyên xilasbûyî li gorî daxwazan nebûn. Carina, hin çewtî komîk in: di salona nû ya China Martê de, dukanek kasayên polayî difiroşe, lê katalog û talîmatên bikaranînê bi tenê bi zimanê çînî hene. Wekî din, berdêla kêmkirina buhayan jî heye: Çapemenîya çînî ragihand ku di budceya projeya metroya Mekeyê de kuneke 4 mîlyar yuanî (ji 600 mîlyon dolarî bêhtir) hebû û şirket digel rayedarên suûdî di nav dozekê de ne. (4)

Digel vê jî ji Çînê hat ku di demeke pir kurt de, li tevahîya Rojhilata Navîn cihê xwe bigire: ticareta navbera her du herêman, ku di 2004ê de 37 mîlyar dolar bû, di 2009ê de gihîşt 110 mîlyar dolaran. Ji 2004ê pê ve, forumên çînî-ereb ên berpirsyarên siyasî, bazirgan an jî nûnerên civaka sîvîl, bi rêkûpêkî li dar dikevin. Pevguherînên çandî xurt dibin, Pekînê versîyoneke erebî ya televîzyona xwe ya nûçeyên bênavber, CCTV, saz kir (5), ajansa Xinhua li Rîyadê û li piranîya paytextên ereban bicihbûyî ye û kanala Al-Jazeera jî, li Pekînê dezgehek vekir. Di gotarên şairane de, çapemenî behsa vejîyaneke Rêya Hevrîşimê dike, ku ev rê jî, heta sedsala 15emîn, ji sînorên Çînê heta bi Derya Sipî diçû û rêya yekem a ticareta navneteweyî bû. Lê belê, divê ev heyecan bê kêmkirin, lewra ku mînahevîyên dîrokî tiştekî jî îspat nakin. Dema ku Rêya Hevrîşimê gihîşt noqteya xwe ya herî bilind, împaratorîyên asyayî jî xurt bûn û wan ewlehîya rêyan, bi awayekî leşkerî jî, misoger dikir. Rewşa îro ne weha ye.

Ji bo nuha, ev nizimdengîya Pekînê li qîmetê wê zêde dike. Mîr Turkî Al-Faysal birayê wezîrê kar û barên derve û kevneserokê rêxistina îstîxbaratê ye ya ku wî nemaze di dema têkoşîna li dijî hêzên sovyetî de li Afxanîstanê bi rê ve dibir. Nuha ku, bi gotina xwe, ew bûye "welatîyekî ji rêzê", ew yek ji kêm endamên malbata melikî ye ku li DYAyê konferansan didin: *"Pêwendîyên me yên digel Çînê hêsan in, ji yên digel DYAyê hêsantir in. Li wir, lobî tunene ku bên tesîrê li sîyaseta wan bikin; em nabin rehîneyên cudatîyên wan ên navxweyî."* Ew kevnebalyozê Waşîngtonê ye û li

RODI KHALIL: **Evîna nîvê şevê II**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 70 x 50 cm

wir, li hemberî kampanyayên dij-suûdî yên piştî 11ê îlonê têkoşîya, lewra jî dizane behsa çi dike. Di derbarê pir dosyeyên navneteweyî de, mîna ya Darfûrê, Rîyad û Pekîn jî xwedîyên helwêstên mîna hev in, bi heman rengî ji serdestîya neteweyî û desttênewerdanê re rêzê digirin û dîplomasîya rojavayî ya mafên mirovan piçûk dibînin, ji ber ku ev dîplomasî jî bi wan berjewendîperest û nehevseng e.

Pêbawerî weha nayê îlankirin. Û di navbera her du paytextan de, bûyereke damezirêner û ne ji rêzê, ku bêhtir dişibe romanên sîxûran, ev pêbawerî ava kir. Dem sibata 1985ê ye: Îran û Iraq li dijî hev şer dikin. Bexda, bi fuzeyan li bajar û avahîyên neftê yên cîrana xwe dixe; hin tankerên suûdî jî dibin qurbanên "şerê tankeran". Rîyad a ku piştgirîyeke xurt dide desthilata Sedam Husênî, fikar û tatêlan dike. Melik Fahd ji serokê DYAyê Ronald Reagan dixwaze ku ew fuzeyan bifiroşe meliktîyê, da ku îmkanên çavtirsandinê yên welêt zêde bibin.

Serokê amerîkî ji nerazîbûna Îsraîlê ditirse, lewra ku wî nû tiştekî ku Îsraîl pê nerazî bû kir: daxwaza firotina balafirên AWACSê ji meliktîyê re, bi zehmetî derbasî kongreyê kir (6). Ew daxwaza melik red dike. Lê wekî din, Rîyad dikare ji kîjan welatî bixwaze? Rihab Masûd di wê demê de xebatkarê balyozxaneya Suûdî ya li Waşîngtonê bû û nuha alîkarê sekreterê giştî yê Konseya Neteweyî ya Ewlekarîyê ye, ku di bin birêveberîya mîr Bandar Ben Sultanî de sazîyeke pir bandordêr e. Ew rewşê weha şirove dike: *"Me dikarî yan ji Moskvayê an jî ji Pekînê bixwazin. Lê ji ber ku serok Reagan navê "împaratorîya xirabîyê" li Yekîtîya Sovyetan kiribû, me Çîn tercîh kir, tevî ku wê demê qet têkilîyên me yên dîplomasîyê pê re tune bûn jî."*

Ev peywira pir giring û bi dizî dibe para mîr Bandar, kurê wezîrê parastinê û balyozê meliktîyê li Waşîngtonê, ku wî li wê derê jî karîbû bi awayekî vêşartî nêzîkî dîplomatên çînî bibe. Bi dû heyetên aborî yên sexte, ku bi erkên rastî yên leşkerî, hevdîtinên bi dizî yên li otelên Hongkongê û muzakereyên dûvdirêj li ser şert û mercên peymanê, di qanûna 1986ê de, Erebistana Suûd li dor pêncî mîsîlên Dongfeng 3 ji Çînê kirîn, ku ew li Rojavayê bi navê CSS-2 naskirî ne û menzîla wan bêhtir ji 3 000 kîlometreyan e û di teorîyê de, dikarin serikên nukleerî jî hilgirin. Gemîyên çînî sîlehan tînin Rîyadê (ji bo ku DYAyê bixapînin, Bexda weke wergira van sîlehan tê nîşandan); personelê suûdî jî xwe fêrî bikaranîna van çekên nû dike.

Di destpêka 1988ê de, satelîtên amerîkî fuzeyan kefş dikin. Çapemenîya amerîkî jî îddia dike ku ew çekên *"barkêşên serikên nukleerî"* dikarin li her derê Rojhilata Navîn bixin. Hikûmeta îsraîlî tehdîd dike ku ew ê li ser baregehên suûdî yên çêkirina fuzeyan, bombeyan bibarîne (7). DYA pir diqeherin ku li derveyî vê meseleyê hatin hiştin û sê tercîhan pêşkêşî Erebistana Suûdî dikin: jihevxistina mîsîlan; li Çînê vegerandina wan; kontrolkirina wan a ji hêla leşkerên amerîkî ve. Dema ku balyozê amerîkî protestoya fermî ya welatê xwe dide melik, melik jî hêrs dibe û dîplomêt ji welêt dike der – ev bûyereke nedîtî bû di pêwendîyên her du welatan de-. Krîz gihîşt asta herî bilind.

Rewş wê hêdî hêdî aşt bibe. Di adara 1988ê de, Çîn peymana belavnekirina nukleerî mohr dike û piştrast dike ku ew di vî warî de ne xwedana tu daxwazan e. DYA û Îsraîlê jî aram dikin. Lê suûdî wê ji bîr nekin ku, di vê kêlîka giring de, Çînê piştevanîya wan kirîye. Pekîn jî, dê sipasdara Rîyadê bûya ku daxwaza Waşîngtonê ya kontrolkirina fuzeyên çînî -sîlehên "bi dizî"- red kir.

Pêwendîyên leşkerî di navbera Çîn û Erebistana Suûdîyê de jî, bi awayekî veşartî domand. Digel ku bi tenê kirîna çekên topavêj a 2008ê tê nasîn jî, bi rêkûpêkî îddîa hene ku Erebistana Suûdî mîsîlên CSS-5 û CSS-6 ji Çînê dikire. Ev jî hêzê dide îddîayên xeyalî yên derûdorên neomuhafezekar ên amerîkî, ku bi hebûna bernameyeke

nukleerî û leşkerî ya suûdî bawer in, a ku bi hevkarîya Pekîn û tevkareke din a stratejîk a meliktîyê, Pakîstanê re hatîye plan kirin (8).

Peymana li ser mîsîlan rê li ber danîna têkilîyên dîplomatîk ên fermî di navbera her du welatan de vekir, ev jî di 1990ê de pêk hat. Lewra jî, Rîyad ji bereya alîgirên Taiwanê veqetîya (9) û weha bi derengî, dest bi parastina bîrdoza Çîneke hevgirtî kir. Abdul-Karim Yaqub ê birêveberê Odeyên Bazirganî û Pîşesazîyê, bi bîr dixe ku di wê demê de, *"Suûdî jê pir haydar bûn ku divê ew hertim weke hevkarên Rojavayê neyên dîtin û boçûneke hevsengtir pêwîst e. Bi vê nihêrînê, Çîn tercîheke baş bû."*

Di serdema şerê Kendavê (1990-1991) de, Pekînê pêşnîyazên Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî, ku rê li ber şerî vedikir, erê nekirin. Berevajîya vê, Erebistana Suûdî di bereya dij-Sedam Husênî de serkêş bû, lewra jî, hinek nakokî di nav her du welatan de peyda bûn. Piştî çend salan, gavên mezin ji bo têkilîyên çînî-suûdî hatin avêtin. Di 2006ê de, melikê suûdî yê nû, melik Abdallah, ji bo sefera xwe a yekem a li derveyî welêt, Asyayê zîyaret dike. Ew li pey hev diçe Çîn, Hindîstan, Malezya û Pakîstanê. Ev cara pêşî ye ku serokdewletekî Suûdî tê Pekînê. Zîyaret jî bi haydarî hat plan kirin, bi şandina heyetên civaka sîvîl ku ji bîst û pênc kesan pêk tên -pênc kesên esilçînî jî di nav de *(nivîsa di çarçoveyê de bixwînin)*. Di nîsana 2006ê de, serokê çînî Hu Jintao bi xwe diçe Rîyadê û hefteyekê li wir dimîne. Îmtîyaza wî ya taybet jî çêdibe: ew derdikeve pêşîya desteya şêwirmendan *(meclîs al-şûra)* û gelek peymanan jî îmze dike- yek ji wan jî pêş dibîne ku bijîşkîya çînî ya bikeve meliktîyê.

Rewşenbîrekî suûdî dide zanîn ku, li Rîyadê, *"heyrantîyeke xurt a ji bo Çînê, ji bo şaristanîya wê, ji bo dîwarê bilind, ji bo lidarxistina Leyistikên Olîmpyatê heye. Gelek Suûdî dixwazin fêrî zimanê çînî bibin. Piranîya xelkî ji DYAyê nefretê dikin, lê destkeftên Çînê dilê wan aşt dike."* Lê ew bi nehevbeşîya vê hestyarîyê jî dizane: *"Çînî ne heyranên dunyaya ereb in, ji ber ku em lawaz in û beşek ji îmaja me ya li cem wan, ji Rojavayê hatîye."* Digel vê jî, anuha bi sedan ciwanên suûdî li împaratorîya Navîn dixwînin û bi vî awayî bi ya pêxember Mihemed dikin: *"Here heta bi Çînê li zanyarîyê bigere."*

Rîyad ji bo guherandina îmaja xwe, her û her di nav hewldanan de ye. Piştî erdhêja Sichuanê, di havîna 2006ê de, meliktî mezintirîn alîkar bû û bêhtir ji 40 mîlyon euroyon dan. Vê jî li Çînê olan da. Erebistana Suûdîyê jî, li pêşangeha gerdûnî ya Shanghaîyê, koneke bi prestîj veda, ku di nav konên herî zîyaretkirî de cih girt: keştîyeke pir mezin, bi şiklê heyvê û bi palmîyeyên li ser pirê, mîna baxçeyekî daliqandî ku nîşana waheyên çolan e -referanseke din a ji bo Rêya Hevrîşimê.

Lê anuha hezar asteng pêşî li vê rêyê digrin, her du alî jî hewl didin ku ji van astengan bibihurin. Ji van astengan, bernameya nukleer a îranî pirsgirêkeke mezin e. Ji xwe, bi salan e ku Çîn têkilîyên xwe yên digel Îranê xurt dike ku piştî Erebistana Suûdî û Angolayê ew ji bo Pekînê neftfiroşa sêyemîn e; ew sîlehan difiroşîyê û ticareta wê ya li wir, di her warî de dînamîk e- di 2009ê de, mîqdara wê gihîşt 30 mîlyar dolaran û ihtimal e ku ev reqam ê di 2015ê de bibe 50 mîlyar. Lewra jî, Pekîn li hember her hişkkirina cezayên li dijî Tehranê tev digere. Tevî hewldana mezin a Waşîngtonê jî, mehên muzakereyê, di gulana 2010ê de zîyareteke fermî ya wezîrê suûdî yê kar û barên derve û çend muzakereyên din ên vêşartî, hatin kirin ku Çîn pêşniyaza Konseya Ewlekarîyê ya 9ê hezîrana 2010ê erê bike. Ji xwe, çavkanîyên dîplomatîk ên suûdî piştrast dikin ku welatê wan ji Çînê re misoger kir ku, di rewşa rawestandina firotina ji Îranê de, ew ê şûna wê bigirin. Digel van tiştan, Çîn haydar dimîne û ji metna NY ya dawîyê danakeve. Ew hişkkirina cezayan a ku DYA û YE dixwazin, red dike û heta şûna şirketên rojavayî yên ku Îranê diterikînin jî digire.

Tirs û fikira suûdî ew e ku Îran wê çekên nukleer çêbike -li Rîyadê, bawerîya her kesî ye ku Tehran dixwaze wê bombeyê saz bike-, sedema vê tirsê ya kêm caran behsa wê tê kirin ev e: hemin wê encamên bûyereke bi vî rengî yên têkildarî bi pêwendîyên suûdî-amerîkî re hebin. Di vê rewşê de, gelo Waşîngton wê hewl nede ku bi Tehraneke nukleerî re li hev bê û berjewendîyên Ereban pişt guh bike? Mîr Turkî Al-Faysal rewşê weha dinirxîne: *"Fikara me ew e ku berjewendîyên me dê di heman demê de ji hêla Îran û DYAyê ve bên ji bîr kirin. Di vê rewşê de, em ê di navbera Îraneke nukleer û Îsraîleke nukleer de zefkirî bimînin."* Ew bi bişirîneke weha pê de diçe: *"Şikir ji Xwedê re ku Ahmadînejad heye"* -ku bicihhatina vê rewşê zehmettir dike.

Van bûyeran zêde bandor li ser têkilîyên Pekîn û Rîyadê nekir, lê ew haydarîya Çînê a di herêmê de binxêz dikin. Wexta piştigirîya wê ya ji bo tevgerên şoreşgerî yên dunyaya sêyemîn û nemaze Rojhilata Navîn, bi rastî xilas bû. Ma hê di bîra kê de ye ku, digel Cezayîrê, ew, di salên 1960î de, welatê yekem bû ku alîkarîya El-Fetîh a Yasser Arafatî kiribû? Anuha, ji bilî daxuyanîyên aramker, tu pozîsyona wê a xurt di şerê îsraîl-ereb de nîne. Lewra jî ku, di salên 1990î de, Çînê bi Îsraîlê re hevkarîyeke leşkerî ya xurt da dest pê kirin -heta vetoya amerîkî ya tîrmeha 2000î li ser firotina Îsraîlê ya radareke Phalcon ji bo Çînê. (10) *"Helwêsta me ya li ser herêmê yekdeng nîne"*, rojnamevanekî çînî şirove dike. *Du nihêrînên cuda hene, yek îsraîlîparêz, ya din erebparêz e."*

Di 2004ê de, Çîn ji bo desteya çaran (YE, NY, DYA û Rusya) a li ser muzakereyên aştîyê yên îsraîl-ereb nehat vexwendin. Ji ber vê yekê, wê şandeke taybet ji bo Rojhilata Navîn wezîfedar kir, lê rola wê hê jî piçûk e. Ji bo cara yekem jî, leşkerên çînî tev li peywirên pirwelatî yên li Darfûr û nemaze li Lubnanê dibin. 350 leşkerên wê di Hêza demî ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Lubnanê (Finul) de hene. Pekîn di 2006ê de pêşnîyaza şandina hezar eskeran kiribû, lê perspektîva têketina kûrtir a Çînê di şerê lubnanî de, Parîs û Waşîngton xistibû nav fikaran (11).

Rayedarên suûdî baş pê dizanin: Çîn nikare weke Dewletên Yekbûyî ewlehîya wan misoger bike, ku di dema dagîrkirina iraqî ya Kuweytê de ewlehîya wan jî parastibû. Lê gelo sibe? Di kanûna 2008ê de, Çînê da zanîn ku ew ê keştîyên şerî yên pêşî bişîne nav ava Somaliyayê, da ku gemîyên xwe, wergirtina nefta xwe û îxracata xwe ya ber bi Derya Spî ve bi rêya kanala Suezê, biparêze. Di adara 2010ê de, du keştîyên wê di keştîgeha Zayedê ya Abu-Dhabîyê de rawestîyan.

Wê demê, çapemenîya herêmê gotibû, ji bo cara pêşî piştî nîvê yekem ê sedsala 15emîn, gemîyên çînî ketin Okyanûsa Hindî. Di sedsala 15emîn de, amîral Zhan He, çînîyekî misilman, fîloya împaratorîyê bi rê ve bir û di navbera 1405 û 1433ê de heta bi Ormûz, Derya Sor û qeraxa rojhilat a Afrîkayê seyirî. Li gor hin hîpotezan jî, ew li dor Afrîkayê zivirî û heta bi giravên Hind-Rojavayê çû (12). Di bibîrxistina van serpêhatîyan de, rewşenbîrekî suûdî meyla xwe ya ji bo vegera vê serdema hêza çînî venedişart, da ku welatê wî ji niqaşa dualî û ferzkirî ya digel Waşîngtonê bifilite.

1 Hêjayî gotinê ye ku Erebistana Suûdî nuha dixwaze bibe endama BRICê, civata Brazîlya, Rusya, Çîn û Hindistanê

2 Gotinên jibergirtî Ben Simpfendorfer, *The New Silk Road [Rîya Hevrîşimê ya Nû]*, Palgrave Macmillan, New York, 2009. Her weha bixwîne: John Garver, Flynt Leverett û Hilary Mann Leverett, *Moving (Slightly) Closer to Iran. Chinas Shifting Calculus for Managing Its " Persian Gulf Dilemma " [Nêzîkbûneke (piçek) a digel Îranê. Çîn ji bo îdarekirina "nakokîya Kendava Farisî" ya xwe, hesabê xwe diguherîne]*, Reischauer Center, Waşîngton, 2009

3 *Arab News*, 13 cotmeh 2010

4 *Times Weekly*, Pekîn, 4 mijdar 2010

5 http://arabic.cntv.cn/01/index.shtml

6 Lê binêre: Oliver Da Lage, "Un *vademecun* pour responsables de la coopération militaire" [Talîmatên ji bo berpirsên hevkarîya leşkerî], *Le Monde diplomatique*, rêbendan 1985

7 Li ser alîyê îsraîlî yê krîzê, binêre: David B. Ottaway, *The King's Messenger. Prince Bandar Bin Sultan and America's Tangled Relationships with Saudi Arabia [Şandê Keyî. Mîr Bandar Bin Sultan û têkilîyên tevlihev ên Amerîka û Erebîstana Suûdîyê]*, Walker & Company, New York, 2008

8 Li ser van teorîyên sûîkastê li bloga Jeff Steinî ya li ser malpera *Washington Postê* binêrin û vê gotarê bixwînin, "Former CIA analyst alleges China-Saudi nuclear deal" [Kevnetehlîlkarê CIAyê îddiaya hebûna peymaneke nukleerî ya çînî-suûdî dike], 7 hezîran 2010

9 Li Rîyadê, wekî li hin welatên din, nûnertîya ticarî ya Taiwanê hê jî pir çalak e

10 Binêrin Isabelle Saint-Mézard, "Hindistan û Îsraîl, hevkarîyeke nedîtî û nixumandî ", *Le Monde diplomatique kurdî*, mijdar 2010

11 Binêrin "China's Growing Role in UN Peacekeeping" [Rola Çînê di aştîparêzîya NY de mezin dibe], International Crisis Group, Bruksel, 17 nîsan 2009

12 Lê binêre: Gavin Menzies, *1421, l'année où la Chine a découvert l'Amérique [1421, sala ku Çînê Amerîka keşif kir]*, Intervalles, Parîs, 2007

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Dîplomasîya hecê

Abdul-Karim Yaqub birêvebirê ciwan ê odeyên bazirganî û pîşesazîyê yên Suûdîyê ye û bi taybetî berpirsê têkilîyên ligel Çînê ye. Ew li Zanîngeha Şanghaiyê li ser pêwendîyên her du welatan, tezekê amade dike. Yaqub hemwelatîyê Suûdîyê ye, lê bi eslê xwe çînî ye: di sala 1949ê de, ji ber pêşdeçûna hêzên Mao Zedongî (Mao Tse-Tung), çend sed malbatên çînî yên musliman, Erebistana Suûdî ji Taiwanê minasibtir dîtibû û hatibûn wir. Ji xwe, hê jî di salên 1930yî de, muslimanên çînî yên ji Tirkistana Rojhilat (bi navê xwe yê îro, Xinjiang) ji alozî û şerî revîyabûn û li Meke û Medîneyê bi cih bûbûn.

Paradoks ev e ku, li pey hatina ser karî ya komunîstan li Pekînê "dîplomasîya hecê", di ware dînî de jî herdu welat bi hev ve girêdan. Di sala 1955ê de, bi mebesta Konferansa Bandungê (Endonezya), ku serokên bi dehan welatên nû serbixwebûyî li hev civandibûn û armanca wê, afirandina tevgera welatên ne rêzkirî bû, mîrê mîratxur (ku paşê bû melikê Suûdîyê Faysal û wezîrê kar û barên derve yê Çînê Zhou Enlai, li ser mijara heca misilmanên çînî li hev kiribû. Hersal, bi dehan kesan jê sûd werdigirt. Şoreşa çandî ya 1966ê, ya ku îmhakirina "nirxên adetî" ji xwe re kiribû armanc, dawî li vê herika qels anî.

Di salên 1960 û 1970yî de, Riyadê têkiliyên dîplomasiyê yên digel Taipehê jî danîbûn û di kar û barên Lîgaya dijkomûnîst a dunyayî de, ya ku Çang Kai-Çek ew damezrandibû, bi awayekî pir çalak dixebitî. Ji ber vê, pêwendiyên her du welatan hîn xirabtir bûn. Di vê lîgayê de jî, tevgerên weke tevgera faşîst a fransî Rêbaza Nû, Heritage Foundation (Weqfa Mîratê) ya amerîkî ya ku tê de nûnerên dîktatorê arjantînî Jorge Videla hebûn, cihê xwe digirtin. Heta Suûdîyên esilçînî jî, wê demê, di çalakîyên xirabker ên li dijî Komara Gelî de, rolek leyîstibû.

Ji destpêka salên 1980yî, bi xurtkirina hevpeymanîya Pekîn û Waşîngtonê re, Yaqub vedibêje ka çawa Çînê biryar da ku ji nû ve digel Erebistana Suûdîyê tekilîyan deyne. Dîsa jî, wê "dîplomasiya hecê" bi kar anî. *"Bi kevirekî du nîşanan hildin: bi vî awayî, wan şanî muslimanên xwe da ku ew ne li dijî dîn in û hem jî nêzîkî Erebistana Suûdîyê bûn. Di sala 1981ê de, li civîna bilind a Bakur-Başûr a Cancûnê, hevdîtineke weha di navbera melik Fahd û karbidestên çînî de pêk hat."*

Hecê di sala 1979ê de ji nû ve dest pê kir, lê weke diyardeyeke marjînal ma. Ev rewş sala 1985ê dema ku Pekînê qerar da ku dewlet mesrefên hecê bigire ser milên xwe, guherî. Ji bo cara pêşî, heyeteke çînî ya resmî çû Riyadê. Hejmara hecîyan, ku nêzîkî 2000 kesan bû, sala 2009ê gihîşt 12 700 kesan û 2010ê bû 13 500. Pekînê mesrefên seferên balafiran yên ku ji bajarên weke Pekîn, Urumqi, Lanzhou, Yinchuan û Kunmingê rasterast diçûn Mekeyê dida.

Ji bo çînîyan, destkeftên siyasî yên vê stratejîyê di dema serîhildanên Xinjiangê yên havîna 2009ê de xuya bûn: perçiqandina serîhildanê ji hêla Erebistana Suûdîyê ve nehat şermezarkirin, heta medyayên meliktîyê jî zêde li ser ranewestîyan. Weke piranîya paytextên dunyaya musliman -ji bilî Enqerê- Riyad xwe kerr û lal dike. Raed Krimli, şêwirmendê Wezîrê Kar û Barên Derve Saûd Al-Faysal, rewşê weha rave dike: *"Muslimanekî baş, divê berî her tiştî welatîyekî baş be, çi li Çînê û çi jî li welatekî din. Em destên xwe di karên navxweyî yên welatên din wernadin û em naxwazin ku ew jî di karên me werdin. Em vê rêbazê, digel Pekînê par ve dikin."*

"Pirsgirêka musliman"an Pekînê dixe nav fikaran. Li gorî îstatîstîkên resmî, li Çînê 20 mîlyon musliman hene. Hin lêkolînerên Suûdîyê weha texmîn dikin ku hejmara wan pir zêdetir e. Ew li ser deh nijadan dabeş dibin, lê du komên sereke hene, ev jî Uygurên tirkîaxêv û Huiyên çînîbûyî ne - li Çînê, ew hindikayîya dînî ya tenê ne - û ji Uyguran kêmtir li dijî hukûmetê derdikevin. Tê gotin ku Hui dundeyên bazirganên ereb in, yên ku di dema seferên Rêya Hevrîşimê de li Rojhilata Dûr bi cih bûne. Çîn jî, wan weke "pirekê" bi kar tîne: di îlona 2010ê de, wê forûmeke aborî ya ereb-çînî li Yinçuanê li dar xist, ku ev bajar jî, paytextê herêma xweser a Xingxiayê ye, herêma ku piraniya xelkê Huiyî lê dimînin.

Di têkoşîna xwe ya li dijî "tundrewîyê" de, Çînê nêzîkatîyeke dualî îlan kir: ew hem "rewatîya musliman"ên xwe xurt dike, hem jî elemanên tundrew ditepisîne. Ji bo her du alîyan jî, Çîn hewceyî Erebistanê ye, ku "nobedara her du pîrozgehên Meke û Medîneyê ye". Ew xwendekarên xwe yên îlahîyetê dişîne wir û bi alîkarîya wê dixwaze bibe endama çavdêr a Rêxistina Konferansa Îslamî RKÎ ku navenda wê li Cideyê ye û 57 dewlet endamên wê ne. Sekreterê giştî yê rêxistinê di hezîrana 2010ê de çû Pekînê. Wekî din, ziyareta Riyadê ya Meng Jianzhu, wezîrê kar û barên hundir, di cotmeha (çirîya pêşîn) 2010ê de, û îmzekirina peymaneke hevkarîya ewlehîyê ya di navbera her du welatan de, nîşanên viyaneke hevpar a xurtkirina "têkoşîna dijterorîstîyê" ne.

A. G.

Wergera ji fransî: Simko Destan

WIKILEAKS

# Gava sazî nema dikarin razên xwe biparêzin

FELIX STALDER *

Malpereke înternetê rêveberiya Obama dihejîne. Çekûrextkirî bi jibergirtiyên korsan ên ji sed hezaran belge û nameyên dîplomatîk pêk tên, ev medyaya çeşxê nû di 28'ê mijdara 2010'an de, bi hevkariya gelek rojnameyan, dest bi weşandina wan kir. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li hemberî vê rewşê pir bi qarewar tevgeriyan. Lê belê, çi tê serê WikiLeaksê bila were, ji niha û pê ve êdî ti tiştê wê nikaribe pêşî li eşkerekirina belgeyên veşarî bigire.

Sazî û dezgehên ku roj bi roj beş û şaxên nû li wan zêde dibin û hevkarîyan bilezûbeztir didomînin, bere bere hejmara daneyên dîjîtal ên desttêwerdanê jî mezintir dikin. Herikbarî û reaktîvîte peyvên wan ên veker in; bi pêşketina dezgehên ku sînorên wan hertim şêlotir dibin, hilberîn û parvekirina agahîyan jî zêdetir dibe. Pirçavîtîya sazî û dezgehan, ku weke temînata berhemdarîya wan tê qebûlkirin, parastina dane û agahîyan jî pir dijwar dike.

Çizirîn û îfşabûnên di demên dawî de jî ji ber gelek dîyardeyan pêk hatin: Yek jê nebûna kabîlîyetê ye bi taybetî gava ku pergalên firotinê yên ewlekarîya wan dibin sedem ku korsan numreyên bi hezaran kartên bankayê bi dest bixin; yeke din, înîsîyatîva bi deh hezaran "gazîkeran" e, bo nimûne bûyera dosyayên eskerî yên ku ji alîyê Wikileaksê ve hatin eşkere kirin. Dîyardeyên din jî xwe dispêrin hêvîya qezenceke malî, mesele, di sala 2008ê de karmendekî bankaya swîsreyî HSBCyê dosyayên li ser amadekarîya hin karên nelirê firotin kargerîyên malî yên fransî, spanî û îtalî.

Hem li bankayan hem jî di qadên parastinê de, nêzî tevahîya belgeyan weke veşartî hatine mohr kirin û arşîv kirin. Li gel vê yekê jî, hejmareke mezin kes dikarin xwe bigihînin wan, bo nimûne bi hezaran karmendên xwedî asta navîn a hîyerarşîyê yên her roj pêşwazîya vê lehîya agahîyan dikin û wan dinirxînin. Ji ber ku, ev belge bi kêrî tiştekî werin, nirxandina daneyên wan, desttêwerdan û parvekirina wan pêwîst e: nabe ku bi rê û rêbazên burokratîk yên zêde giran, bi dijwarkirina radeya ewlekarîyê an jî bi nimûnandineke pir asê, nirxandina wan were giran kirin. Divê em bînin bîra xwe ku nebûna qabilîyeta ajansên saloxdarîyê yên amerîkî ya ji bo lihevgihandina agahîyên ku bi destê îdareyên cuda cuda hatibûn kom kirin, ji alîyê Komîsyona neteweyî ya têkildarî dosyaya êrişên 11ê îlona 2001ê ve bi zimanekî pir tûj hatibû rexne kirin.

Paradoks di nav pergalê bixwe de ye. Divê agahî bi serbestî biherikin da ku karibin xwe bigihînin şaxên cuda yên beşên kompleks û di encamê de hem bi kêrî pêkhatina operasyonên hostane bên, hem jî di heman demê de raz û sirên têde bên parastin. An na, di nav sînorên pir asê de parastî, nenirxandî û bi têkildaran re neparvekirî, ew ê derfetê nedin nasîn û danîna têkilîyên ku di paşerojê de wê pêwist bin.

Li gor sefîrê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê yê li Almanyayê John Kornblum, du mîlyon û pênc sed hezar kesan dikaribû xwe bigihanda binesazîya ewlekarkirîya artêşa amerîkî (1), SIPRNETê. Ev hejmar di heman demê de nîşan dide ku dezgeh û teknîk pir musaît in ji bo ku agahîyên veşartî ji alî kesên din ve bên bi dest xistin.

Girêka sereke ya agahîyên veşartî yên demên dawîyê li welatên demokratîk bişkivî: Îslanda, Dewletên Yekbûyî… Ji tesadufeke besît bêhtir, ev nîşana krîzeke sazîyên wan e. Rêveberên rojavayî bi wan daxuyanîyan bê navber banga vegera bo li nirxên sincî dikirin. Em bînin bîra xwe ka bi kîjan bawerîyê serokwezîrê brîtanî Anthony Blair parastina fikra *"şerê mirovhez"* dikir: bi vegotina fermî, sedema vegirtina Afxanistanê, pêşvebirina welêt, ji nû ve avakirina binesazîyan û azadkirina jinan (2) bû. Kêlîka ku hat qebûl kirin ku li Îraqê çekên qirkirina girseyî tunene, bi lezûbez rewatîyeke nû ya ji bo dagirkirinê hat peydekirin: daxistina Saddam Husên wê li Rojhilata Nêz rêya dewleta huqûqê vekiriba û pê re jî perspektîvên nû yên bazirganîyê. Vê îluzyonê wê nikaribûya zêde dewam bikira.

Ev hevnegirîya ku di navbera gotin û kirinan de roj bi roj beloqtir dibe, herweha di pêkanîna projeya paşerojeke lihevhatî a rewakirina kirinên wan de dibe palpiştek ji bo xuyabûna nerewatîya pergalên sîyasî yên rojavayî. Gava tenê kirasekî sincî li holê dimîne, şahidîyên li ser operasyonên rojane yên li cihê bûyerê ji bo nêrînên raya giştî dibin hejînên danjibîrkirinê. Li pêşberî heqîqeta dijwar, sedemên ketina nav şer bi carekê weke ku hebin xuya dikin. Ya dimîne êdî tenê întîbaha makîneyeke şermnenas e û ev makîneya ku ketîye nav pêşbazîyeke hovane, nahêle kesên xwe lê girtine bi awayekî erênî û berdewam xwe nas bikin.

Heman nehezî û xemsarî dikarin di nav şirketên mezin de jî xwe bidin xuyakirin. Îdeolojîya nûlîberal hertim tîne bîra karmendan ku ne pêwist e tiştekî hêvî bikin ji karbidestê ku dikare her kêlîkekê wan ji kar bavêje û kesên din li şûna wan bi cih bike, bi taybetî jî dema ku êdî performansa wan nikaribe bersivê bide hedef û tarîfên hertim guherbar ên şirketê. Teknîkên bênirxkirin û qelskirina ewlekarîyê gelemperîtir dibin. Beşên herî li jêr ên silmeya hîyerarşîyê, ji niha ve kadroyên navîn bi dest xistine û tesîrê li rêveberan jî dikin. Herçende tezmînata jikaravêtinê têra xwe derfetên mezin deryne ber van ên dawîyê jî, peyman pir zelal e: Sazîbûna nû û qusandina butçeyan dikarin, di kêlîkekê de, karmendekî ji karê wî bikin.

Li gelemperîbûna bêewlekarîyê jiholêrabûna gav bi gav a şemayên hîyerarşîk zêde dibe û cih dide awayekî xebatê yê zêdetir girêdan û zanînê ferz dike. Ji ber vê yekê, ji endamên şirketekê tê xwestin ku xwe bi temamî bidin karên xwe, serbixwe bin û kabîlîyeta xwe ya pêşengîyê îsbat bikin. Wekî din, di artêşekê de jî bicîhanîna fermanan ne bes e: divê mirov afirîner be û hemû hêz û hişê xwe bide karê xwe. Paradoks jî li vir dest pê dike. Çawa mirov bixwazin li hemberî karsazekî ku êdî qet girîngîyê nade projeyên dîrokî yên hêjayî fedakarîyên mezin dilsoz tev bigerin û di ser de jî eger ev karsaz di her fersendê de jî vîna xwe ya ji bo ziwakirina gola mezin a çavkanîyên mirovî yên pevguhêzbar dîyar bike?
Bi înternetê re, binesazîyeke sofîstîk ya ragihandinê ji niha û pê ve wê berdest be ji bo her kesê ku ji vê bêahengîya mezin a ji bo "teqandina pergalê" enerjî û motîvasyonê werdigire. Çend kesên jêhatî û dilxwaz bes in ji bo ku parçeyên puzzelekê bigihînin hev û dirûvekî biheybet ji wan bi gewde bikin. Stratejên eskerî vî dirûvî weke "kesê raser-xurt" bi nav dikin û wî weha tarîf dikin: *"bi tena serê xwe pêkhatî ji bo tevdana rêzek bûyerên mîna şelaleyekê, lihevsiwarbûyî: xirakirina pergalekê, rawestandina wê ya bi temamî, an jî jiholêrakirina rêzikên li tevahîya cîhanê di merîyetê de ne. Kesê raser-xurt xwedî têgihîştineke bikarxistin û lihevgihandina pergaleke kompleks e; xwegihandina firehzemîneke tevnên hesas; ragirtina hêzeke ku karibe li dijî tevin an jî pergalekê xwe bizivirîne û her dawî jî: vîna bikaranîna wê* (3)*"*.

Avakarê Wikileaksê Julian Assange û pênasa vê profîlê tam li hev diguncin. Tevina wî bi temamî pala xwe dide wî bi xwe; Ew hem hêza wê hem jî qelsîya wê ye. Wikileaks heman derbasekên ku hemû komên li derdora kesayetîyeke karîzmatîk xwe li hev girtine, vedinase: otorîtarîzm, nebûna prosedurên navxweyî, îhtîmala şaşîyeke mirovî û dawîyê, xetereya êrişên hundirîn an jî derveyî yên zirarê didin şexs an jî îtîbara şexsan. Lê belê çi bi serê Asseng û Wikileaksê bê bila bê, ev model ji niha û pê ve êdî heye. Ew ê xwe li deverên din û bi awayên din ji nû ve hilberîne.

Bêserûberbûna rêzikên medyayê û mezinbûna komên çapemenî û ragihandinê bû hêmaneke girîng a xirakirina qada gelemperî ya demokratîk. Zextên di warên aborî û sîyasî de bûn sedem ku redaksîyonên medya û çapemenîyê giranîyê bidin belavkirina nûçeyên sivik (*soft news*), û ji lêkolînên têkildarî pirsgirêkên gel bêhtir jîyan û cîhana modeyê derînin pêş û cihekî fireh bidin şiroveyan. Hukûmet jî ji alîyên xwe ve, fêrî lîstikên medyatîk bûn û niha ew bi xwe agahîyan bi dizî difirînin nav destên kesên din û dixwazin ew kes wan agahîyan eşkere bikin. Rojnamevanên ku bi deshilatîyê ve hatine girêdan û agahîyên xwe ji desthilatîyê werdigirin, dawîya dawî, di dema şer de, konên xwe bar kirin tenişta hêzên eskerî.

Di vê wateyê de, blog û "rojnamevanîya welatî" demekê weke ku bûn şûngirên sazûmana berê ya medyayên kevneşop. Eger serûbinbûn hê pêk nehatibe jî, qada raya giştî hêdî hêdî dikeve nav veguherîneke. Pêşengên cihêreng derdikevin holê û vî warî dewlemend dikin. Xetereyên huqûqî yên girêdayî belavkirina naverokên hesas jî tên berteref kirin: mirov bi xwe êdî agahîyeke xeter eşkere nake, lê belê wê agahîya ku filan an jî bêvan malper eşkere dike, datîne ber xwe û tehlîl dike. Di rewşên zêdegavîyê de, daneyên hesas didin malperên ku tu têkilîya wan a diravî li gel komên pîşesazî yên medyayê tune. Yên nûhatî sûdê ji bikaranîna hem qelsîyên wan (tedbîra zêde) hem jî ji hêza wan a sereke, ya medyayên kevneşop werdigrin: îmkana hilberandin û sazkirina çîrokên ji bo berxwarina bi awayekî girseyî. Hilberîna rojnamevanîya lêkolînî ji nû ve xwe bi serûber dike û ji xwe re qada jîyanê dibîne, ji ber ku ji demeke nêz ve be jî, ew ji çavkanîyên nû yên diravê sûdê werdigirin.

Malpera Pro-Publica (4) a ku di 2007ê de li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hat saz kirin, xwe bi van hevokan derpêş dike: *"Hola redaksîyoneke serbixwe a bêyî ku kara diravî ji xwe re bike armanc, ji bo berjewendîyên raya giştî lêkolînan hildiberîne (...), çeşnê ku medyayên kevneşop wê bi her halî bi çavê tiştekî luks lê mêze kiriba"*. Di nîsana 2010ê de sazûmaneke nêzî vê, Buroya Rojnamevanîya lêkolînî, li Londrayê derdiket holê. Ev malperên Înternetê bi hevkarîya dezgehên rojnamegerîya kevneşop ên lêkolînên xwe belav dikin, dişuxulin. Binesazîyên nû, yên weke Documentcloud, weha tên tarîf kirin: *"komek çavkanîyên belgeyî û amûreke alîkar ji bo binxêzkirin, biserûberkirin û weşandina agahîyan"*. Ev binesazîyên nû her weha bi rakirina rizdeyên navbera holên redaksîyonê û sazîyan, dixwazin bikaranîna çendeyên mezin ên daneyan hêsantir bikin. Di nav vê şemayê de, wezîfeyên cur bi cur ên rojnamegerîya lêkolînî pêk tînin - parastina çavkanîyan, vekolîna belgeyî, berhevkirina belgeyan, sinifandin û biserûberkirina agahîyan, destekdayîna ji bo tegihîştin û belavkirina agahîyan - di navbera gelek hevparên xwedî modelên cihêreng ên aborî de tên parvekirin (şirketa bazirgan, komeleya ji bo karûbarên derî-qezenca diravî, tevn) hemû di nav ahengekê de dixebitin da ku karibin xwe bigihînin heqîqeta bûyera di nav civakê de.

Berî avakirina Wikileaksê, Assange stratejîya xwe ya têkoşîna li dijî desthilatdaran weha rave dikir: *"Dezgehek di razên xwe de çiqas neheq an jî 'hesûd be, ewqas jî tirsa çizirandina agahîyan li cem rêveberên wê û li nav derdora nêz a biryarwergiran vediguhere paranoyayê.* [Îfşakirina belgeyan] *bivê nevê dawîya dawî dibe sedemê sistbûna çerxên ragihandina navxweyî, dibe sedemê ragirtina çendeyek mezin a agahîyan, û di encamê de jî di asta tevahîya dezgehê de dibe sedemê kêmbûna zanîn û agahîyan* (5)*."*

Analîzvanên karûbarên saloxdarîyê li dijî hewldanên veşartinê hişyarîyan didin. Li gor wan zeximkirina tedbîrên parastina agahîyan, zêdetirkirina beş û şaxan, û veşartina hejmareke roj bi roj mezintir a daneyan, wê ne helwêsteke baş û bikêrhatî be. Li gel vê yekê jî wisa xuya dike ku rêya ku piranîya servîsên saloxdarîyê heta niha jî bi biryardarî dişopînin neguherîye (6). Hema rojekê piştî îfşayên Wikileaksê, daîreya amerîkî ya dewletê berî her tiştî biryar da dawî li têkilîyên xwe û SPIRNETê (tevna bi artêşê re parvekirina agahîyên sinifandî) bîne.

Heta ku medya û çapemenî bi çavkanîyên navxweyî yên desthilatîyê ve girêdayî bin, vîna wan a xebatê ya li ser agahîyên bi rastî jî hesas, wê sînorkirî bimîne. Ev rewş nexasim li Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê pir berbiçav e. Dema nirxandin û belavkirina belgeyên ji alîyê Wikileaksê (7) ve bidestxistî, ketin rojevê, *The New York Timesê* bi xwe jî bi dudilî xwe da ber. Her çi organên din ên çapemenîyê ne, wan yekcar xwe weke dijberên belavkirina bi vê rêbazê ya belgeyên mijara gotinê îlan kirin.

* Perwerdekarê li zanîngeha huneran a Zurîhê û lêkolînerê li Enstîtuya teknolojîyan a Vîyanayê. Guhertoya pêşî ya vê nivîsarê di Mutemagazine. orgê de hatîye belavkirin.

1 Hevpeyvîn, Der Spiegel, Hamburg, 29'ê mijdara 2010ê

2 Binihêrin Christine Delphy, "Une guerre pour les femmes?" ["Şerekî ji bo jinan"], û Serge Halimi, "Photos sans Lumières" ["Wêneyên bêroniyê"], Le Monde diplomatique, adara 2002ê û îlona 2010ê

3 "The Super Empowered Individual" ["Ferdê pir bihêzkirî"], Zenpundit, 28ê cotmeha 2006'an, http://zenpundit.blogspot.com.

4 Julian Assange, "The Non-linear Effects of Leaks on Unjust Systems of Governance" ["Bandora nerêzkirî ya îfşayan li ser pergalên neheq yên hukûmdariyê"], http://cryptome.org, 31ê qanûna 2006ê

5 Scott Stewart, "WikiLeaks and the Culture of Classification" ["WikiLeaks û çanda rêzkirinê"], Stratfor.com, 28ê cotmeha 2010ê

6 Glenn Greenwald, "NYT v. the world: WikiLeaks coverage", Salon.com, 25 îlon 2010

7 Glenn Greenwald, "NYT v. the world: WikiLeaks coverage", Salon.com, 25 îlon 2010

Wergera ji fransî: Baran Nebar

WIKILEAKS

# Daxwaza mirina peyamnêr

PHILIPPE RIVIÈRE

***"Eger azadîya derbirînê nemîne, em ê eynî mîna pezên ber bi selexanê ve tên birin, lal û bêdeng bibin."***
**George Washington**

Ev gotareke wisa girîng bû, ku bavê avakarê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê îro jî wê îmza xwe bavêta binî. 21ê Çileyê 2010ê, Hillary Clinton li ser azadîya înternetê diaxivî û bi rexnegirtina li welatên ku *"astengîyên elektronîk danîne pêşîya welatîyên xwe ji bo ku welatî nikaribin xwe bigihînin hin beşên tevnên cîhanî* [û] *peyv, nav û hevokên di motorên lêgerînê de ji holê rakirine"*, wezîra karûbarên DYAyê bawerîya serok Barack Obama ji xwe re dikir rêber: *"Agahdarî çiqas bi serbestî biherikin, civak jî ewqas xurt û bihêz dibin."* Bi navê vê *"bawerî"*ya bi azadîya derbirînê û bi *"tevnên agahîyê* [yên ku] *dihêlin mirov tiştên nû vebibînin û dikin ku hukûmet jî hesabên kirinên xwe bidin"*, rêveberîyê ji bo pêkanînê, radihişt bernameyeke piştgirîya ji bo *"amadekirina amûrên nû yên derfetan didin welatîyan da ku bi şikandina sansura siyasî, karibin mafê xwe yê xweîfadekirina azad bi kar bînin"* û hişyarî dida hukûmetên ku *"mîna dîktarorên demên berê,* (…) *berê xwe didin ramyarên serbixwe yên ku van amûran bi kar tînin"*.

Gotareke şahane. Li gel vê yekê jî, weke keseke bê guneh a ku li kolanê telefona wê jê didizin û ji ber vê yekê bang li sazîya dardekirinê dike, Xatûn Clinton jî bû mexdûra êrîşeke korsan… bi armanca gilîkirina rêxistina Julian Assange li cem dadgerîyê, di 30-10-2010ê de niyeta xwe ya *"wergirtina tedbîrên dijwar"* eşkere kir. Baş e, sûcê Assange çi bû? Li gel pir tiştên din (li hember binihêrin), malpera wî herweha eşkere kiribû ku Xatûn Clinton ji dîplomatên xwe yên li Yekîtîya Neteweyan xwestibûye ku casûsîyê li kedkarên YNê bikin û demek ji ya din zûtir daneyên wan ên bîometrîk, şîfre û numreyên kartên wan ên kredîyê bi dest bixin û bi vî awayî WikiLeaksê *"civata navneteweyî"* dixist nav xeterê.

Di demeke kin de ji devê şîrovekerên hemû baskên siyasî hêrs difûre, dikevin nav lezûbezeke ecêb, ji bo di bernameyên televizyonan de bixwazin ku *"ew pîç were cezakirin"* (rojnamevan Bob Beckel, di Fox Newsê de), ku ew ji ber sûcê *"terorîzmê"* were dadgehkirin (Peter King, ji komîteya ewlekarîya hundirîn), an jî ew eynî mîna girtîyên li Guantanamoyê weke *"şervanê dijmin"* were dîtin, (Newt Gingrich, di Fox Newsê de). Ji qewlê mîlîtanekî aştîxwaz û binavûdeng, ji vê hewldana lînckirinê ku gelek caran nimûneyên wê li Dewletên Yekbûyî hatine dîtin, bêhna genî ya maccarthysmê difûre (1). Bi avakirina WikiLeaksê, Assange dixwest ronahîyê bide ser *"komployên"* têra xwe berbiçav, yên weke lihevkirinên pişt derîyan ên di navbera desthilatdaran de ku pir bi hesasî ji raya giştî hatine veşartin.… Çend roj piştî destpêkirina weşandina bîranînên demokratîk, Çînê ketina nav malpera WikiLeaksê asê kir. Hukûmeta amerîkî şîret li xwendekaran kir da ku di blogên xwe de behsa malperê nekin û artêşa hêzên hewayî jî qedexe danî ser ketina nav malperên *New York Times, Der Spiegel û The Guardianê*, ji ber ku agahîyên WikiLeaksê diweşînin.

Hat dîtin ku sê operatorên sereke yên bankayên li ser Internetê –ku hertim derfetê didin ku alîkarîyên diravî ji Ku Klux Klan re bên şandin– qebûl nakin ku ew ji bo pere şandina ji rêxistina Assenge re bên bi kar anîn. Li hemberî vê helwêstê, berdevkê WikiLeaksê ev şirove kir: Visa, Mastercard û Paypal bi vî awayî li xwe mikur hatin ku ew dibin *"amûrên siyaseta derve ya Amerîkayê"*. Bêyî egereke qanûnî nîşan bide, şaxê bankayî yê posteya swîsreyî, Postfinanceê jî, dest danî ser hesabê *hackerê* avustralyayî û bikaranîn asê kir.

Hat dîtin ku Tabloya Softwareyê – malpereke ku daneyan radixe pêş çavan– sansûr daneanî ser belgeyan bixwe, lê belê sansûr danî ser kurteyeke besît a naverokên van "çizirînan", bi îdîayeke zêde ne jidil a weke xwedêgiravî WikiLeaks ne xwedî *"mafê belavkirina van agahîyan"* bû. Hat dîtin ku Amazon, ku kirêdareke malperên Internetê ye û di ser de jî gava ew cih dide tiştên ku ne ji alîyê wê ve amadekirî, bi qanûnên destlênedanê tê parastin, bi înîsîyatîva xwe hesabê Wikileaksê asê kir. Tevî ku Wikileaksê ji kirêdareke malperên Internetê ya fransî ya li Roubaixê û bi navê OVHê ji xwe re hin server kirê kirine, hat dîtin ku li Parisê wezîrê aborîya dîjîtalî, Eric Besson –berîya vê wezîfeyê bi çend mehan ew ji parastina nasnameya neteweyî ya welatê Voltaire berpirsîyar bû– ji Konseya giştî ya pîşesazî, enerjî û teknolojîyê (CGIET) daxwaz kir ku *"demek ji ya din zûtir derfetên dawîleanîna bicihbûna vê malperê li Fransayê"* destnîşan bike. Dadger di vê navberê de doza li ser mijarê da paş ji bo ku li ser esasê, nirxandinek were kirin.

Herweha hat dîtin ku Every DNSê –ku operatoreke navên qadên Internetê ye û wezîfeya wê ew e ku tesbît bike ku li ser tevnekê filan an jî bêvan navnîşana malpera Internetê heye– rasterast ji ser karta *Net*ê navê WikiLeaks.orgê xira kir û avêt. Hemû qelsîyên Internetê (taybetîyên wê yên navendîkirinê, girêdana wê ya bi DYAyê ve) û hemû rêbazên tedbîrên zextkirinê ku "azadîparêzên" tevnê, bi awayekî zêde mubalexekirî be jî, bi salan e dianîn ziman, hatin bi kar anîn. Afarozkirina berdevkê WikiLeaksê her dijwartir dibû. Bi taybetî, li Swêdê, sûcbarkirina destdirêjîya cinsî, ku ji alîyê Assange ve weke *"bahaneyeke siyasî"* hat nirxandin û redkirin. Ji bona ku bi vî awustralyayîyê çûbû başûrê Îngiltereyê wî sûcî bidin qebûlkirin, nêçîreke ecêb dan destpêkirin. Eger Qralîyeta Yekbûyî ji ber vê dozê ew bo Swêdê dersînor bikira, Swêdê jî ji ber îfşakirina belgeyên wezareta karûbarên derve ya Amerîkayê paşî wê ew radestî Dewletên Yekbûyî bikira gelo? Vê rêzefîlma dîplomatîk û dadgerî coş û heyecaneke wisa çêkir ku Wikileaks deranî navsera lîsteya navên malperên herî navdar ên cîhanê û berdevkê wê, ji alîyê kovara *Time*ê ve piştî xwedîyê Facebookê Mark Zuckerberg, wekî duyemîn kesê herî bi tesîr ê salê hat hilbijartin.

Piştî ku Rêxistina Wikileaks êdî di kesayetîyeke karîzmatîk lê herweha gumanbar de hat bi nav kirin, gava duyemîn ew bû ku raya giştî bihata îkna kirin ku ev kesê gumanbar tu azadîyên ku îdîa dike pêk tîne, heq nake. Pirsa mezin jî li vir xwe dide der: bi weşandina telegrafên dîplomatîk ên ku ji alîyê eskerekî amerîkî ve bi dizî hatibûn ragihandin (ev korsanê ku muhtemelen tehlîlkerê Bradley Manning bû, ji Gulana 2010ê ve, li Virjînyayê, li baregeha Quantico rojê bîst û sê saetan dihat tecrîd kirin û ji ber vê sûcbarîya mezin, dibe ku pêncî û du sal cezayê girtîgehê lê were birîn), gelo WikiLeaks karekî rojnamevanîyê dikir an jî sîxurî? *"Ji bo ku li ser navê qanûnê kesek ji ber pêkanîna sîxurîyê were mehkûm kirin, divê dadgeh bikaribe îspat bike ku bersûc xwedî niyeteke xirab e. Bi WikiLeaksê, ev tiştekî pir hêsan e"*, Gabriel Schoenfeldt, nivîskarê pirtûka di derbareyê raz, ewlekarîya neteweyî û rojnamevanîyê di rojanemeya *The Wall Street Journalê de* (9ê kanûnê) wisa îdîa dike. Hûrmijûlîya taybet a nûnerê wezareta karûbarên derve ya DYAyê Philip J. Crowley ji bo piştrast bike ku WikiLeaks *"ne rêxistineke rojnamegerîyê ye"* ne bê sedem e. Bi vî awayî Crowley dixwaze ji bo darizandina WikiLeaksê zemîna qanûnî pêk bîne. Eger WikiLeaks ´etarekî malê dizîyê, sîxurek an jî terorîstek be, hingê cezakirina vê malperê wê nekeve çarçoveya binpêkirina xala Yekemîn a destûra bingehîn a DYAyê, ku di derbareyê azadîya derbirînê de ye. *"Pir diyar e ku Assange di meşandina karûbarên xwe de xwedî armanceke taybet û polîtîk e,* Crowley dû re jî weha lê zêde dikir "*û ez difikirim ku ev yek têrê dike ji bo ku ew weke rojnamevan neyê qebûlkirin."*

Ev têgihîştina ecêb a beramberî rojnamevanîyê berê jî di doza *Belgeyên Pentagonê* de ketibû rojevê. Di 1971ê de, tehlîlkerê eskerî Daniel Ellsberg ji bo *New York Times* û hivde rojnameyên din heft hezar rûpel belgeyên lêkolîneke veşartî eşkere kiribûn. Wî ew kopî kiribûn, ji Pentagonê derxistibûn derve û nîşan dabû ku di derbareyê şerê Vîyetnamê de *"rêveberîya Johnson, ne tenê raya giştî herweha Kongre jî bi derewên sîstematîk xapandibû"*. Hewldanên hukûmetê yên ji bo sansurkirina weşandina wan belgeyan bûn sedem ku doz here ber destê Dadgeha Bilind. Di dozê de azadîya derbirînê bi ser ket. Ji hingê heta îro, derew gihîştine asta herî bilind. Palpiştên sexte rê dan Amerîkayê ku Iraqê dagir bike. Li gor *Washington Postê* hejmara belgeyên ku weke "raz/sir" hatine sinifandin, li Dewletên Yekbûyî di navbera salên 1996 û 2009ê de, ji 5,6 mîlyonî gihîşt 54,6 mîlyonî.

1 Tom Hayden, "The Lynch-Mob Moment", 8 Çileya peşîn 2010. http://tomhayden.com/

Wergera ji fransî: Baran Nebar

RODI KHALIL: **Havîn III**, teknîka taybet ya li ser tûwalê, 80 x 60 cm

# Mîratgirên lanetî yên Peravên Îvoriyê

VLADIMIR CAGNOLARI *

*Gava hûn li Peravên Îvoriyê digerin, di cî de pê dihesin ku hindek cih û avahî hene ku* [Felix] *Houphouet* [-Boigny] *ava kirine, û cih û avahiyên din hene ku* [Laurent] *Gbagbo ava kirine. Ji bilî van tu tişt nîne.*(1)" 4'ê cotmeha 2010'an, heyama berî hilbijartinên serokdewletiyê, serok Laurent Gbagbo bi van gotinan qeba reqîbên xwe Henri Konan-Bedie û Alassane Dramane Ouattara,dixwast ku her du siyasetmedarên muxalif jî doza mîratgiriya nasnavê "bavê neteweya" Îvorî dikin.

Piştî 33 salên desthilatdariya mutleq, Houphouet-Boigny di sala 1993'yê de mir. Heyama destnîşankirina kesê ku dê biba xelefê wî pir bi pirsgirêk derbas bû. Jixwe sersebebê hemû qeyranên ku ev 17 sal in têne serê wî welatî, pirsgirêka destnîşankirina xelefê wî ye. Gbagbo, Bedie û Ouattara nasyarên hev in û bi dehan salan e hatûçûya hev dikin, pêşiyê bûne hevpeyman, paşê, di çarçoveya yariya siyasî ya bi jeometriyeke guherbar de ku kezeba aboriya Efrîkaya Rojavayî dirizîne, bûne dijberên hev.

Ji nav her sê mîratgirên zahirî yên serokdewletê yekem, Bedie yê 1934'ê ji dayik bûyî, wek "kurê rastî" dihate dîtin. Her wekî rêberê xwe [Houphouet-Boigny] yê ku rê û derfet dane hilkişiyan û bihêzbûna wî di siyasetê de, Bedie jî ji xelkê Baouleyê ye. Piştî temamkirina xwendina xwe li Fransayê, sala 1960'ê dibe yekemîn sefîrê Îvoriyê bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Neteweyên Yekbûyî (NY). Lê belê, bi taybetî bi erk û postê xwe yê wezîrê aboriyê, ku bo panzdeh salan bi rê ve bir, cihê xwe di bîra xelkê welatî de çêkir: dewra "mûcîzeya îvorî" ye, pereyê kakaoyê pir û mişe bûye û herkes dizane ku wezîr xwe jê bêpar nahêle. Gava ku skandal aşkere dibe, Houphouet-Boigny wî diqewirîne, û sê sal tê ve diçin, vê carê wî dike serokê Meclisa Neteweyî. Herçend di wê heyama yek-partîtiyê de –Partiya Demokrat a Perava Îvoriyê [Parti démocratique de Côte d'Ivoire (PDCI)], Meclis bes holeke mezin a tomarkirinê ye, li gor destûrê erkê serokê Meclisê ye ku di rewşa valabûna desthilatê de ´hukûmeta muweqet durist bike û bibe desthilatdar. Bi vî rengî, Bedie di pêşbirka xelefiyê de "pozîsyona navendî" de ye û di cî de dikeve xeyala wê hindê.

Lê belê, mêvanekî nepayî li malbata mîratgiran zêde dibe: Ouattara, ku li dû danûstandinên di navbera Houphouet-Boigny û Fona Pere ya Navneteweyî [IMF] de, di çarçoveya Planên verêkxistina tevnî [Plans d'ajustement structurel (PAS)] (2) de vegeriyabû Îvoriyê. Li vir, Ouattara kurê poşman û vegeriyayî ye. Jidayikbûyê 1941'ê li Perava Îvoriyê, piştî temamkirina xwendina xwe ya lîsansê li Haute-Voltayê (Burkina Fasoya niha), xwendina xwe ya aboriyê li DYA'yê bi awayekî pir serkeftî dibe serî û dibe cigarê IMF'ê. Gava sala 1990'ê serok Houphouet-Boigny wî wek serokwezîr radigihîne, mûcîzeya îvorî di halekî bê serûber de bû: piyaseya kakaoyê daketiye dereceya xwe ya herî nizim, deynê dewletê çend beramber zêdetir lê hat, û bi ser de jî "Pîremêrê" westiyayî (wek ku digotine Houphouet-Boigny) diviya pêvajoya derbasbûna pergala pir-partîtiyê bi rê ve bibira. "Alassane yê amerîkî" û teknokrat, weke jê re digotin, xwedan bext û şans bû ku li derveyî çiravka siyasî û entrîkayên qesrê mabû. Ev kurê hilgirtî ku tu kesî nas nedikir, tê hebû ku bibe cihê piştrastî û dilniyayiya dozkarên desthilatê, lê berevajî, bû sebebê nerehetbûna wan: " Pîremêrê " nexweş, ku li Swîsre û Fransayê, ketibû dû dermankirina nesaxiyên xwe guhertinan di destûrê de çêdike da ku serokwezîrê wî bikare di nebûna wî de dewletê bi rê ve bibe.

Lîberaliya wî dike ku Ouattara zû bi zû dest bavêje arizîkirinê û mesrefên qada giştî kêm dike. Bi heman helkeftê, bi hemû hêza xwe hewl dide wê sergêjî û bêserûberiya ku xwîna rêvebiriyê dimêtin ji navê rake. Di karûbarên darayî de reforman dike û bi vî rengî di nav kesên ku hêj nû dest bi bacdanê dikirin de gelek nehezan ji xwe re çêdike. Ouattarayê ku jixwe bûbû şayanî teqdîra kêm kesên ji xelkê asayî, vê carê jî bûbû gefek li ser serê çend rantxurên rejîmê. Heta wê dereceyê ku gelek alî derdikevin û rexneyan li wî digirin ku bi rastî ne îvorî ye. Dawiyê Houphouët-Boigny bixwe mecbûr dibe rabe bi aşkerayî şecereya serokwezîrê xwe piştrast bike.

Reqabeta di pişt perdeyan de dibe binasê rabûna hêrs û kerbên mîratgiran, roja girîng a 7'ê kanûna 1993'yê derdikeve meydanê. Ouattara leza xwe dike da ku wefata serekê dewletê bi rêya radyoyê ragihîne, li aliyê din, kêm wextek piştî wî, Bédié derdikeve ser televîzyonê da ku doza serokdewletiya muweqet bike, ku li gor destûrê wisa bû. Roja paştir, Ouattara ji Agence France presseyê (AFP) re diyar dike ku hîç niyeteke wî ya îstifakirinê nîne. Lê belê, li hember fişara navneteweyî, bi taybetî fişara Fransayê, axirî destan jê dikêşe. Ev xitimîn di heman demê de pêşbiriya kêşe û xitimînên din ên mezintir bû.

Ouattara yê ku vegeriyabû IMF'ê, xwe ji bo hilbijartinên 1995'ê amade dike. Lê belê, têgeha munaqeşebar a 'îvorînî'yê, ku Bédié bi armanca astengkirina Ouattara´yî derxistibû rojeva giştî, nehişt ku Ouattara berendamiya xwe ji bo hilbijartinan ragihîne. (3) Hingê, kevneserokwezîrê lîberal radibe bi Gbagboyê sosyalîst re.hevpeymaniyê girêdide Navê Gbagbo 1988'ê gava ku li hember Houphouët-Boigny % 18'ê dengan wergirtibû bi berfirehî hatibû bihîstin, bi wî rengî bûbû yekem siyasetmedarê ku wêrîbû qeba bavê serxwebûna neteweyî bixwaze. Lê belê, beramber fêl û dolabên desthilatê, Ouattara û hevpeymanê wî yê nû biryara boykotkirina hilbijartinan digirin, ku dawiyê % 96,44'ê dengan li ser malika Bédié têne tomar kirin. Her du birayên dijmin, ji hingê pê de divê hesabê reqîbê sêyem jî bikin.

Gbagboyê ku perwerdeya tarîxê dîtibû û akademîsyen bû, bi rengekî kurê serhildêr bû. Gbagboyê ku 1945'ê li Gagnoayê, li dilê xwezaya hov a welatî, ji dayik bûye, bi rêya çalakvaniya di sendîkayên xwendekaran de dikeve nav siyasetê. Dijatiya hegemoniya PDCI'yê dike ku li ser zankoyan zal e, û lewma çend caran tê girtin: cara ewil di 1969'ê de (berî ku ji bo "tembebûn û selihînê" bête mecbûrkirin ku di navbera salên 1971 û 1973'yê de du salên xizmeta eskeriyê bike), û cara duyem jî sala 1992'yê, bi emrê Ouattarayî, ku hingê serokwezîrê sadiq ê Houphouët-Boigny bû ku qet dil lê nebû desthilatê digel kesine din par ve bike. Sala 1982'yan, bi dizî û nihênî Front populaire ivoirien (FPI) [Eniya Gelê Îvorî] dadimezirîne ku tevgera wî dibe endama Enternasyonala Sosyalîst. Piştî ku bo Parîsê hate nefîkirin, Partiya Sosyalîst a Fransî pêşwaziyê lê dikin ku ji hingê ve hindek endamên partiya navbihorî piştgiriya wî dikin. Lê belê François Mitterand, ji tirsa ku hevpeymanê xwe Houphouët-Boignyî biazirîne, tu carî Gbagbo bi resmî qebûl nekir, ji ber ku Houphouët-Boigny di heman demê de parêzkarê qada taybetî ya frans-efrîkayî bû.

Digel bicihkirina pir-partîtiyê di serê salên 1990'êde, Gbagbo dixwaze muxalefeta resmî bi gewde bike. Di demekê de ku bavê serxwebûnê bêhtir piştgiriya xelkên gund û gundewaran li dora xwe berhev dike, profesorê sosyalîst livînekê dixe nav beşekî biçûk ê xelkê bajarî yê feqîrketî ku xeyala dahatûyeke baştir dikir: ciwan û xwendekarên ji pile û payeyên xwe yên civakî daketî, ku dixwest rûpela " houphouetismeyê " biqelibînin. Bi vî rengî Fédération estudiantine et scolaire de Côte d'Ivoire (FESCI) [Federasyona yekîtiyên xwendekarî û xwendengehî ya Perava Îvoriyê] ava dike, ku vê sendîkayê roleke bingehîn di hilkişiyana hêza wî ya siyasî de hebûye. Sala 1995'ê, sekreterê giştî yê sendîkayê her ew kesê bi navê Guillaume Soro bû ku serhildana çekdarî bi rêk xist (2002-2006) û paşê di çarçoveya rêkeftinên aştiyê yên Ouagadougouyê (2006) de bû serokwezîrê Gbagbo, heta ku piştî hilbijartinên serokdewletiyê yên munaqeşebar ên 2010'ê, vê carê jî bû serokwezîrê desthilata Ouattara.

Bedieyê kurê şûmkirî, Ouattarayê kurê vegeriyayî, û Gbagboyê kurê serhildêr: ev in sê birayên reqîb ku Houphouët-Boigny li dû xwe dihêle. 24'ê kanûna 1999'ê, aktorekî din li pêşbirkê zêde dibe: darbeya leşkerî ku bi vê teşebusê, efserên ciwan ên ji rewşa xwe û ya heyî nerazî, Bedie ji desthilatê anîne xwar. General Robert Guei hêzê bi dest dixe û dawî li rejîma xirhiyayî û dûr ji gel anî: ev qewimîn herweha bû dawiya hukmê PDCI'yê jî. Bedie yê mîratgirê averêbûyî li dû xwe têgeha "îvorîbûn"ê dihêle, ku ev munaqeşe dibe havênê derzên civakî ku Houphouet-Boigny hergav hewl dabû ku tiştên wisa neqewimin. Jixwe bavê serxwebûnê hewl dida hevsengiyeke nisbî di belavkirina postên desthilatê de hebe, yanî qewmên cuda li gor serjimêriya xwe dihatine temsîl kirin. Herweha, heta sala 1994'ê, sê-çar milyon karkerên biyanî, ku "mûcîzeya îvorî" berhemê keda wan bû, dikarîbû deng bidin Houphouet-Boigny. (4)

General Guei, piştî ku li raya giştî aşkera kir ku dê têgeha "îvorîbûn"ê hilweşîne, fikra xwe guherî û bû berendamê serokatiyê di 2000'ê de –û bi vê meremê çend fêlên huqûqî jî kirin da ku reqîbên xwe yên serekî li derveyî pêşbirkê bihêle. Heyama kampanyayên hilbijartinê, êdî ne deng û ne jî reng û rengvedana bavê neteweyê maye. Xelkê Îvoriyê xweşhal in ku dê rûpela çil salên rêvebiriya PDCI'yê biqelibînin, û dervehiştina her du birayên dijmin ên ji rejîma kevin, anku Bedie û Ouattara, ji bilî li herêma bakurî, li tu cihên din nabe sebebê nerazîbûn û dijayetiyan.

Lê belê, "îvorîbûn"ê jehrek danizilandibû ku dê li cesteyê Perava Îvoriyê biba êş û bedeleke giran. Hizb û layengîriyên siyasî di dawiyê de hat û bi sînorên qewmî re bûne yek. Vederkirina Ouattara bi sebebê ku burkînayî ye, di heman demê de hilbijêrên bakurî, ku qederê sêkiyê hilbijêran in, li der û dûr xistin. Gbagbo bi vî rengî li cesteyê Perava Îvoriyê li hember general Guei bi tenê dimîne. Sibetira hilbijartinên serokatiyê yên 22'yê cotmeha 2000'ê, çer ku efserê darbeker têdigihîje ku di hilbijartinan de dorandiye û bi ser neketiye, hejmartina dengan radiwestîne. Herweha endamên lijneya hilbijartinê dide girtin û berê xwe dide radio-televîzyona Îvoriyê (RTI) û li wir xwe serkeftî radigihîne. 24'ê cotmehê, Gbagboyê ku piştgiriya medyaya navneteweyî dabû dû xwe, bi taybetî jî ya Radio France internationale (RFI) [Radyoya Fransî ya Navneteweyî], bang li alîgirên xwe dike da ku dakevin ser şeqam û cadeyan. Herweha dibêje: *"Ji niha û pê de, serokdewletê Perava Îvoriyê ez im."* Alîgirên wî bi ser RTI'yê de dimeşin, dikevine milmilaneya li dijî eskerên ku hê jî li terefê generalî bûn. Alîgirên Ouattara, ku ew jî daketibûne ser cadeyan û dabûne dû pêla xwe ya çalakvaniyê –ew jî doza nûkirina hilbijartinan dikin– ji hêzên jendermeyan piştgiriyeke pir xurt werdigirin .

General Guei tûşî hezîmetê bûbû, û lijneya hilbijartinê axirî Gbagbo serkeftiyê hilbijartinan ragihand, ku % 60'ê dengan ji hilbijartineke ku bi tenê %37'ê welatiyan tê de deng dabû, wergirtibû. Di wan rojên piştî hilbijartinê de sercem sê sed kes hatibûne kuştin. Serokê nû gelek paştir dê li xwe mikur bihata û bigota *"ez di nav şert û mercên karesat de hatime hilbijartin."* Fransa yek ji welatên pêşiyê bû ku serkeftina akademîsyenê sosyalîst nas kir: piştî çend heftayan Fransayê dîsa dest avête hevkariya xwe ya digel Perava Îvoriyê ku bi darbeya qanûna 1999'ê re qut bûbû.

Zincîreya rûdanên piştî hilbijartinên meha bihurî, dişibine neynika sernişîv a yên sala 2000'an. Sala 2010'an, Gbagbo, her tiştî dike ji bo hêdîkirina (û paşê rawestandina) karê Lijneya hilbijartinê, RTI'yê ji bo propagandaya xwe bi kar tîne û merasîma sûndxwarina xwe diweşîne. Sala 2010'ê, yê ku serkeftina xwe li ser RFI'yê (û li ser organên din ên biyanî) radigihîne Ouattara ye, û yê ku bang li alîgirên xwe dike da ku dakevine ser cadeyan ji bo bidestxistina desthilatê dîsa Ouattara ye. Dîsa xetera wê hindê heye ku dubendiya taze welatê Îvoriyê wêran bike. Lewra serhildana çekdarî ya îlona 2002'yê, ku Soro bi rê ve dibir, û derz û dabeşbûna welatî her ji ber vederkirina Bakur bû, ku vederkirina Ouattara bi fêlan bûbû sembola vederkirina Bakur bixwe.

Lê belê, şerê navxweyî (2002-2006) û aştiya çekdarî ya bi dû re hatî, helametê Houphouet-Boigny dîsa hişyar kir, ku desthilata wî bi xwe re aştî û refah anîbû, û hindek subvansiyon pir bi aqilane li terefdarên xwe belav kiribûn. (5) Xelkê Îvoriyê careke din wê "bihuşta winda" dixwazin ku kurteya xwe di wê fikra "Pîremêr" de peyda dike ku nûçeyên televîzyonê pê dest pê dikirin: *"dilşadiya rasteqîne, bi tenê hingê tê teqdîr kirin gava ku ji dest diçe."* Helbet pir zû ji bîr kirine ku xerabûna rewşa aborî û civakî ya welatî gelek ji sala 1993'yê pêştir dest pê kiribû, bi taybetî bi tedbîrên PAS û bi dermanê lîberalîzma ku IMF û Banka Cihanî danizilandibûnê. Lê belê rast e ku ji 1993'yê û pê ve, tu pêşketinek li welêt nehatiye tomar kirin. Herweha, Îvoriyên ku êdî ji şer û milmilaneyên bêdawî yên xelefiyê westiyane, doza aştî û aramiyê dikin. Her sê "kur"an ev yek baş fam kiriye. Digel vê hindê jî, dêvila ku yariya wan lihevhatin û rêkeftinê bîne, derz û cudatiyan firehtir dike.

Bedie yê ku ji desthilatê hatibû dûr xistin, û Ouattara yê ku nekarîbû bigihiyê, ji sala 2005'ê pê de hevpeymaniyekê girêdidin ku bi rengê zengila vejîna PDCI'yê olan dide. Navê Yekîtiya Alîgirên Houphouetî bo demokrasî û geşedanê [Rassemblement des houphouétistes pour la démocratie et le progrès (RHDP)] lê dikin. Ji vê hevpeymaniya taktîk wêdetir, fakteke din jî çalakkirina hevpeymaniya xelkên Bakur (Sénoufos, Malinkés an jî Dioulas) a bi Baouleyan bû, ku Baouleyî bingeh û palpiştên desthilata Houphouet-Boigny bûn. Bi tenê ev her du birên qewman piraniya nufûsa welatî ne.

Li hember wan, Gbagbo beramber desttêwerdanên biyaniyan, bi taybetî yên Fransayê xwe wek parêzvanê serweriya Îvoriyê nîşan dide. Ji sala 2001'ê û pê ve, gefan dixwe ku dikare şertên wan girêbestan dîsa guftûgo bike ku şirketên kevnehêza dagirker tê de teref in, ew şirketên ku Houphouet-Boigny hergav têkiliyên pir nêzîk pê re girêdabûn. Lê belê, ji bo berhevkirina piraniya Îvoriyan li dora xwe, divê ku piştgiriya Baouleyan jî bigre, Baouleyên ku li Perava Îvoriyê qewmekî xwedan hêz û hebûneke pir berfireh in. Lewma xwemalîkirina îmaja Houphouet-Boigny di şexsê xwe de jê re dibe mecbûriyetek, ne tenê ji ber ku kevneserokdewletê Îvoriyê yek ji pêşengên herî binavbang bû, belkî bi taybetî ji ber ku ew bigewdebûna tifaq û yekîtiya neteweyî bû. Ji ber vê hindê Gbagbo jî her tiştê pêwîst kir da ku doza mîrata "Pîremêrî" bike, her çend bi salan li dijî siyaseta wî û rêbaza wî ya otorîter têkoşiyabe jî. Hêj maye: sala 2010'ê, xwe wek tekane mîratgirê wî yê rewa pêşkêş dike.

Gbagbo bi vî rengî dest davêje karûbarên pêwîst ji bo veguhastina paytextê Îvoriyê bo Yamoussoukroyê, ku gundê Houphouet-Boigny ye û di saxiya xwe de Houphouet-Boigny

jî xwestibû vê derê bike paytext. Houphouet-Boigny jixwe li vî bajarokê li navenda welatî bazîlîkeke [dêreke] fîr´ewnî dabû ava kirin. Ev hemû înşaat li mîmar Pierre Fakhoury têne spartin ku di heman demê de hatiye wezîfedarkirin ku qesra nû ya serokdewletiyê ava bike, cadeyên bajarên mezin tehmîr û serûber bike, projeya abîdeya Houphouet-Boigny li Abidjanê çêke û herweha projeya "Pont Laurent-Gbagbo" [Pira Laurent-Gbagbo] bibe serî, ku bi vî rengî pira bi navê wî jî dê li pirên li ser navê Houphouet-Boigny û Charles de Gaulle zêde bibûya. Gbagbo herweha hewl dide jinebiya serokdewletê merhûm Therese Boignyê jî bixe nav refên xwe û bi vê armancê wîlaya wê ya ku di qumarê de li gazînoyekê ji dest dabû dîsa jê re dikire.

Sala 2010'ê, sê hêmanên "sê-pêpika siyaseta îvorî" (Bedie, Ouattara û Gbagbo) dikevine nav amadekariyên bo pêşbirka serokatiyê wekî ku li ser mîrata bavê neteweyê bikevine milmilaneyeke (dawiyê?). Lê belê, ji bilî gotin û sembolan, cihê pirsyaran e ka di rastiyê de "Pîremêr"î çi ji wan re hişt.

Bedie ji parêzvan û mezinên xwe bi tenê qewmiyeta wî li ba xwe ragirtiye. Bedieyê bê karîzma, bê guman yek ji wan serokên Perava Îvoriyê ye yên ku bi yekdengî herî zêde rik û nefreta xelkî lê bû. Dawiya desthilata wî, êdî xelkî navê n'zueba (serxweş) lê kiribû. Lê belê, piştî deh salên qeyrana siyasî ya ji hilbijartina karesatî ya cotmeha 2000'ê derketî, li ber çav û hizrên mîlîtanên PDCI'yê, Bedie ew kes bû ku ji hemûyan zêdetir sal û wextê xwe bi "Pîremêr"î re derbas kiribû, û lewma ji wî aliyî ve pirêza wî ji hemûyên din paqijtir bû. Heçî Ouattara ye, nasnav û payeyê biyanî ku reqîbên wî bi merema lawazkirina hêza wî pê ve kirin, erkê "panefrîkayî" bi bîr tîne ku Houphouet-Boigny disparte Perava Îvoriyê, lê, berevajî reqîbê xwe Kwamê N'krumahê ganayî, bêyî ku bikare hema wek nimûne jî be wêdeyî sînorên dewleteke pêk bîne.

Mercên Gbagbo û pozîsyona wî hê jî aloztir xuya dikin. "Pîremêr"î di demên xwe yên dawî de jê re gotibû *"Hey lo, tu çiqas dişibî min!"* (6) Ev gotin di rastiyê de bi temamî ne şaş e. Gbagbo ew kes e ku karî ji hemûyên din baştir jeopolîtîkaya qewmî ya welatê Îvoriyê bi rê ve bibe, lewra wî jî dabû dû rêbaza rejîma yek-partiyî ku bi salan wî bi xwe dijatî lê dikir. Wek Houphouet-Boigny, siyasetmedarê herî behredar ê dema xwe ew e: ji sosyalîstiyê wêdetir pragmatîst e. Herçend alaya neteweyî bilind bike, baş pê dizane ku divê herweha carinan wek "pêşengê edetî" yê qewmê xwe jî tev bigere, û her wekî bavê serxwebûnê, ew jî gava pêwîst bû qet dudiliyê di vê hindê de nake. Bi vî rengî, herçend pirjinî li Perava Îvoriyê qedexe be, li gor resm û edetan bi Nady Bambaya bakurî re zewicî, ku bêguman ev zewac ji endîşe û hizrên wergirtina dengên bakuriyan vala nebû. Ev jina wî ya duyem, di 2010'an de bi erkê pêwendîdanîna digel xelkên bakurî rabû. Herweha, Gbagbo wek şêwirmend Issa Malick Couliba yê endamê binemala xwedantesîr a Gon Coulibaly xiste nav refên xwe, ku Gon Coulibaly avakerê Korghogoya yekemîn bajarê bakurî ye û di zemanê xwe de hevpeymanekî nêzîk ê Houphouet-Boigny bû.

Di asta gotarê de, berawirdkirin heta vira ye. Bavê neteweyê –ku, piştî serdema dagirker, karê bi darê zorê hilweşand– herweha danerê biwêja "Fransafrîkayê" ye. Ji bo wî, ev biwêj îfadeya menayeke erênî ye, lewra derbirîna hevpeymaniyeke bixêr a Fransayê ya digel Perava Îvoriyê ya azad e. Ji bo Gbagbo, Fransafrîka nîşaneya hîmayeta biyaniyan e: sozê dide ku dê dawî lê bîne. Herçend Houphouet-Boigny di tevahiya jiyana xwe ya siyasî de hewla birêkxistina têkiliyên baş digel hevpîşeyên xwe yên fransî (ji Charles de Gaulle heta Jacques Chirac) dabe jî, xelefê wî, neyarê "Fransafrîkeya bavo", xwe wek pêşengê "serxwebûna duyem" pêşkêş dike. (7)

Lê belê, wêdeyî endîşeyên duristkirina îmajeke siyasî, ev qutbûna navbihurî tê heye veguherîneke sade û sethî be. Nexwe divê çawa fam bikin ku Gbagbo sala 2003'yê rêveberiya saziya benderan da destê Vincent Bollore yê ku di heman demê de wek Fermandarê Nizama Neteweyî ya Perava Îvoriyê hatibû destnîşankirin? Divê ji bo pêwendiyên Gbagbo yên digel Robert Bourgi yê şagirtê Jacques Foccart çi bêjin –ku di birêvebirina Fransafrîkayê li qesra Elyseeyê de xwedanê rola bingehîn – û şêwirmendê resmî yê Nicolas Sarkozy bû? Herweha divê mirov çawa tê bigihîje ku Charles Ble Goude yê mirovê herî dilsoz ê Gbagbo, ku wek wezîrê ciwanan hate dest nîşan kirin piştî tûra duyem a hilbijartinên serokatiyê yên 2010'ê, gelek bi hêsanî rabû bi riya şirketa xwe ya pêwendiyên siyasî şahiyeke mûzîkal bi rêk xist ku grûba Orangeyê [grûbeke şirketan a frensî] sponsorî lê dikir. Axirî, ma ne Gbagbo di 2002'yê de bang li Fransayê kir ku di çarçoveya sepandina şertên rêkeftinên bergiriyê yên 1961'ê de şerê komên serhildêran bike? Heye ku Perava Îvoriya Gbagboyî li dû Fransafriqayekê be ku ne mîna berê siyasî û hukûmetî be, lê xwe bispêre şirketên taybetî û di wê çarçoveyê de bi rê ve biçe.

Gelo heye ku Gbagbo bibe qurbanê "sendroma muxalifê ebedî"? Gbagbo yê ku bo heyameke dirêj bi rêbazên nedemokratîk ji desthilatê hate dûrxistin, niha hewl dide cihê xwe lê baş qahîm bike. Alîgirên wî bawer dikin ku şerê navxweyî (2002-2006) nehişt projeyên xwe yên mezin bibe serî. Li rexê xwe ve, serok Sarkozy jî mesafeyekê dixe navbera xwe û Perava Îvoriyê, Çunkî têgihiştiye ku her çi helwêsta ji Elyseyê bê, tê heye li dijî Fransî û şirketên wan ên li Perava Îvoriyê vegere. Gbagbo ji derdora xwe re gotiye, *"Ji cerga çûna Chirac, ez re´hettir radizêm"*. Serokê dewleta fransî her weha di vê dawiya 2010'ê de jî bi hişyarî tev geriya û bes piştî Barack Obamayê serokê DYA'yê, rabû helwêsta xwe aşkera kir. Lê belê, vê tedbîrê jî têrê nekir ku "welatparêzên " Gbagboyî Fransayê wek hedef dest nîşan bikin.

Heçî xelkê Îvoriyê ye, tevî rewşa karesat a welatî, tenya nirxê ku "Pîremêr"î ji wan re hişt, anku dilsoziya li yekîtiya neteweyî û yekîtiya erdê Perava Îvoriyê, hê jî di nav wan de şert û nirxê bingehîn e. Aya her sê kurên lanetî yên Houphouet-Boigny hê jî pabendên vî nirxî ne?

1 http://www.ladepechedabidjan.net/

2 Ev planên lêanîna strukturel ên ku di bin per û baskê saziyên fînansê yên navneteweyî de hatin pêkanîn, wê taybetkirinê, pevguhertina serbest û kêmkirina qada xizmetên dewletê organîze bikin

3 Pênasa sînordarker a nasnameya neteweyî ye ku li ser welatiyên dixwazin bikevin pêşbaziya hilbijartinan – ji bo namzetan – yan jî dengdanê – ferz dike kokên xwe yên îvorî îsbat bikin

4 Bédié, sala 1994ê mafê dengdanê yê biyaniyan da betal kirin, tevî ku Gbagbo ji sala 1990ê ve gazin dikirin ku "kerîyê hilbijêran)" ji yê "kevin" pêk hatiye (yê "kevin" ji xwe re "kerîyekî hilbijartinê" çêkiriye ku timî dengê xwe didin wî)

5 Di bin paraztina Burkina Faso de, peymanên aştiyê rê li ber derbasbûneke siyasî vekirin. Soro, dibe serokwezîrê Gbagbo

6 Rojnameya partiya Gbagbo Notre Voie, di gotarekê de xwe li vê datîne, "Le talent d'Houphouët, le génie de Gbagbo (qabîliyeta Houphouëtê, dehaya Gbagbo)", Abidjan, 4ê çiriya paşî ya 2009an

7 Bixwîne, Anne-Cécile Robert, "Rêve d'une seconde indépendance (xeyala serxwebûneke duyemîn)", Manière de voir, hejmar 108, "Indispensable Afrique (Afrîkaya dest jê nabe)", kanûn 2009 - çile 2010

*Rojnameger. Nivîskar bi vê helkeftê spasiya Vanadis Feuilleya arşîvger dike.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# Heşt salên krîza siyasî

**19-09-2002.** Eskerên Îvorîyî yên ku li Burkîna Fasoyê li mişextîyê bûn, bakurê welatî dixine bin kontrola xwe, lê nikarin Abîdjana paytextê welatî bi dest bixin. Bi vî rengî welat dibe du parçe.

**22-09-2002.** Dewleta Fransayê ji bo derxistina hevwelatiyên fransî ji Îvorîyê, dest bi operasyona "Licorneyê " dike. Paşê, wezîfeya berevanîya di navbera terefên şerî de jî digire ser milên xwe.

**23-09-2002.** Civata Aborî ya Dewletên Efrîkaya Rojava (CADER) hêzeke aştîyê bi rêk dixe.

**26-01-2003.** Rêkeftinên Marcoussisê (Parîs) biryara dabeşkirin û parvekirina desthilatê digirin.

**27-02-2004.** Hêzên Operasyona Neteweyên Yekbûyî li Peravên Îvorîyê (ONYPÎ) bi erkê teqezkirina aştî û aramîyê radibin.

**11-10-2004.** Xwepêşander êrişî ser hêzên ONYPê dikin. Di encama rûdanan de gelek kes birîndar dibin.

**06-11-2004.** Hêzên çekdar ên neteweyî yên Peravên Îvorîyê [Les Forces armées nationales de Côte d'Ivoire (Fanci)] binkeya fransî ya Bouakeyê didine ber bombeyan: neh kes têne kuştin û sî û heft kes birîndar dibin. Li dijî vê yekê, Fransa fîloya hewayî ya Îvorîyê dirûxîne. Roja paştir, hêzên fransî, li ber otêla Îvorîyê li Abidjianê guleyan li xwepêşanderan direşînin û di encamê de zêdetir ji dwanzdeh kesan têne kuştin.

**04-03-2007.** Rêkeftina aştîyê ya Ougadougouyê (Burkîna Faso). Serokê serhildêran Guillaume Soro bo serokatîya hukûmeteke muweqet tê dest nîşan kirin.

**29-11-2009.** Tarîxa hilbijartinên serokatîya dewletê tê dest nîşan kirin û paş xistin.

**31-10-2010.** Di tûra yekem a hilbijartina serokatîyê de Allassane Dramane Ouattara û Laurent Gbagbo her du namzedên pêşî ne. Henri Konan-Bedie ji bo hêsankirina hilbijartina Ouattara ji hilbijartinan vedikişe.

**02-12-2010.** Lijneya Hilbijartinê ya Serbixwe, Outtara wek serkeftîyê tûra duyê ya hilbijartinên serokatîyê ya 28'ê mijdarê (çirîya paşîn) radigihîne.

**03-12-2010.** Lijneya Destûrê, piştî ku dengên li gelek wîlayetên bakurî yên welatî betal kirin, (Bouake, Khorogo, Ferkessedougou, Katiola, Boundiali, Dabakala û Seguela), ragihand ku serkeftîyê hilbijartinan Gbagbo ye.

### MUCÎZEYA HILBIJARTINÊN SEROKKOMARÎ YÊN DI WELATEKÎ JI HEV ÇIRRANDÎ DE

# Qiraxê Kêlbefîl pêşeroja xwe dileyize

MICHAEL GALY *

***Bi du taloqkirinên li pey hev, weha tê payîn ku dora yekemîn a hilbijartina serokkomarî ya Qiraxê Kêlbefîl ê di roja 31'ê çiriya pêşîn de pêk were. Paşê pênc salên şerê hundirîn û neraziyên li ser lîsteyên dengdêriyê, ev diyarde nayê wateya çareseriya hemû kêşeyan, lê belê rê li ber xurtkirina desthilat û demokrasiyê vedike.***

*"Ileh di roja 31'ê çiriya pêşîn de."* Bi van gotinan, serokkomarê Qiraxê Kêlbefîl Laurent Gbabgo'yî, di roja 6'ê tebaxa 2010'ê de, li Weqfa Felix-Houphouët Boigny ya ji bo lêgerîna aştiyê, xaniyekî heybet ê Yamoussoukro'yê (paytexta îdarî û siyasî ya Qiraxê Kêlbefîl), daxuyand ku dê, taliyê, hilbijartinên serokkomarî di welatê wî de li dar bikevin. Ji sala 2005'ê û vir de, tiştên weke nerazîbûna li ser lîsteya dengdêran, ji ber zagona kêlbefîlbûnê (1), û birînên ji şerrê hundirîn ê salên navbera 2002 û 2007'ê mayî, bûne sedema taloqkirinên dubare yên dengdanê. Hilbijartina dawî, ya ku di sala 2000'î de li dar ketibû, raperînên xwînrêj bi xwe re anîbûn, beriya ku tevlîbûna xurt a taxên xizanan serkeftina Gbagbo'yî bi ser desthilata lerzokî ya leşkeran ferz bike (2). Dibe ku îlana hilbijartinan bê wext bibe, bes di rastiyê de, ew encama pêvajoyeke dirêj a aştîkirina hundirîn û derveyî ye.

Tevî ku bêhedaniya herêmî – darbeyên leşkerî weke li Guinea'yê an li Guinea-Bissau'yê, çûnûhatinên koçberan yên aramîşikest, hwd. - di qeyrana kêlbefîlî de rola xwe dileyizin, ji bo têgihiştina vê qeyranê, dîroka vê quweta aborî ya Rojavayê Afriqayê jî watedar e. Felix Houphouët-Boigny bavê serxwebûna kêlbefîlî bû û ji 40 salî zêdetir li ser desthilata Qiraxê Kêlbefîl ma. Lê bi du mirina wî ya di sala 1993'ê de, navberiya tofandar a " mîrasê " wî, Henri Konan Bedie, di sala 1999'ê de, ji bo cara yekemîn bû sedema ku leşkeran îxtîdar bi dest xist. Di meha îlona 2002'ê de, îsyanek di bakurê welêt de dest pê kir, ku ev jî herêma esil a Alassane Dramane Outtouara'yî ye, berbijêrekî ku ji ber zagona kêlbefîlbûnê, demeke berê ji reqabeta hilbijartinan hatibû dûrxistin. Gelo armanca îsyanê ev bû ku tiştên di sindoqan de redkirî, bi çekan werin bidestxistin? Tevger bû sedema dabeşkirineke rastî ya welêt. Digel ku berçav bû ku hêzên îsyanker (kevneleşkerên kêlbefîlî, serbazên bi pere û ciwanên maceraxwaz) ji Burkîna Faso'ya cîran dihatin, fermandêr û sermayedarên şerrî heta nuha nenas in, tevî ku hin dezgehên biyanî, û bi taybetî fransî, bi serûberî pê tên mehkûmkirin.

### Hevsengiyeke dijwar

Weha xuya ye ku têkiliyên bi Fransayê re, piştî ku rayedaran gavên hevpar avêtin, aram dibin, û ev jî ji bo rakirina rêgiriyên rewşa siyasî insûreke girîng e. Yek ji sedemên dijbertiya di navbera Parîs û Yamoussoukro'yê de jî, hevneboriya serokkomarên Chîrac û Gbagbo'yî bû (3). Ev hevneborî, di meha îlona 2004'ê de gihîşt radeya herî bilind: didu balafirên kêlbefîlî hîma leşkerî ya fransî ya Bouake'yê bombebaran kir (deh mirî, sî birindar), û bi pey re jî, erîşa bertek a helîkopter û tanqên hêza Licorne'yê, quweteke navberketinê ji kevnewelatê mader ve şandî, bûbû sedema şêst û şê mirî û ji hezarî zêdetir birîndaran. Lê belê, paşê ku serokkomarê Gbagbo'yî nûdagirkeriya aborî ya fransî bi xurtî şermezar kir û xemsarî xist têkiliyên her du welatan, danûstendinên mal û xizmetan dîsa jî dest pê dikin. Pirraniya heşt hezar pênaberên fransî yên sala 2002'ê vegeriyan welêt. Hêjayî gotinê ye ku kadroyên şîrketên mezin weke Bollore an Bouygues tu car derneketibûn. Li gorî hin agahiyan, protokoleke giştî ya efûya hevpar di navbera her du welatan de nîqaş dibe. Wekî din, şîrketa Sagem'ê ya Parîsê, kompûternasiya hilbijartinan bi rê ve dibe û ajansa reklamê Euro RSCG berpirsê xuyaniya serokkomarî ye. Ji îlana dengdanê ve, Gbagbo ji Sofres'ê anketên fikirê dixwaze (ku ev anket hane jî serkeftina wî vedibêjin).

Lê belê, "peymana dagirkeriyê" bi rastî betal bû. 43emîn firqeya bejayî ya deryayê (bi fransî, BIMA) û hêza seferber a fransî, ku ji sala 1970'ê ve li Qiraxê Kêlbefîlê bûn, dê helbet neçar bimînin ku welêt biterkînin, digel leşkerên Operasyona Neteweyên Yekbûyî ya li Qiraxê Kêlbefîl (bi fransî, Onuci) ku xelkê nerehet dikin. Beşdarên din dê ve valahiyê tijî bikin: bazirganên surî-lubnanî, ji mêj ve bi cîh bûyî, û sermayedarên çînî. Di platformên neftê yên dûrîqiraxî de, ku bi saya wan, Qiraxê Kêlbefîl li ser piyan ma û tevî sizayên rêxistinên navneteweyî, xwe ji nû ve çekdar kir, hemî hêzên aborî yên mezin cîh digrin, ji bilî Fransayê...

Ji esasên jeopolîtîk zêdetir, weha xuya ye ku civaka kêlbefîlî xwe bi xwe hevsengiyeke tenik dît. Peymana aştiyê ya Ouagadougou'yê (Burkîna Faso) ya 2007'ê, rê da ku hikumeteke yekîtiya neteweyî bi awayekî mayînde bê ser kar, û endamên pirraniya serokkomarî, dijberiya civakî û îsyankeriya hevkara partiya desthilat, Eniya Gelê Kêlbefîlê (PFI), di vê hikumetê de cîh digrin. Kevneserokê serhildêran, Guillaume Soro'yî, li hemberî vekişandina berbijêriya xwe ya ji bo hilbijartina serokkomarî ya bê, kursiya serokwezîrî bi dest xist (4). Hin kes heyîniya peymaneke vêşartî derdibirin, ku li gorî vê yekê dê Gbagbo, piştî dawiya nûnêriya xwe, desthilatê bide "peyrewê xwe yê siyasî". Ji bo dijberên wî, ev tifaq dabeşkirina dewlemendiyên welêt (hatinên kakao û neftê...) dinixumîne. Di rastiyê de jî, skandalên bertîliyê li hev zêde bûn. Di deverên deviyan de, "komzon" - komutanên zonê - yên îsyanê, ku bi awayekî xirab naskirî ne, weke zalimên piçûk ên derveyî berbendiyê tev digerin û bê şerm ji xelkê didizin.

Weke nîşana demê, gel li hemberî van kiryaran dest bi protestoyê dike, ku ev kiryar ne tenê ji aliyê îsyanê ve, bes ji aliyê birêvebiriyê ve jî tên kirin. Weha ye ku ji bo belgeyên ku di resmiyetê de bêlaş in, hin bervedarên dewletê û heta nûnerên dadê jî, bi awayekî daîmî ji 10 000 heta 50 000 franqên CFA (ji 15 heta 75 euroyan) bi zorê ji peyayan distînin ku belgeyên jidayikbûnê dixwazin da ku zarokên xwe bişînin dibistanê. Îroj, hin gundî - ciwanên xwenda, rewşenbîrên malnişîn, bêkarên ku vegeriyane gund - li dijî vê bertîliya nîşana embazeke civakî ya newekhev û dewlemendbûyîna nezagonî ya rayedaran, derdikevin.

Wekî din, aşbûyîna têkiliyên herêmî ji bo muzakereyên li ser avakirina statuyeke rojava-afrîkayî ya koçber û biyaniyan bandoreke erênî dileyize, ku bi vî awayî neraziyên pirrhejmar ên li derdora xwestinên qeydkirina li ser lîsteyên dengdêriyê bi dawî jî dibin. Her weha, dibe ku rola siyasî ya dabeşên nijadî li gorî demên berê kêmtir bi bandor bibe. Digel ku her ji sisê berbijêrên sereke weke nûnerê komeke nijadî-herêmî dikare bê dîtin - Krû ji bo serokkomarê Gbagbo, Akan ji bo Bedie'yî û Dyula (bakurî) ji bo Ouattara'yî - tehlîleke bi vî rengî lîstika siyasî nade famkirin.

Makîneya siyasî û leşkerî ya fransî vê pêşketinê piştguh dixe û ji ber xwedêgiravî afrîkanasên weke Bernard Lugan'î (5), esîrê manendên derbasbûyî dimîne. Li gorî Lugan'î, bi tenê % 7 nifûsê piştgirî dide serokkomarê Gbagbo, yanî endamên nijadê wî û çend komikên "welatparêz". Ev nihêrîn gumanbar e û dikare matmayîna jeneralê Henri Poncet û hêza Licorne'yê li hemberî xwepêşandanên gelî yên mijdara 2004'ê şîrove bike.

Giraniya nifûsî ya Abîcan'ê, bajarekî pênc mîlyon niştecîhan, ji bo hilbijartinan jî li vê yekê zêde dibe, ku qismetperistiyên "nijadî" tevlihev dike û destek dide jî holê derketina dengdaneke sinifî. Li gor civaknasê Dêdy Sêrî, yek ji sisê zewacên di paytexta aborî de têkel in (di navbera gelên kêlbefîlî de an jî di navbera hemwelatî û biyaniyan de) (6).

Di bangdana xwe ya dengdêran de, serokkomarê Gbagbo bi hebûna *homo politicusekî* kêlbefîlî bawer e, ku ew ê bikaribe bi berfirehî, hem li bakur û hem li başûrê welêt, xelkê kom bike. Ew baweriya xwe bi reftara rewaperist a gelî, jirêderxistina vekirî ya makîneya dewletê, binemriya medyayan, dabeşbûna dijberên xwe û heta alîkariya pere û banqnotan jî tîne.

Berevajî vê yekê, muxalefet, ji xwe, baweriya xwe bi diyardeya nijadîbûyîneke dengdanan ve girêdide, ku ew ê jî bihêle ku rayên bakur û rojhilatê welêt, yanî % 60'ê dengdêran, jê re werin veqetandin. Hevpariyeke di navbera derdorên bazirganiyê û beşeke rastgirên fransî de, ya ku beriya hevkariya stratejîk dike, ya ku ji bo Parîsê pirr berhemdar bû lê ji hêla Gbabgo'yî ve hat serobinkirin, yek ji xeyalên dijberiyê ye jî. Hevpeymana sosret a bi navê Kombûyîna Houphouëtîparêzên ji bo Aştî û Demokrasiyê (RHDP bi fransî) bi vî rengî jî tarîfe dibe.

Ev hevpeyman ha li Parîsê, di sala 2005'ê de, di merasîmeke giranbuha û qirdik de, ji rayagiştî re hat pêşkêşkirin. Ew alîgirên Ouattara û Bedie'yî di nav xwe de vedihewîne, ji xwe hêjayî bibîrxistinê ye ku Bedie'yî têgiha kêlbefîlbûnê derxistibû (û bi kar anîbû) da ku rê li ber namzetiya Ouattara'yî ya hilbijartinan bigre. Ku Gbagbo di dora yekem de nayê hilbijartin, vedana dengan di navbera her du berbijêran de dê zehmet bibe. Helwêsta axayê burkînayî, Blaise Compaorê, ne ewle jî dimîne: dibe ku bangî "dengdaneke lihevhatinê" ya ji bo Gbagbo'yî bike, an jî dibe ku piştgiriya Ouattara bike, ji ber ku hejmareke mezin a Sahelî û Bakurî (koçberên burkînayî jî di nav de) piştevaniya wî dikin.

Hemû pêşdîtin hê jî dikarin rast bibin, yên ji nû ve destpêkirina pevçûnan an serhildanên bajarî yên mezin jî di nav de. Ji xwe pênc sed leşker li hêza navneteweyî ya Onuci'yê zêde bûn, û serokkomarê Gbagbo fermana *"lêxistina xurt"* da li hemberî van kesên ku dê hêminiyê bişkînin. Li gorî pirraniya çavdêran, digel ku artêşa îsyanker bi resmî çekên xwe danîbe, ew li derveyî berbendiyê dimîne. Sedemeke wê jî ev e ku ji nû ve têketina civakî ya kevneşervanan asê ma.

### Piştgirên navneteweyî yên giran

Viyana bisînorkirina sextekariya hemwelatî an qeyda li ser lîsteyên dengdêran sedema herî mezin a derengmayîna rayedaran a ji bo çêkirina tomara dengdêran e. Wekî din, di herêmên bakur de, yên ku îsyankeran bi dest xistibûn, wan bi awayekî pergalî belgeyên tomargehên nifûsê xira kirin. Ji ber şêwirmendên zagonî, piştevaniyên lojîstîk ên navneteweyî û yên din, buhaya hilbijartina kêlbefîlî di dunyayê de gihîşt asta herî bilind, li derdora 40 mîlyar franqên CFA (60 mîlyon euroyan) ! Hêjayî gotinê ye ku desteya serbixwe ya hilbijartinê (CEI), ku pirraniya endamên wê ji nav refên dijberiyê tên (li Afrîkayê diyardeyeke weha bê şibhê ye), ji nûkirina faylê berê (yê ji sala 2000'ê), ji nû ve çêkirina tevahiya lîsteyê baştir dît (7). Ev jî gengaziya neraziyan piştî dengdanê diyar dike.

Ji xwe, bi nêzîkbûna 30'ê çiriya pêşînê re, gotegotên herî hevdijber tên gerandin: tê gotin ku hemû piştevanên desthilatê nayên tomarkirin û yên din ji bo çûna ser sindoqan pirr amade nînin, weke ji bo hilbijartinên şaredariyan yên 2001'ê. Tê gotin ku alîgirên Ouattara'yî jî, dê kesên niniştecîh ên pirrhejmar bibin ser sindoqan. Leşkerên biyanî jî ji nijadên cuda pêk tên, bes tu kes bi alînegiriya wan bawer nake...

Ji mirina Houphouët-Boigny'î ve, demokratîkbûna gav bi gav, vekirina ji pirraliya medyayî re û paşxana hilbijartinan azadiya axaftinê zêde dikin, lê belê ew jî dibin sedema têgihîştinên werimandî û paranoyak Mina kremlînnasên zemanên berê, ku li desthilata sovyetî dikoliyan, rojnamevan an rewşenbîrên payebilind îroj dibin "sernavnas" û li ser serrûpelên çapemeniyeke harbûyî radiwestin. Bi taybetî, hin kes bi rêya weşanên Radio France Internationale (RFI, ango Radyoya Fransayê ya Navneteweyî, ku nuha "Radio France Intoxication", ango "Radyoya Fransayê ya Derewîn", jê re tê gotin) dixwazin sûîkast û hîleyên Fransayê aşkere bikin... Di rastiyê de jî, dijminên desthilata Gbagbo'yî li Parîsê pirr in, ji ber ku tu kesî ji bo nekir ku wî xwestibû pazarên ji bo şîrketên fransî veqetandî, ji dijberiya navneteweyî re veke...

Rast e ku kesek jî li hêviya "teqîna aştiyê" piştî hilbijartinên bê neraziyan, bi rengê Afrîka başûr ya piştapartheid'ê, nasekine, tengezariya gelan (*"Em westiyayî ne"* daîmî ji devê kêlbefîliyan derdikeve) weha ye ku mirov dikare, di vî welatê rojavayê Afrîkayê de, hêza sereke ya aboriya binherêmî, hêvî bike ku dengdan dê demokrasiyê ji nû ve rewa bike...

* Siyasetnas û birêvebirê weşana "Guerres nomades et sociétés ouest-africaines" (Şerrên koçber û civakên rojavayê Afriqayê), L'Harmattan, Parîs, 2007.

1 Li gorî vê tarîfeya sînorker a nasnameya neteweyî, divê kesên ku dixwazin beşdarî reqabeta hilbijartinê bibin, weke berbijêr an jî weke dengdêr, eslên xwe yên kêlbefîlî îspat bikin

2 Bnr. "La Côte d'Ivoire tente la réconciliation nationale" (Qiraxê Kêlbefîlî lihevkirina neteweyî dicerribîne), *Le Monde diplomatique*, berfanbara 2007ê

3 Li ser vegotina buyerên qeyranê, bnr. Guy Labertit, *Adieu, Abidjan-sur-Seine! Les coulisses du conflit ivoirien* (Bi xatirê te, Abidjan-sur-Seine! Paşperdeyên şerrê kêlbefîlî), Autre temps, Parîs, 2008

4 Bnr.Vladimir Cagnorali, "Une génération à l'assaut de la Côte d'Ivoire" (Nifşeke nû tê Qiraxê Kêlbefîl bi dest bixe), *Le Monde diplomatique*, mijdara 2009ê

5 Bernard Lugan, *Histoire de l'Afrique. Des origines à nos jours. (Dîroka Afrîkayê, ji kokên xwe heta îroj.)*, Ellipses, Parîs, 2009

6 Dêdy Sêri, *Mutations sociales en Côte d'Ivoire (Guherînên civakî yên li Qiraxê Kêlbefîl)*, L'Harmattan, kol. "Bibliothèque du cinquantenaire des indépendances" (Pirtûkxaneya pêncî saliya serxwebûnan), Parîs, dê bê weşandin

7 Bnr. Augusta Conchiglia, "Le rôle central de l'immigration" ("Rola sereke ya koçberiyê"), *Le Monde diplomatique*, berfanbara 2007'ê

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn
Redaksiyon: Îbrahîm Seydo Aydogan

# KULTUR-POLÎTÎK

## KEJO BAJAR

## Berî Berfê: Rênas JİYAN

Ji ber ku tirkî têra min nake ez bi kurdî dinivîsîm." Ev peyv ji nameyeke Rênas Jiyan hatiye wergirtin. Çawa ku di nav rûsipiyên kurdan de herî pir helbestên Cegerxwîn tên jiberkirin; îro di nav nifşê nû de jî helbestên ku herî pir tên jiberkirin helbestên Rênas Jiyan in. Rênas Jiyan piştî derçûna "Janya (helbest), Mexzena Xwînê (helbest) û "Di Tuwaletê De" (şano) bi pirtûka "Ji Şevê Re Çend Têgehên Dera Hanê (ceribandin- rexne)" derket pêşberî xwendavanên xwe.




Tegehên herî bêxwedî, têgehên di nav şevê de mane; tegehên ku heta îro hûn dev ji kurdan berdin zimanê tûtiyên kurdan jî hatine asîmele kirin, dê bibin mijara vê pirtûkê û dê Rênas Jiyan hewl bide ku zimanên wan tûtiyan û wan kurdan hilîne, ji bo ku wan bi zimanê wan bide axavtin. Ji ber ku ew dizane ku di zemanê berê de ji bo tûtî (papaxan) xweş bipeyivin şekir dixistin bin zimanê wan. Mînak: "*Cil û bergên wan hebûn, cil û bergên wan…ên bi navê "Kandîs'î' 'ku ers li ser wan cil û bergan direelîn"… guharên wan hebûn… kilên çavên wan hebûn… hebûn… hebûn…Ew Med bûn û ew hebûn… xwîna wan xweşik bû; ji ber ku wê xwînê biqasî tiliyekê qeymax girtibû."* Dê Rênas Jiyan mijarên aîdê kurdan bikole û arketîpên netewê biqeşêre. Bi vî awayî dê Rênas Jiyan vê ezbera ku li ser me hatiye ferz kirin, birûxîne: Kurd tu cara nikarin dewlatan ava bikin. Erê Kurd dikarin dewletan ava bikin… Dikarin împeretoriyan jî ava bikin. Aha va ye MED. Fermo de îcar xwe biçûk bixînin.

Ne bi vê mijarê tenê bi mijarên li ser hunerê, li ser zimên û li ser civakê jî dê nivîskar ezberan hilweşîne. Navên çend sernivîsan tenê jî dê bike ku em vê fahm bikin. "*Dema Kuştina Ahmed Arifî Hatiye an na?, Ehmedê Xanî ne Fîlozof e!, Xwebûn, Xwedêbûn e, Li vî Bajarî, Zarokên vî Zemanî û Hegel"* Mijarên di vê pirtûkê de bi qasî terîya teyrê tawis fireh in. Rênas Jiyan perîkekê di hibrê de dike û pê behsa civaknasîyê dike, radihêje perîkeke din û pê qala psîkolojîya serdestan û bindestan dike, dê rahêje perîkeke din û pê çêlî "î" ya kurdî bike ku bêyî tîpa "î"yê bê çiqas pir kurdî jê çêdibe. "Î"qertafeke sereke ya zimanê kurdî ye. "*Î" pir li kurdî tê. Ji ber ku di kurd-î de "î" heye "zimanê kurd-î " heye; û kurdî ji ber êşa canê xwe "digirî" û dibêje, î î î î î î……..!"* Mirov dikare bibêje ku nîvîskar her parsûyekî şikestî yê vî neteweyî dîtiye û xwestiye bicebirîne.

Taybetmendîyeke hunerê kurdî heye. Helbestvan tenê helbestkarîyê, romannivîs tenê romanivîsîyê, çîroknivîs jî tenê çîroknivîsîyê dikin. Wexta hunermendek ji qonaxekê xwe diavêje qonaxeke din bi îhtîmaleke mezin têk diçe. Hunermendên kurd her ku xwe li asofirekirina çeşnekî din yê hunerê radikişînin xeleka dora pênûsa wan teng dibe û wan difetisîne. Sedemek pir aşkere yê vê yekê heye. Hunerê urd naxwîne; dinivîsîne lê ew bixwe naxwîne. Taybetmendiyek "Ji Şevê Re" jî ew e ku mişt xwendin e. Her ku di pirtûkê de behsa mijarekê bê kirin dê teqez navên çend fikirdar, fîlozof û helbestkar û nivîskaran di wê rexne-ceribandinê de derbas bibe. Ev pirtûk bi têra xwe xwendekar e. Ji bo mirov vê bibîne tenê mirov li navên di bin îndeksa tîpa "C"yê de hatine rêzkirin binêre, bes e: Camus, Cegerxwîn, Celadet, Cêlîne, Cezanne, Chare, Cicero, Cioren, Cizirî, Cogito, Cummings, Comte. Ev nav tenê di bin tîpa "C" yê de ne. Di îndeksa vê pirtûkê de 29 tîp hene. Hingê mirov hesabî hêsan bike ev dike xwendina 295 pirtûkan. Pirtûkekek bi ber a 295 rûpelî ji xwendina 295 pirtûkan çêdibe.

Rênas Jiyan ev pirtûk nenivîsîye; ev pirtûk xwendîye…

**Navê pirtûkê**: Ji Şevê Re Çend Têgehên Dera Hanê
**Nivîskar**: Rênas Jiyan
**Lewnê wê**: Ese-rexne
**Weşanxane**: Belkî
**Rûpel**: 295
**Buha**: 15 TL
**ISBN:** 978-975-0156-95-3

## Girava Gencîneyê: Robert Louis STEVENSON

Rojekê zilamekî bi navê Billy Bones bi sindoqekê tê xana Amîral Benbow´ê. Li xanê bi cî dibe û sibê heta êvarê romê vedixwe, car caran jî çend qiruş pere dixe bêrîka Jim Hawkîns´ê ciwan ku çavdêriya zilamê bi lingekî bike. Piştî mirina Bones ji bo xwediyên xanê deynê xwe ji wî bigirin sindoqa wî vedikin û rastî nexşeya gencîneya Kaptan Flint´ê navdar tên. De heman de demê de hevalê Kaptan Flint, John Silver´ê yekling ( ku di şûna ew lingê tune de dengê qeysikê wî wê di nav romanê de tim weke nîşaneya xeteran bixuye) û zilamê kor jî li pey wê nexşeya gencîneyê ne. Lê di raûnda yekem de nexşe di navlepên Jim Hawkîns´ê xort de dimîne. Jim Hawkins nexşê radestî Bijîşk Livesey û Beg dike; diya xwe ya jinebî û xana şewitî ya Amîral Benbowa li dû xwe dihêle. Romana Stevenson hinek jî di nav serpêhatiyên deryayî yên korsanan de mezinbûna Jim Hawkîns´ê xort e jî ku piştî serpêhatiyan êdî ew xortekî destbixwîn e. Qetla İsreal Hands ketiye hustuyê wî.

Li rêgeha gencîneyê keştiya Hispaniola´yê bi rê dikeve. Beg, Kaptan Smollet, Jim Hawkins, Jonh Silver bi tevahî pazdeh kes li Hispaniola´yê siwar dibin û ber bi Girava Gencîneyê ve bi rê dikêvin. John Silver û hevalên wî wê xwe bi dizî weke murettebat nîşan bidin û di keştiyê de weke karkeran kar bikin. Lê gava keştî tê nêzîkî giravê rûpoşên rûyê û berdilka li ber xwe derdixe û êdî weke serokê serhildana korsanan derdikeve pêş. Kesên di keştiyê de dibin du beş. Ji wê kêlîkê û pê ve wê şerên herdu aliyan dest pê bike. Li aliyekî John Silver´ê yekling û hevalên wî yên korsan, li aliyê din jî Kaptan Smollet û hevalên xwe li ser avê û li ser bejahiya Girava Gencîneyê dikevin şerekî yeman. Birînên şûna şûran, bîranînên korsanan, serpêhatiyên jiyanê, şer, kahûr, demançe, rom, konyak, ala İngilterê , stargeh, tûtiyê bi navê Kaptan Flint, sawa ruhê kaptan Flint, qerqûdeyên korsanan, kuştin, sondên li ser deqa reş, birîndarî û Ben Gunnê nîvbiaqil…

*'Panzdeh zilamên li ser sindoqa zilamê mirî- Ha - bavê min – ha û şûşeyek rom ''* ev stran dê ji her derê romanê olan bide. Piştî ku John Silver û hevalên xwe digihînin ciyê ku gencîne lê veşartiye, wê rastî destiyê kulingekî, çahlek vikîvala û rastî zêrekî dugîneyî werin. Ji ber ku Ben Gunn´ê ku sê sal berê weke ceza li giravê weke ceza hatiye hiştin, gencîne derxistiye ; ew li şikefta xwe veşartiye û gencîne radestî Bijîşk Livesey û Kaptanê birîndar kiriye. Wêneyên hemû qralên Ewropayê li ser wan zêrên ku di gencîneyê de ne, xêzkirî ne. Dawiya dawî ji panzde zilamên di stranê de wê pênc kes tenê vegerin mala xwe û ên din jî, wê hinek ji wan bibin xwarina segmasiyan, hinek ji wan jî wê bibin xwediyên gorên wenda.

Kurd ne xwedî derya ne, lê bi vê wergera ku ji deqa orjînal hatiye kirin, çirûskên ku wê xwe bikin xwedî ferhengek deryayî didin. Êdî em jî dikarin tîbûna xwe ya zimanî bi ava deryayê û bi xwê bişkînin. Êdî em jî dikarin qeyikên xwe yên kaxizî û kurmancî di nav ava rûbarên şêrin de bi ber deryayê ve bi rê bikin.

**Navê pirtukê**: Girava Gencîneyê
**Nivîskar**: R. L. Stevenson
**Weşanxane**: Lîs
**Lewn**: Roman
**Rûpel**: 260
**Wergera Ji İngîlîzî**: Bilal Çelik
**Buha**: 15 TL
**ISBN:** 978-605-5683-40-5

## Romana Gava Heyatê

Divê di destpêkê de bê gotin ku di nav romana Gava Heyatê de em li milkê bi kurmancîyê bixwe ne. Di nav vê romana Lokman Ayebe de em dikarin "bi berxikê" xwe re, bi "baxçê xwe re" bi kûçikên xweyên li ber derî re têra xwe bi kurmancî bipeyivin û dilê xwe li kurmancîyê rehet bikin. Çawa ku wexta destê kurdekî/ ê bi tiştekî ´heram bibe, ji bo ´helaliyê dihere destê xwe di nav axê de dike û bi dû re destê xwe dişo û ´helal dike , romannivîsê me jî weha ruhê me, hêmasazîya me , bîra me bi axê , bi avê û bi kurmanciyê ´helal dike û me bi kurmancîyê katarsîse dike. Li romaneke 180 rûpelî bifikirin ku hûn hew rastî du hevokên ku referansa wan bi tirkî ye tên. "*Seqema serê sibehê, heta kejîyê însên ew dicemidand.(r. 35). Yekser dev li zoqayê kirin…( r.115)".* Ev bi xwe di warê zimên de serkeftinek e. Qet nebe du caran tenê em rastî zimanekî dêmarî tên û ji zimanê yadê bi şîr ve dibin. Bi şêwazekî din mirov dikare li ser zimanê vê romanê weha bibêje: Lokman Ayebe daqûlî ser ferhengeke pelên wê şewitandî dibe û peyvên li ser karbona pelan ku hema hema dixuyin, dixwîne û ji nû ve giyanê wan zindî dike.

Mijara romanê bi piranî li Dêrikê derbas dibe. Û Dêrik weke mîkro-Kurdistanê hatiye hilbijartin. Bûyerên ku di vê romanê de derbas dibin, kêm zêde li her derê welêt derbas bûne. Lehengê me Taserê Mencolî di beşa yekem de sêwiyek e ku li ber siya zinarekî hatiye dunyayê. Di beşa duyem de Siyabendê şervan e, di beşa sêyem de Sefayê kontr-qesas e, di beşa çarem de Sedat Alyurekê li devera Be´hra Reş penaber e û evîndar e, di beşa dawiyê de jî dîsa dixwaze ku bibe Taser û li ser koka xwe şîn be. An jî dixwaze sêwîbûna xwe bi welatekî biceribîne. Di her beşekî de bi navekî din, wekî karakterekî din, bi nasnameyeke din derdikeve pêşiya me, lê em ji şayesandinê(teswîrê) pê derdixînin ku lehengê me heman leheng e. Şayesandinên weke qels û lawaz, çavên nûtikî û bejna wî ya kinik nîşanên deşîfreya nasnameyên lehengê me ne. Ne hew tenê ji lehengên romanê, Qeder jî bi saya şayesandinê û bi peyvên stranekê nasnameyên xwe eşkere dike. Porê sorgevezî û xelek xelekî Qederê dide dest. Romannivîs ji şayesandinên lehengan xaçepirsek çêkiriye û daye ber me. Em jî bi xwendinê wan malikên xaçepirsê yek bi yek dadigirin, lê mixabin piştî ku em bersivên xaçepirsa xwe temam dikin bi vê temamkirinê jî hemû roman û bûyer ji hev derdikevin, aha hingê romannivîsê me derdikeve pêşîya me û bersivên xaçepirsa ku me rast temam kiriye ji me re dibêje. *"Erê gidî ez im; Taserê belengaz ez im…Siyabendê şervan ez im… Û ew Sedatê evîndar jî ez im…"* Ev bersivên ku tên dayîn perdeya ku heya aniha li ser romanê hatiye vegirtin bi carekê hiltîne û keda xwendavanê xwe yê di vî warî de bi erdê de diteqîne.

Wê were bîra kesên ku romana Patrick Suskind ya bi navê Bêhnê xwendibin. Di vê romanê de jiyana Fransayê ya wê çaxê bi terma bêhnê tê vegotin. Lehengê sêwî yê wê romanê Jean-Baptîste Grenuille ji ber ku bêhna însana ji canê wî nayê, dixwaze ku parfuma herî bi bêhn û bi tesîr ji însanan çêbike da ku weke xwedayekî hukim li wan bike. Ji bo çêkirina vê parfumê can û porê keçikên ciwan û bedew jê re lazim in. Lehengê qesas jî ji bo kuştina wan keçikan texsîrîyê nake. Erê mijar çêkirina parfumê ye lê fon bixwe Fransa ye. An jî em weha lê zêde bikin roman ji hûrgilîyan ber bi termê qerase ve diçe. Di romana Gava Heyatê de rihanên ku di qutîkan de hatine şitilandin hene û bi rastî jî ew romanê gelekî bedew dikin. Zergaya deştî pê kurmê xwe yî çiyayî dişkîne. Hezkirina lehengê me û dêya wî ya neheq bi rihanê tê ava kirin. Rihan ligel hewqas neçêbûnên di rûyê leheng de xulqekî baş bi Taser re çêdike û romanê gelekî jîndar dike. Ev hûrgiliya rîhanê di beşekî de mezin dibe, di beşekî de bêhn dide, lê rîhan bi carekê de jî wenda dibin. Yanî rîhan û hûrgilî di carekê de ji laşê romanê tên qurmiçandin. Gelo mirov qalibê sabûnê ji bêrîka Leopold Bloom derxîne, dê çiqas tişt ji romana Ulysessê kêm bibe? Fermo Gava Heyatê bêhn bikin.

**Navê pirtûkê**: Gava Heyatê
**Nivîskar**: Lokman Ayebe
**Çeşin**: Roman
**Weşanxane**: Belkî
**ISBN:** 978-975-0156-91-9

# Jiyan bi kurdî xweş e

## Malperên Kurdî

Destpêka înternetê mîna îroj nebû, mirov nikaribû malperan wisa bi hêsanî ava bike û bixe înternetê ku herkes bixwîne û temaşe bike. Bikaranîna înternetê mîna dema me erzan jî nebû û ji sazkirina malperan re gelek pisporî pêwîst bû. Lê dîsa jî kurd û înternet hema bêje ji destpêka derketina înternetê ve hev dinasin. Gelek kurdan hewl dida ku bi rêya înternetê agahdarîyan bidin, berhemên xwe belav bikin, xwe bigihînin kurdan û cîhanê.

Mirov dikare bibêje ku pêşketin, têkûzkirin û xurtbûna înternetê herî zêde ji bo wan kesan bi kêrhatî bû ku nikaribûn dengê xwe bigihînin bîr û raya giştî. Kurd jî bi vî awayî, bi rêya înternetê (email û malper) dengê xwe hîn çêtir gihandin sazî û dezgehên cîhanê yên ku ji bo mafên mirovan çalak bûn û agahdarî belav dikirin.

Mirov di nav civaka kurdî de hemû rewşên destpêk û pêşketina înternetê û bikaranîna wê mîna malperên kurdî bide berçav, dîsa jî rastî hin çetinahiyên bikaranînê tê; mirov dê çawa bikare di nav vê çarçoveya tevlihev de nûçe, nivîs û agahdarîyên pêwîst bineqîne?

Hîn jî zelalî û malperên objektîf ji kurdan re pêwîst in. Malperên kurdî yên naveroktijî, serbixwe, objektîf, informatîv û ji alîyê form ve sade, kêmînteraktîf hîn jî gerek in; malperên pîşeyî, zanistî, kûr, kalîteberz gerek in.

Di cîhana global de civatek bê înternet nabe. Li cem cîhana real, cîhaneke vîrtuel jî heye êdî: Ev cîhan jî hema bêje ewqas real e; mirov dikare di înternetê mîna ku li bazarê ye bikire û bifiroşe, wergirtina agahdarîyan, xwendina pirtûkan, guhdarkirina mûzîkê, temaşekirina fîlman bûye karekî gelek hêsan. Pirs ne ew e, gelo mirov înternetê bi kar bîne, malperan çêbike yan na, pirs ew e ku mirov vê yekê çawa bike, bi çi awayî hîn efektîftir bi kar bîne, bi çi awayî hîn efektîftir bi kar bîne, ji bo ku di cîhaneke nenas de winda bibe û gelek zêde dema xwe tê de derbas bike.

Ber bi bikaranîneke hîn çêtir, kalîteberz, naveroktijî û informatîv ve divê înternet ji alîyê kurdan ve jî li ser bingehekî manîdar hîn bêtir ciyê xwe bigire. Înternet pencereya kurdan a ber bi cîhanê ve ye û bi ya min wê pêşketina xwe hîn cidîtir bidomîne.



# NAVEROK
## ÇILE 2011


Sir û çizirîn
**Serge Halimi**
▶ R. 1

Civata tirk kurdan çawa fam dike?
**Îsmail Beşîkçî**
▶ R. 1

**JI ÇAPEMENIYÊ**
▶ R. 2

Ji Ewropaya kevnar
**Bernard Cassen**
▶ R. 2

Rista agahdarbûna ji rastîyên dîrokî yên Dêrsimê li ser çareserkirina pirsgirêkên îro
**Prof. Dr. Ahmet Özer**
▶ R. 4

Li Ewropayê, lîstika sê malbatan
**Dominique Vidal**
▶ R. 6

Li rojhilatê giranîya rabirdûyê
**Michael Minkenberg**
▶ R. 7

Li rastê, jihevdeketin û ji nû ve pêkanîna nîzamê
**L. Bonelli û R. Laudani**
▶ R. 8

Xatirxwestina dawî ji xweşbînîya holandî
**Rinke van den Brink**
▶ R. 9

Li Belçîkayê nesîmetrîbûnên rasta nasnameyî
**Serge Govaert**
▶ R. 9

Almanya li pey statuyeke hêza mezin e
**Philippe Leymarie**
▶ R. 10

Cîhaneke din mumkin e
**Laurent Cordonnier**
▶ R. 11

Neteweyekî parçebûyî:
Zor û zehmetîyên têkoşîna gelê kurd
**Sêlim Turquié**
▶ R. 12

Piştî peymana di navbera Bexda û Tehranê de
▶ R. 13

Çîn û Kore
Rastîya li pişt qehremanên geşbîn
**Philippe Pons**
▶ R. 14 + 15

Di bin sîya Waşîngtonê de têkilîyên Pekîn û Rîyadê
Dîplomasîya hecê
**Alain Gresh**
▶ R. 16 + 17

Gava sazî nema dikarin razên xwe biparêzin
**Felix Stalder**
▶ R. 18

Daxwaza mirina peyamnêr
**Philippe Rivière**
▶ R. 19

Mîratgirên lanetî yên Peravên Îvoriyê
**Vladimir Cagnolari**
▶ R. 20

Qiraxê Kêlbefîl pêşeroja xwe dileyize
**Michael Galy**
▶ R. 22

Kultur - Polîtîk
**Kejo Bajar**
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

**Le Monde diplomatique kurdî, salnameya 2011yan diyarî aboneyên xwe yên nû dike!**
**Heta 31'ê çile bibe abone: salnameya LMd-kurdî wek diyarî bigire, roj û mehan bi kurdî bişopîne**

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB